K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

**Teza Lîsansa Bilind**

# ÎMAJ DI HELBESTA KURDÎ YA NÛ YA BAKUR DE

**Roger ACUN**
**12711006**

**Şêwirmend**

**Öğr. Gör. Zülküf Ergün**

**Mêrdîn – 2016**

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

# ÎMAJ DI HELBESTA KURDÎ YA NÛ YA BAKUR DE

**Roger ACUN**
**12711006**

**Şêwirmend**

**Öğr. Gör. Zülküf Ergün**

**Mêrdîn – 2016**

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜ'NE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim ve Öğretim Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum "Kuzey Kürt Şiirinde İmaj" adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

□ Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

□ Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

□ Tezimin/Projemin … yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.

**24.07.2016**

**Roger ACUN**

JI BO RÊVEBERIYA ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ

Ev xebat ji aliyê juriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de weku Teza Lîsansa Bilind hatiye pejirandin.

(îmze)

Serok:……………………………………………

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)

Endam:……………………………………………

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)

Endam:……………………………………………

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku îmzeyên jorîn ên endamên hîndekariyê yên navborî ne.

Îmze

Doç.Dr. Mehmet Nesim DORU

Rêvebirê Enstîtuyê

(Mor)

**KURTE**

Îmaj, di helbestê de herî kêm bi du bêjeyên ji aliyê maneyê dûrî hev, pêk tê. Têkiliya di navbera bêjeyên dûrmane, di hişê mirov de dîmenên ji rastiya jiyanê cuda saz dike. Ev dîmenên nû, wek xeyal an jî îmajan tê binavkirin. Pênaseya îmajê, dîroka îmajê, cûreyên îmajê, karîgeriya îmajê û pêkhatina îmajê di xebatên poetîk de bi sedan salan cihekî giring girtine.

Îmaj ji hebûna gotina ewil a helbestkî welidiye û heta roja me hebûna xwe domandiye. Wek têgehekê cara yekem di sedsala 17mîn de li Londrayê ji aliyê Ezra Pound ve hatiye bikaranîn. Îmaj ji aliyê gelek kesan ve wek unsûreke helbestê ya bingehîn hatiye pejirandin.

Di helbesta kurdî ya nû ya Bakur de, di çêkirina îmajan de hunerên ciwankariyê, xwedî roleke gelek giring in. Hunerên ciwankariyê, gotinan ji şêwaza rojane diqetînin û kirasê vegotina hunerê yê estetîk li bêjeyan dikin. Bi vî awayî îmajên helbestkî derdikevin holê. Metaforên ku tên sazkirin, bi saya hunerên ciwankariyê di mejiyê mirovan de xeyalên rengîn pêk tînin.

Ev xebat ji destpêkekê û sê beşan pêk tê. Têgeha îmajê û bikaranîna îmajê di helbestên Arjen Arî Berken Bereh, Fatma Savcî û Gulîzerê de vedikole. Di berhemên helbestvanên navborî de hin îmajên takekesî, îmajên civakî û siyasî ji aliyê maneyê ve analîz dike. Di çêkirina van îmajan de rola hunerên ciwankariyê destnîşan dike.

Îmajên takekesî, îmajên ku mijara wan li ser feraset û derûniya mirovan in. Di mînakên helbestvanên navborî de evîn, erotîzm, siruşt, xerîbî, tenêtî û mirin ji wan îmajan in ku zêde hatine biakaranîn. Îmajên civakî û siyasî, ew îmaj in ku li ser jiyan û rola mirovan di civakê de disekine. Îmajên zordestiyê, îmajên azadiyê du sernav in ku di helbestên helbestvanên navborî de ji analîzên me re bûne mijara şîroveyên poetîk.

Roger Acun

# ÖZET

Şiirde imaj, anlam açısından birbirine uzak en az iki sözcükle oluşur. Uzak anlamlı kelimeler arasındaki ilişki, insan zihninde hayatın gerçekliğinden farklı görüntüler meydana getirir. Bu yeni görüntüler, hayal ya da imaj olarak adlandırılır. İmajın tanımı, imajın tarihi, imaj türleri, imajın işlevleri ve imajın oluşumu yüzyıllardan beri poetik çalışmalarda önmeli bir yer tutmaktadır.

İmaj ilk şiirsel sözün varlığından itibaren doğmuş ve günümüze kadar varlığını sürdürmüştür. Bir kavram olarak ilk kez 17. Yüzyılda Londra'da Ezra Pound tarafından kullanılmıştır. İmaj pek çok kişi tarafından şiirin temel unsurlarından biri olarak kabul görmüştür.

Edebi sanatlar modern kuzey Kürt şiirinde imaj oluşturmada oldukça önemli bir role sahiptir. Edebi sanatlar, sözleri günlük kullanımlarından uzaklaştırarak sözcüklere sanatsal estetik kostümler giydirir. Böylece şiirsel imgeler ortaya çıkar. Kurgulanan metaforlar, edebi sanatlar sayesinde insan zihninde renkli hayaller oluşturur.

Bu çalışma, bir giriş ve üç bölümden oluşmaktadır. İmge kavramı ve Arjen Arî, Berken Bereh, Fatma Savcî ve Gulîzer'in şiirlerinde imgenin kullanımını irdelemektedir. Adı anılan şairlerin eserlerindeki bazı bireysel imajlar ve sosyal, siyasi imajları, anlamsal açıdan analiz etmektedir. Bu imajların oluşumunda edebi sanatların rolünü göstermektedir.

Bireysel imajlar, konusu insan algısı ve psikolojisi olan imajlardır. Adı geçen şairlerin örnekleminde aşk, erotizm, tabiat, gurbet, yalnızlık ve ölüm çokça kullanılan imajlardır. Sosyal ve politik imajlar, insanın toplum içindeki yeri ve toplumdaki rolü üzerinde durmaktadır. Zulüm imajları ve özgürlük imajları, adı geçen şairlerin şiirlerindeki iki başlık olarak analizlerimizde şiirsel yorumlara konu oldular.

Roger Acun

ABSTRACT

Image in poetry consist at least from two words,which are far way in terms of meaning. Relation betwen non-close meaningful words can occur different imagines at the mind of people. These new displays are named as images and imaginations. Definition of image, history of image, type of image, function of image and formation of image have got an important place in the poetic studies for ages.

Image had been born since the first word of poetic and subsist until nowadays. Frist time, It was used as a concept in the seventeenth century in London by Ezra POUND. Image was accepted as one of basic element of poetry by many people.

Literary arts has a important role of creation image in modern northern Kurdish poetry. Literary arts, using the words out of daily use, add new meanings to word. So, poetic images occur. Fictionalized metaphors forms variantions in the mind of people thanks to literary arts.

This research consists of an introduction and three parts. The concept of image examines the using of image in poetry of Arjen Ari, Berken Bereh, Fatma Savci and Gulizer. The mentioned poets analyz some personality images,social images and political images in terms of meaning in their poetries. This point shows the importance of literary arts in the formation of images.

The personality images are the images, whose subjects are human psychology and perception. These poets use mostly love, erotism, homesickness, lonely and death images in their poetries. Social and political images points that place of human and role in society. Freedom and persecution images, which were used as two basic topic in mentioned poets, poetries, subjected to our poetrics comments in our analyzs.

Roger ACUN

**NAVEROK**


**KURTE** ........ **III**

**ÖZET** ........ **IV**

**ABSTRACT** ........ **V**

**PÊŞGOTIN** ........ **IX**

**KURTEBÊJE** ........ **XI**

**DESTPÊK** ........ **1**

**I. ÇARÇOVEYA GIŞTÎ** ........ **1**

**II. SÎNORÊN TEZÊ** ........ **2**

**III. ARMANCA TEZÊ** ........ **4**

**IV. RÊBAZ** ........ **4**

**BEŞA YEKEM** ........ **6**

**ÎMAJ/XEYAL** ........ **6**

**1. PÊNASEYA ÎMAJÊ** ........ **6**

**1. 1. DI HELBESTÊ DE PÊKHATINA ÎMAJÊ** ........ **12**

**1. 2. CUREYÊN ÎMAJÊ** ........ **22**

**1. 3. ÇEND DÎTINÊN LI SER TEORIYA ÎMAJÊ** ........ **24**

**BEŞA DUYEM** ........ **32**

**1. ÎMAJ Û HUNERÊN CIWANKARIYÊ** ........ **32**

**2. HUNERÊN CIWANKARIYÊ** ........ **33**

**2.1. Teşbîh / dirûvpêxistin** ........ **33**

**2.2. Îstîare** ........ **36**

**2. 3. Mecaz / Xaze** ........ **39**

**2. 4. Teşxîs / Kesandin** ........ **41**

**2. 5. Kînaye / Nixmane** ........ **44**

**2. 6. Mubalexe / Prole** ........ **45**

2. 7. Tenasub / Lihevî ... 48

2. 8. Tezad / Dijberî ... 50

2. 9. Husna Talîlê / Xweşbahane ... 52

2. 10. Tecahula Arîf / Nezaniya bi Zanîn ... 54

BEŞA SÊYEM ... 57

ÎMAJÊN HELBESTA KURDÎ (KURMANCÎ) YA NÛ YA BAKUR ... 57

1. ÎMAJÊN TAKEKESÎ ... 58

1.1. ÎMAJÊN EVÎNÊ ... 59

1.1. 1. Îmajên Evînê di Helbestên Arjen Arî de ... 60

1.1. 2. Îmajên Evînê di Helbestên Berken Bereh de ... 64

1.1. 3. Îmajên Evînê di Helbestên Fatma Savciyê de ... 76

1.1. 4. Îmajên Evînê di Helbestên Gulîzerê de ... 81

1. 2. ÎMAJÊN EROTÎZMÊ ... 87

1. 2. 1. Îmajên Erotîzmê Di Helbestên Arjen Arî de ... 88

1. 2. 2. Îmajên Erotîzmê di Helbestên Berken Bereh de ... 91

1. 2. 3. Îmajên Erotîzmê di Helbestên Gulîzerê de ... 92

1. 3. ÎMAJÊN SIRUŞTÊ ... 93

1. 3. 1. Îmajên Siruştê di Helbestên Arjen Arî de ... 94

1. 3. 2. Îmajên Siruştê di Helbestên Berken Bereh de ... 96

1. 3. 3. Îmajên Siruştê di Helbestên Fatma Savciyê de ... 101

1. 3. 4. Îmajên Siruştê di Helbestên Gulîzerê de ... 103

1. 4. ÎMAJÊN XERÎBÎ / BÊRÎKIRIN Û HESRETÊ ... 104

1. 4. 1. Îmajên Xerîbî / Bêrîkirin û Hesretê di Helbestên Arjen Arî de ... 105

1. 4. 2. Îmajên Xerîbî / Bêrîkirin û Hesretê di Helbestên Berken Bereh de ... 106

1. 4. 3. Îmajên Xerîbî / Bêrîkirin û Hesretê di Helbestên Fatma Savciyê de ... 109

1. 4. 4. Îmajên Xerîbî / Berîkirin û Hesretê di Helbestên Gulîzerê de ... 110

**1. 5. ÎMAJÊN TENÊTIYÊ** ........ **112**
**1. 5. 1. Îmajên Tenêtiyê di Helbestên Berken Bereh de** ........ **113**
**1. 5. 2. Îmajên Tenetiyê di Helbestên Fatma Savciyê de** ........ **116**
**1. 5. 3. Îmajên Tenêtiyê di Helbestên Gulîzerê de** ........ **118**
**1. 6. ÎMAJÊN MIRINÊ** ........ **119**
**1. 6. 1. Îmajên Mirinê di Helbestên Berken Bereh de** ........ **120**
**1. 6. 2. Îmajên Mirinê di Helbestên Fatma Savciyê de** ........ **120**
**1. 6. 3. Îmajên Mirinê di Helbestên Gulîzerê de** ........ **123**
**2. ÎMAJÊN SİYASÎ** ........ **124**
**2. 1. ÎMAJÊN ZORDESTIYÊ** ........ **124**
**2. 1. 1. Îmajên Zordestiyê di Helbestên Arjen Arî de** ........ **125**
**2. 1. 2. Îmajên Zordestiyê di Helbestên Berken Bereh de** ........ **126**
**2. 1. 3. Îmajên Zordestiyê di Helbestên Fatma Savciyê de** ........ **127**
**2. 1. 4. Îmajên Zordestiyê di Helbestên Gulîzerê de** ........ **131**
**2. 2. ÎMAJÊN AZADIYÊ** ........ **131**
**2. 2. 1. Îmajên Azadiyê di Helbestên Arjen Arî de** ........ **132**
**2. 2. 2. Îmajên Azadiyê di Helbestên Berken Bereh de** ........ **134**
**2. 2. 3. Îmajên Azadiyê di Helbestên Fatma Savciyê de** ........ **135**
**ENCAM** ........ **138**
**ÇAVKANÎ** ........ **142**

**PÊŞGOTIN**

Helbest di derbirîna hest û ramanan de her wextî roleke giring lîstiye. Gelek caran helbest bûye temsîla edebiyatê. Gotinên ku ji derveyî maneyên rojane bûne xwedî maneyên mecazî, derî li metafor an jî îmajan vekiriye. Îmaj, di her serdemê de ji aliyê gelek kesan ve hatiye guftûgokirin û li ser vê têgehê gelek kesan serê xwe êşandiye. Her hunermendî li gor feraseta xwe ya hunerî kirasek ji vê têgehê re fesilandiye. Îmaj tevgereke hişê mirov e ku rastiya objektîf, wek rengvedaneke bedew derdixe pêşberî me.

Îmaj ji bo helbestê amûreke bingehîn e û her helbestvan dema bi çiyayê hunerê ve radipeliqe ji xwe re şiverêyekê vedike û di wê rêyê de bi îmajên xwe yên nûwaze strana dilê xwe distirê. Helbest di bin barana îmajan de digihêje xwendevanan. Her xwendevan ji van gotinên dîmenkûr li gor feraseta xwe ya estetîkî, li gor dewlemendiya xeyalên xwe cîhaneke fanteziyan derdixe. Hestên di hêlana mêjî de kil dibin, xeyalên nedîtî pêşkêşî xwendevan dikin. Xwendevan bi riya bêjeyan, bişkokên xeyalên ecêb vedikin û wan ji nû ve di mêjiyê xwe de ava dikin. Her îmaj li gorî afirînerê xwe xwedî wateyekê ye. Mirov, bi xeyalên helbestê ji nav lepên rastiyê difilite û bi saya îmajan di paxila helbestê de li ruhê xwe guhdarî dike.

Di edebiyata nû de bi taybet di çarçoveya helbesta nû de cihê têgeha îmajê pir giring e. Îmaj, kûrahiya maneyê ye. Şîroveya îmajan karekî rexneya poetîk e û wek her xebata li ser helbestê bi estetîkê re jî eleqedar e. Di vê tezê de me hewl da ku em wek têgeheke helbestê îmajê bidin nasîn û di helbesta Kurdî ya nû ya Bakur de di helbestên Arjen Arî, Berken Bereh, Fatma Savcî û Gulîzerê de bikaranîna îmajan derxin holê û li gor hin mijarên sereke îmajên wan şîrove bikin û têkiliya wan bi hunerên ciwankariyê re daynin. Xebata me ji sê beşan pêk tê. Beşa yekem ji pênaseya îmajê, pêkhatina îmajê, fonksiyonên îmajê, poetîkaya îmajê pêk tê. Beşa duyemîn li ser hunerên ciwankariyê û di sazkirina îmajan de rola hunerên ciwankariyê disekine. Beşa sêyemîn ya vê xebatê jî li ser îmajên takekesî û îmajên civakî û sîyasî ava bûye.

Di pêvajoya amadekirina vê xebatê de dijwariya herî mezin kêmbûna çavkaniyan bû. Di edebiyata kurdî de xebatên akademîk li ser îmajan û şîroveya îmajan di asta tunebûnê de ne. Ji ber vê yekê me xwest ku em di mijara îmajê de agahiyên teorîk binirxînin û agahiyên ku em gîhaştinê di çarçoveyeke zanistî de pêşkêş bikin. Bi vê xebatê armanca me di helbesta kurdî ya nû ya bakur de di nimûneyên helbestên çar helbestvanan de bikaranîna îmajan û li gor hin mijarên sereke senifandina îmajan e.

Di pêvajoya amadekirina vê tezê de ji bo rêberî û arîkariya şêwirmendê min ê hêja Mamoste Zülküf Ergün gelek sipas, deriyê wî her tim ji min re vekirî bû û bi saya şîret û pêşniyazên wî ev xebat kemilî. Ji bo her tiştî mala wî ava be. Dîsa ji dostê dilsoz Mamoste Ramazan Pertev re ji dil û can gelek sipas ji bo ku berê min da xebatên Kurdolojiyê.

Roger ACUN

Mêrdîn-2016

# KURTEBÊJE

amd.: amadekar

c.: cild

h.b.: heman berhem

hwd.: herwekîdin

j.: jimare

K.T.: Komara Tirkiyeyê

r.: rûpel

t.ç.: teza çapnebûyî

vgz.: veguhêzer

wer.: wergêr

**DESTPÊK**

**I. ÇARÇOVEYA GIŞTÎ**

Di helbestê de îmaj, bi nêzîkkirina du tişt yan jî nîşaneyên tiştan xeyalekê di hişê mirov de ava dike. Ev xeyal, dîmeneke şênber an jî razber pêk tîne. Yek ji teoriyên îmajê yê sedsala XVIIIan, li ser esasa qabîliyeta şênberkirina îmajê ye. Ji ber vê yekê wêje, piranî wek amûreke pêşxistina refleksên nêrînê dihat dîtin. Bi kurtasî wêje ji xeyalan îbaret bû. Di encama vê teoriyê de helbesta teswîrî pêşve çû. Yek maneya bingehîn a îmajê bi vê peywendê hat avakirin, lê belê ji bilî vê maneyê gelek maneyên biefsûn jî li vê têgehê hatin barkirin. Hemû cureyên hîsî yên ku zimanê wêjeyî ji xew radike, hemû şêwazên bitesîr, wek mecaz û alegorî hatin binavkirin. Dîsa di helbestê de îmaj, bi taybet bi maneya şênberiyê û dewlemendiyê wek taceke zêrîn hat dîtin.

Hişmendiya mirov, raman, pêhisî, feraset, xeyal, bangewazî, hest, binehişî, coş, nêrîn, dîrok, wext, mekan, mîtolojî û berhemên hunerî çêkerên rastiya helbestê ne. Di helbestê de bangewazî parçeyekî sazker ê muhîm e. Cihê bangewazî lê hebe bivê nevê ji bo helbestê îmajeke îcatkirî jî heye. Îmajeke baş, di mêjiyê xwendevanan de zincîreke bangewaziyan ava dike. Bangewaziyên ku derdikevin holê, hemû bi hev re têkildar in, ji bo nîşandana coşeke tund hatine afirandin.

Îmajeke serkeftî, dikare barê helbastê yê maneyê hilgire ser milê xwe û ji îmajên nû re derî veke. Gelek caran îmajeke bedew, ji bo çîroksaziya helbestê jî dibe hêzeke lokomotîf û vegotina helbestê şên dike. Çawa ku seydvanekî li pey seyda xwe diçe û bi wê kewa zeft dike kewên din dixe dahfika xwe helbestvan jî bi arîkariya îmajeke zeftkirî dikare di peywenda wê îmajê de îmajên ter û teze peyda bike, lê divê eyara îmajê ya di helbestê de tu carî ji dest ber nede. Yan na wê helbest bibe mîhrîcana îmajan, lê helbest li holê nemîne. Helbestvan jî dê bibe qralê îmajan û ew qral di heman demê de dê bibe qeşmerê helbestê.

Her helbestvan li dinyayê dijî û bixwaze nexwaze jî di jiyana xwe ya rojane de bi rastiya cemidî re rûbirû dimîne. Çiqasî bibêje ez ji rastiya jiyanê direvim û xwe li şikeftên xeyalan digirim, xwe davêjim bextê fantaziyan jî dîsa çavkaniya helbestê, ji rastiyê dizê û helbest, bi îmajên resen dikemile, diedile û dibe strana hest û ramanan. Dema helbestvan derdikeve qada hunerê û gotin, cewherên xwe yên veşartî derdixin, helbestvan dibin hosteyên xeyalan û tama evînên biefsûn di bin zimanên xwendevanan de dihêlin.

## II. SÎNORÊN TEZÊ

Helbest di nav cureyên edebiyata cîhanê de yek ji cureyên kevn e. Helbestvanan ji ewil heta axir bi riya gotinên metaforîk bandoreke estetîkî li ser mirovan hiştine. Bi saya metaforên helbestkî zimanê helbestê ji zimanê rojane veqetiyaye û helbest bûye xwedî roleke giring. Ji rîtuelên ayînên civakan bigire heta dia û nifiran, ji pesnê merxasiya şervanan heta bi keserên evîna jin û mêran helbest û şêwaza helbestê cihekî taybet digire.

Di edebiyata kurdî ya nû ya bakur de bala me kişand ku helbestvanên kurd di helbestên xwe de ji metafor ango îmajan zehf sûdê werdigirin. Mijarên ku ji îmajên wan re bûne çavkanî, hunerên ciwankariyê ku bi wan îmajan çêdikin, xulase atmosfera îmajên wan ji gelek aliyan ve dişibiyan hev.

Me xwest ku di helbesta kurdî ya nû ya bakur de di nimûneya du helbestvanên jin û du helbestvanên mêr de em mijara îmajê lêbikolin û bizanin helbestvanên kurd îmajên bi çi rengî çêkirine û di çêkirina îmajan de ji kîjan hunerên ciwankariyê bi çi awayî sûdewar bûne? Ji ber ku derheqê mijara îmajê de di zimanê kurdî (kurmancî) de em rastî tu xebatan nehatin me hewl da ku em mijara îmajê û hunerên ciwankariyê ku di çêkirina îmajan de herî zêde hatine bikaranîn di çarçoveya vê xebatê de binirxînin.

Her çi qas navê teze "Îmaj di Helbesta Kurdî ya Nû ya Bakur de" be jî me sînorên wê di helbesta kurmancî ya nû ya bakur de bi helbestên Arjen Arî, Berken Bereh, Fatma Savcî, Gulîzerê berteng kiriye. Nêzîkbûna şêwazên van helbestvanan û nêzîkbûna wan a erdnîgarî û çandî di hilbijartina wan de diyarker bû. Ji bilî van sedeman mijarên wan ên ku ji îmajên wan re bûne çavkanî piranî muşterek bûn.

Di sînorên berteng ên vê xebatê de helbet me cih nedaye hemû îmajên van helbestvanan û em tenê li ser îmajên wan ên takekesî (îmajên evînê, îmajên erotîzmê, îmajên siruştê, îmajên xerîbiyê, îmajên tenêtiyê, îmajên mirinê) û îmajên siyasî (îmajên zordestiyê, îmajên azadiyê) sekinîn.

Kîtêbên edebî yên ku di vê teze de em li ser xebitîn ev in: Kitêbên Arjen Arî: *Ramûsan Min veşartin li Geliyekî, Ev Çiya Rûsipî ne, Eroutîka, Şêrgele, Destana Kawa û Azhî Dehaq.*

Kitêbên Berken Bereh: *Dilê Min Palgeh e ji Işqê re, (Êş, Şagirtên Evînê, Şîna Helbestê, şerbeta ji Êgir, Haîkû) Pandomîm, Ji Dûriyê re, Xewna Dawî.*

Kitêbên Fatma Savcî: *Gulên Qasid, Xewnên Zîvîn, Bîra Birînê, Şewq û Payîz, Dotmara Lal.*

Kitêbên Gulîzer: *Keziyên Jinebî, Bûka Baranê, Şevname*.

**Jînenîgariya Helbestvanên Mijara Tezê**

**a) Arjen Arî**

Di sala 1956an deli herêma Omeriye li gundê Çalêhatiye dinyayê. Di 1979an de Enstîtuya Perwerdeyî ya Dîyarbekirê Beşa Zimanê Tirkî qedand. Cara pêşî di kovara Tîrêjê de helbestên wî hatin weşandin Di Berbang, Kurdistan Press, Nûdem, Çira, pelîn û Rewşenê de helbestên wî weşiyan. Di sala 2012an çû ser dilovaniya xwe.

**b) Berken Bereh**

Di sala 1954an de li bajarê Şirnexê ji dayik bûye. Helbestên wî yekem car di kovara Tîrêjê de hatine belavkirin. Heta niha helbest û nivîsên wî di gelek kovar û rojnameyên kurdî bi navên Nûbûn, Nûdem, Jiyana rewşen, Rewşen-name, peyv û nûbiharê de belav bûne. Di sala 1998- 99an de di pêşbirkên helbestan ên ji aliyên Komeleyên Malbatên Girtiyan û Hukumxwariyan û ji aliyê kovara Jiyana rewşenê ve amadekirî de bi xelata yekemin û duyemîniyê ve hatiye xelatkirin. Hê jî di kovar û rojnameyên kurdî û tirkî de nivîskariya xwe berdewam dike.

**c) Fatma Savcî**

Di sala 1974an de li gundê Girêmîrê ku li ser Nisêbînê ye ji dayik bû. Dibistana seretayî li Girêmîrê xwend. Di sala 1992an de ji bo raman û çalakiyên xwe yên siyasî hate girtin. Di dawiya sala 2003an de ji Zindanê derket derve. Hîna li hundir helbestên wê di kovar û rojnameyên kurdî de belav dibûn. Fatma Savcî niha li Swêdê dijî, mamostetiya zimanê kurdî dike.

**d) Gulîzer**

Di sala 1979an de li Elîpara Diyarbekrê hatiye dinyayê. Jiyana xwe ya perwerdehiyê li Diyarbekir derbaskiriye. Di sala 1997an de dest bi nivîsa kurdî kiriye. Kitêba wê ya yekembi navê "Keziyên Jinebî" (2006), ya duyem bi navê "Bûka Baranê"(2009) çap bûye.

## III. ARMANCA TEZÊ

Angaşta vê tezê ew e ku helbesta kurdî ya nû ya bakur, helbesteke biîmaj e û ji derfetên îmajê zêde zêde sûd wergirtiye. Helbestvanan, di çêkirina îmajan de piranî ji hunerên ciwankariyê arîkarî wergirtine û ji dîmenên razber îlham girtine. Îmajên helbesta kurdî ya nû ya bakur bi awayekî berbiçav li dora hin mijarên sereke ava bûne.

Armanca vê tezê pênaseya têgeha îmajê û di nimûneya çar helbestvanên helbesta kurdî (kurmancî) de şîrove û nirxandina îmajan e. Mijarên îmajên muşterek ên helbesta kurdî ya bakur ku di çarçoveya vê tezê de bên şîrovekirin ev in: îmajên evînê, îmajên siruştê, îmajên xurbetê, îmajên tenêtiyê, îmajên mirinê, îmajên azadiyê, îmajên zordestiyê, îmajên jinê û îmajên erotîzmê.

## IV. RÊBAZ

Ev xebat, xwe dispêre arkeolojioya helbestê. Lêkolînên poetîk, ji bo fêmkirina helbestê asoyên nû li hember xwendevanan vedikin. Helbest ji ber ku mijarên berfireh, di formên berteng de pêşkêşî xwendevanan dike ji şîroveyên cihêreng re vekiriye. Şîroveya helbestê, di edebiyatên ewropî de di bin siya konê hermenoûtîkê (zanista şîroveyê) de cihekî taybet digire. Di kevneşopiya helbesta rojhilatiyan de jî ev şuxul wek “ilmê şerhê” tê nasîn. Gelek helbestên kûrmane, bi saya destûrên hermenûotîkê maneyên xwe yên veşartî li ber çavan radixin û qîmetên wan ên wêjeyî çêtir tên fêmkirin.

Di beşa yekem a vê xebatê de em li ser têgeha îmajê û di helbestê de peydabûna îmajê sekinîn. Dîroka îmajê sernavekî din bû ku em bi pey kok û rehên îmajê ketin. Di bin navê cureyên îmajê de me behsa senifandina îmajan kir. “Pêkhatina îmajan” ku di helbestê de îmaj çawa çêdibin mijareke me ya sereke ye. Di bin navê fonksiyonên îmajê de me cih da karîgeriya îmajê di avakirina helbestê de. Di beşa yekem de sernavekî din jî dîtinên li ser îmajê ye. Di bin vî sernavî de me cih da poetîkayên li ser îmajê.

Di beşa duyem a vê xebatê de pêkhatina îmajê û hunerên ciwankariyê li ber çavan hatiye raxistin. Di avakirina helbestê de karîgeriya hunerên ciwankariyê hatiye nîqaşkirin û li ser hin hunerên ciwankariyê hatiye sekinandin. Di derheqê van huneran de agahî hatine dayîn û di helbesta kurdî ya nû ya bakur de di helbestên

helbestvanên ku me mijara teza xwe bi wan sînordar kiriye mînakên van huneran hatine dayîn.

Di beşa sêyem de di edebiyata kurdî ya nû de li gor hin mijarên sereke îmajên di helbestên helbestvanên me çarçoveya xebata xwe bi wan berteng kiriye hatine şîrovekirin. Ev beş, di derheqê îmajên takekesî û îmajên civakî û siyasî de hatiye amadekirin. Îmajên evînê, îmajên xurbetê, îmajên mirinê, îmajên tenêtiyê û îmajên azadiyê û zordestiyê hin binbeşên vê beşê ne.

Xebatên li ser mijara îmajê zehf kêm in, xebatên şîroveya îmajên helbestkî jî pir kêm in. Ev xebat jî di helbesta kurdî de ji bo xebatên li ser şîrovekirina helbestê dê bibe gaveke biçûk. Di encama vê xebatê de têgeha îmajê, karîgeriya îmajê, pêkhatina îmajê, têkiliya îmaj û hunerên ciwankariyê, di helbesta kurdî ya nû ya bakur de bikaranîna îmajê bi awayekî xulase hatin destnîşankirin û piştre çavkaniyên vê xebatê hatin dayîn.

## BEŞA YEKEM

## ÎMAJ/XEYAL

Di helbestê de cihekî îmajê yê taybet heye. Helbest bi îmajan teşeyeke vegotinê ya estetîk bidest dixe. Helbestvan bi îmajên xwemal hest û ramanên xwe tînin ziman. Di vê beşê de em ê li ser pênaseya îmajê, di helbestê de pêkhatina îmajê, cureyên îmajê û çend dîtinên li ser teoriya îmajê bisekinin.

### 1. PÊNASEYA ÎMAJÊ

Îmaj (hêma) wek xeyal, sûret, resim, tîmsal, sûreta eqlî, sûreta îhsasê, sureta mahsûsa, texeyyul tê binavkirin.[1]Arîstoteles derbarê îmajê de dibêje ku: “Ji bilî maneya bêjeyekê dema mirov maneyeke din lê bar bike ew tişt îmaj e.”[2] Mirovên berê, li ser dîwarên şikeftan wêneyên xezalan û ajalên din çê dikirin. Nîşaneyên bi vî rengî bi kêrî pevragihandinê dihatin. Dema ziman dewlemend bû her tiştek, bi nîşaneyeke dengî terîf bû ango tişt hebûn û nîşaneyên tiştan hebûn. Wexta ku tişt li holê tunebûna jî bilêvkirina navê tiştan sûretê wan tiştan, di mêjiyê mirov de bi xwîn û goşt dibûn.

Piştî îcadkirina bêjeyên şênber wek av, dar, kevir, goşt, şikeft û hwd. pêdivî bi bêjeyên razber çêbûye û mirovan ji bo tiştên nayên sehkirin, lê di mêjî de xwedî heyînekê ne bêje afirandine. Axaftinên ewil ji distûrên rêzimanî dûr be jî dema ku bêjeyek, maneyeke din lê bar bibe û têkiliya du bêjeyên dûrmane bê danîn, îmaj diwelide. Wek nimûne: ewr, dest, birûsk bêjeyên wisa ne ku di navbera wan de tu têkilî tuneye, lê mirov, van her sê bêjeyan di peywendeke wêneyî de bicivîne û bibêje “ewrên dest birûsk” ev şêwaza vegotinê dibe îmajeke helbestkî.

Doğan Aksan dibêje ku “dîmenên ku hunermend bi riya hîsên xwe fêm kirine, veguhestina wan ya ziman îmajê derdixe holê. Îmaj, ne wek teswîrekê, wek şîrovekirinekê dikarin bên hesibandin.”[3] Ev dîtin, kirasekî bikerî li têgeha îmajê dike û wê, wek hilberîneke hunerî derdixe pêşberî me. Îmaj çi ye, mirov çawa dikare salixê wê bide? Di vê mijarê de ji aliyê pisporên qadên curbicur salix hatine dayîn. Bo nimûne: “Nivîskar Perrine, îmajê wek pêşkêşkirina ezmûnên sehîkirinê bi riya zimên dibîne û îdia dike ku cureya wê ya di helbestê de herî zêde derdikeve pêşberî

[1] Özdemir İnce, *Şiir ve Gerçeklik*, Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, İstanbul, 2001, r. 23.

[2] Özdemir İnce, *Yazınsal Söylem Üzerine*, Can Yayınları, İstanbul, 1993, r. 55.

[3] Doğan Aksan, *Şiir Dili ve Türk Şiir Dili*, Engin Yayınları, Ankara, 1987, r. 32.

me îmajên dîtbarî ne. Nivîskarê *Ferhenga Zimannasiyê* J. Knobloch dest nişan dike ku îmaj ne kopyayeke siruştê ne. Knobloch, îmajê wek nîşaneyeke bi şêwazeke nû anîna zîmên ya tiştekî dibîne."[4] Doğan Aksan, diyar dike ku "peyvira îmajê zeftkirina dîmena wê ye."[5]

Îmaj ne wêne, teswîr û dîmen e, lê belê têkiliyên îmajê yên gelekî nêzîk bi bêjeyên wêne teswîr û dîmenê re heye. Hunermend, xeyaleke resen şênber dike û vedibêje wê demê îmaj, dîmeneke xwemal e ku hunermend, bi cureyên hestên xwe fêm kiriye û ew veguhestiye ziman.[6] Özdemir İnce di kitêba xwe ya bi navê *Şiir ve Gerçeklik* (Helbest û Rastî) de cih dide dîtinên gelek teorîsyênên helbestê ku yek ji wan jî Roger Caillois (1913-1978) e. Caillois, îdia dike ku îmaj di helbestê de jî di pexşanê de jî bikaranîna ziman a bi şêwazeke nû ye û ji bilî nîşandan û binavkirinê bêjeya bangewaziyê jî lê zêde dike.[7] İnce, ji teorîsyenê fransî Maurîce Blanchot (1907-2003) neqil dike "piştî tiştan îmaj tê." Ango berî her tiştî divê nîşaneyek hebe. Pîştre ev nîşaneya bi nîşaneya tiştekî din re bê bênderkirin an jî zewicandin. Îmaj, dê bibe zarokên vê zewacê.[8] Hemû îmajên wêjeyî, bi têkiliya bêjeyên elaqeya wan bi hev re tuneye pêk tên û bi saya bangewaziyên serbest bi xeyalan dikemilin.

Mîchel Le Guerre, îmajên wêjeyî wiha bi nav dike "imaj, ew tişt in ku nivîskar ji bo gotina xwe rave bike ji derveyî mijara xwe wan tiştan digire û bi riya xeyalan digihijîne hestyariya xwendevanan."[9] Ji ber ku îmaj, şewqa sûbjektîf a gerdûna objektîf e her îmajek, yekîtiya sûbjektîf û objketîf e. Wek Gaston Bachelard (1884-1962) jî angaşt dike hebûna îmajên helbestkî jî heye. Ji ber ku dîmenekê di xeyalê mirov de çê dike.[10] Li gor İnce, pênaseyên îmajên nivîskî pir in û naşibin hev. İnce, di kitêba xwe ya bi navê *Yazınsal Söylem Üzerine* (Li Ser Gotara Edebî) de di beşa "Zimanê Helbestê Diduyan" de wiha dibêje "imaj, di mêjiyê mirov de vebêyîna tiştan e. Vejandina tiştan ya di hişê mirov de ango rastiya tiştên ji me xweser ku di mêjiyê me de rû vedidin."[11] Di heman nivîsê de İnce, dibêje ku di çavkaniya îmajên

---

[4] Aksan, h. b., r. 29.

[5] Aksan, h. b., r. 30.

[6] Aksan, h. b., r. 30.

[7] İnce, *Şiir ve Gerçeklik*, r. 20.

[8] İnce, h. b., r. 23.

[9] İnce, h. b., r. 56.

[10] İnce, h. b., r. 23.

[11] İnce, *Yazınsal Söylem Üzerine*, r. 55.

wêjeyî de rastiyên cemidî tunene. Her çiqasî vana hest û ramanên li ser rastiya cemidî anîbin ziman jî deqeke wêjeyî û ziman heye. Eger îmaj, vebêyîna tiştekî di mêjî de be, îmaja wêjeyî jî vebêyîna vî tiştî ya nivîsê ye.

"Îmaj, afirîneriya mêjî ya saf e. Ne ji danberhevekê, lê kêm zêde ji nêzîkkirina du tiştên dûrî hev diwelide. Têkiliyên tiştên ku nêzîkî hev dibin çiqasî dûr û bêkêmasî be îmaj, dê hîn xurttir be, coşdar be û hîn bêtir xwedî rastiya helbestkî be.[12] Îmaj encax bi hişmendî saz dibe. Gelek hîsên me yên li derveyî hiş mane, îmajê nayînin holê. Îmaj, şopa hizrên di mêjî de ye.[13] Bangkirina taybetmendiyên Ayê ji bo Byê aha ev tiştê ku em bang dikin ew bixwe îmaj e. Mekanîzmeya îmajê bi şêwazeke herî basîd bi vî rengî dixebite.[14]

Helbestvanê amerîkî Ezra Pound (1885-1972) dibêje ku "tiştekî ku mirov bikaribe bi îmajekê pêşkêş bike, ji tijekirina cildên kitêban baştir e.[15] Pound, di heman nivîsê de destnîşan dike ku "Shakespeare (1564-1616) dema ku dibêje 'şefeqa di nav mantoyê sor de gevizî.' Tiştekî ku wênesaz nikare pêşkêş bike, pêşkêş dike. Di vê rêzika wî de teswîra tiştekî ku tu kes nikare bibêje heye. Ew jî di pêşkêşkirina wî de veşartiye."[16] Helbestvan, rastiya jiyanê di mêjiyê xwe de dimeyîne, bi nêrîna xwe dixemilîne û piştre wek wêneyeke estetîk li ber çavên mirovan radixe. Ev dîmen jî li gor herkesî, ne heman tişt e. Lewra bangewazî li gor bîr û hişê mirovan diguhere. Rast e îmaj dişibe rastiyê, lê ne rastî bi xwe ye. Ansîklopedîa Dîderot, di derheqê îmajê de wiha dibêje "li hember rûyekî baş cîlakirî, wêneye tiştekî ku pir dişibe wan. (Mîsal: eynik)"[17]

Oktay Taftalı, di kitêba xwe ya bi navê *Ahlak, Estetîk ve Şii*r'ê de rexneya helbestê ya mîkroestetîk dike û dibêje ku "imaj hestek e dema îmaj tê gotin tiştekî ji binesaziya derûnî dipengize û ji wir xelas dibe. Tê fêmkirin wê demê îmaj hestek e."[18] Îmaj, wek têgeheke estetîkê dikeve bin konê teşe û pûxteyê tev de, lê bi awayekî zêde di bin bandora naverokê de dimîne. Bi vê boneyê îmaj dibe kevoka

[12] İnce, h. b., r. 59.

[13] İnce, h. b., r. 23.

[14] İnce, h. b., r. 20/21.

[15] Hüseyin Salihoğlu, *20. Yüzyıl Edebiyat Sanatı,* İmge Kitabevi, Ankara, 1995, r. 29.

[16] Salihoğlu, *20. Yüzyıl Edebiyat Sanatı,* r. 31.

[17] Halime Yücel, *İmgeden Yoruma*, Ayrıntı Yayınları, 2013, r. 17.

[18] Oktay Taftalı, *Şiirin Mikroestetik Eleştirisi*, Ahlak, Estetik ve Şiir, Gendaş Yay., İst., 1998, r. 23.

peyamê. "Helbest, ji demên berê ve hunera Xyê hildide û dike Yyê. Rastiya xuya dibe diguherîne û rastiya xwe dixe şûna wê."[19] Helbestvanê meksîkî Octavio Paz (1914-1998) jî dibêje ku afirîneriya helbestkî bi êrîşa zimên dest pê dike. Bêje, berê texrîb dibin. Helbestvan, wan ji maneya wan a em hîn bûne diqetîne. Bêjeyên ku ji dinyaya bêteşe ya zimanê axaftinê vediqetin, weke nû welidîbin tikîtenê dimînin. Êwra duyemîn vegera bêjeyan e. Îmaj tiştên ku nayên terîfkirin vedibêjin. Ziman, derfeta maneyên bêdawî ye. Mane û îmaj heman tişt in. Helbestek ji bilî maneyên wê tiştekî wê yê din tuneye. Mane, di nav helbestê de dest pê dike û di nav helbestê de bi dawî dibe. Maneya helbestê, helbest bi xwe ye.[20] Ev dîtin jî nîşan dide ku helbest bi riya îmajan diaxive û îmaj çêkerên maneyê ne. Bêje di destê helbestvan de wek benikê rengorengo ne û helbestvan bi van benikan xalîçeyeke rengîn çê dike, bi xeyalên xwe dixemilîne, dû re yekî din dikare vê xalîçeyê xera bike û bi wan benikan xalîçeyeke din biafirîne.

Îmaj teknîkeke pêşkêşkirinê ye ku dikare naverokê bi awayekî bitesîr bîne ziman. Îmaj riya sazkirina dîmenên razber a herî berbiçav e. Zanyar tiştên ku dîtine bi têgehan, feylesof bi pêşniyazên felsefî û şîroveyên berawirdî, helbestvan jî bi îmajan li ber me radixin."[21] Ev şîrove jî destnîşan dike ku îmaj ji bo helbestê amûreke bingehîn e û her helbestvan, dema bi hunera helbestê re mijûl dibe ji xwe re rêyekê vedike û di vê rêyê de bi îmajên xwe yên resen hunera xwe ava dike.

Îmajinasyon bi maneyeke temamî çi ye? Hin ferheng dibêjin ew bêje tê maneya zimanê metaforîk an zimanê fîguratîf. Îmajinasyon, şêwazeke axaftina fîguratîf û metaforîk e.[22] Ev gotina Terry Eagleton jî balê dikêşe ser aliyê îmajê yê hunerî û peyvên biîmaj, ji refên peyvê axaftina rojane diqetîne. Xulase mijara îmajê ji şîroveyên piralî re vekiriye û "wek mirovên modern, wek hunerê, wek evînê gotin û fêmkirina îmajê jî zor e."[23]

Dîroka îmajê di navbera sembol û razberkirinê, rastî û îdealîzmê de pêk tê. Dema reh û kokên îmajê tên kolandin tê fêmkirin ku ji serdemên paleolîtîk û vir ve mirov li kîjan deverê jiyabe îmaj afirandine. Hemû deverên ku mirov lê hene îmaj jî

---

[19] Veysel Çolak, *Şiir Nedir ve Nasıl Yazılır*, İkaros Yayınları, İstanbul, 2011, r. 15.

[20] İnce, *Yazınsal Söylem Üzerine*, r. 61.

[21] Nurullah Çetin, *Şiir Çözümleme Yöntemi*, Öncü Basımevi, Ankara, 1981, r. 75

[22] Terry Eagleton, *Şiir Nasıl Okunur*, Wer. Kaya Genç, Agora Kitaplığı, İstanbul, 2011, r.223.

[23] Mehmet Önal, *Yeni Türk Edebiyatı*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2009, r. 220.

heye. Esas lêgerîna dîroka îmajê ya bi sedan salên berê, bêmane ye lewra çavkaniya îmajê em in.(…) Hebûna îmajê girêdayî me ye.[24]

Berî îmajên helbestkî bi hezaran îmajên wêneyî wek sembol hatine bikaranîn. Di serdema nêçîrvanî û berhevkariyê de jî wêneyên ajalên li ser dîwarên şikefta hatine xêzkirin û heta bi nîşaneyên eşîr û qebîleya ku ji bo hevdu nas bikin gelek remz derketine holê. Heta nivîsa ewil a hiyegrolîf ku her tîpeke wê nîşaneyeke, li ser esasa îmajê ava bûye. Ev jî tê wê maneyê ku îmajên dîtbarî beriya îmajên zimên ên helbestkî welidîne û di jiyana mirovên serdemên kevin de roleke karîger lîstine. Îmajên wêneyî bûne berdevkê hest û ramanên mirovan û demeke dirêj karê pevragîhandinê bi cih anîne.

Ji serdema antîk û vir ve yên ji îmajan ditirsin û yên îmajan diparêzin hene. Yek ji sedemên tirsa îmajê tevlihevkirina îmajê û ziman e. Ji îmajê ditirsin, wê wek şewbekê dibînin û dibêjin îmaj, dê ziman xera bike. Îmaj wek dijberê gotinê tê dîtin. Dibêjin ku em ziman winda bikin em dê ramanê winda bikin. Îmaj jî wek ziman tevlihev e. Helbet di roja me de em bêtir rastî îmajê tên, lê divê neyê ji bîrkirin ku di dîrokê de îmajê roleke girîng girtiye ser xwe.[25] Di "Poetîka"ya Arîstoteles (BZ 384-BZ 322) de îmaj, wek metaforê tê bikaranîn û maneya ji cihekî barkirina cihekî din hildigire.[26] Di encama vê barkirinê de îmajên helbestkî yê ziman derdikevin ser dika edebiyatê û xwendevan an jî guhdarvanan di bin bandora xwe ya efsûnî de dihêlin.

Li Ewropa bi taybetî li Fransayê ji êwra ronesans û klasîsîzmê û vir ve hunera helbestê bûye mijara lêkolînên rexneyî. Armanca vê fêma rexneyê ew e ku distûrên helbestên baş destnîşan bike û helbestên hatine hilbijartin, li ber roniya van distûran binirxîne.[27] Dîsa li Ewropa ji Aloysius Bertrand (1807-1841), Rimbaud (1854-1891), û Lautrêamunt (1846-1870) bigire heta li Tirkiyê ji Nazım Hikmet (1902-1963) û vir ve helbest, êdî xwe naspêre distûrên wezn, qafiye, hejmara kiteyî, dubarekirina dengan û hwd. Unsûreke din ya ku hebûn û berdewamkirina helbestê pêk tîne û diparêze heye: Îmaj.[28] Baş e îmaj, kengî derketiye qada helbestê û bûye unsûreke bingehîn? "Divê îmaj li şûna hunerên ciwankariyê yên gotinên ku bawerî pê nayên

[24] Yücel, *İmgeden Yoruma*, r. 27.

[25] Alâattin Karaca*, İkinci Yeni Poetikası*, Hece Yayınları, Ankara, 2005, r. 66.

[26] İnce, *Yazınsal Söylem Üzerine*, r. 47.

[27] Mehmet Yalçın, *Şiirin Ortak Paydası*, C. 2., İkaros Yayınları, İstanbul, 2010, r. 66.

[28] İnce, *Şiir ve Gerçeklik*, r. 20.

wek temsîlên tiştan tevbigerin. Di rexneyên dawîn de rewşeke îronîk e ku îmaj û hunerên ciwankariyê hemmane bûne. Tevgera modern di derheqê temsîlên zelal de ev baweriya îmajinasyonê mîras girtiye."[29]

Yek ji teoriyên îmajê yê sedsala XVIIIan li ser esasê qabiliyeta şênberkirina îmajê bû. Ji ber vê yekê wêje, piranî wek amûreke refleksên xwendevan ên nêrînê pêş bixe dihat dîtin. Têgeha îmajê, cara yekem ji aliyê helbestvanê amerîkî Ezra Pound ve di sala 1912an li Londonê hatiye bikaranîn.[30] Ji vê tarîxê û vir ve gelek zimannas, helbestvan, nivîskar û rexneger li ser têgeha îmajê sekinîne û gelek teoriyên poetîk afirandine da ku mijarê zelal bikin. Yekem çavkaniya rêbaza fenomenolojiya îmajê, di xebatên teorîsyen û rexnegirê fransî Roland Barthes (1915-1980) de tê dîtin. Divê mirov Roland Barthes, wek pêşengê rasteqîn yê fenomenolojiya îmajê qebûl bike. Barthes di xebatên xwe de li bersiva "Mane, çawa vidiguheze îmajê?" digere.[31]

Helbestvanê fransî Luîs Aragon (1897-1982) di sala 1926a di helbesta xwe ya bi navê "Gundiya Ji Parîsê" îmajê wek unsûra berheman a herî muhîm dibîne.[32] Aragon di helbesta cîhanê de wek pêşengê sembolîzmê û surrealîzmê tê dîtin. Helbestên sembolîst û surrealîst jî bêhna xwe ya hunerê bi cegerên îmajê didin û distînin. Li Amerîka û Îngilizîstanê endamên Rêbaza Rexneya Nû, di navbera salên 1930-1940î de berê xwendevanan dan fikra ku helbest, hunereke şênber e û xwendevan teşwîq kirin ku helbest ji îmajan pêk tê. Helbestvanê fransî Andre Breton (1896-1966) ku wek damezrenêrê rûbarê surrealîzmê tê dîtin, di "Manîfestoya Surralîzmê 1"ê de dibêje "imaj afirîneriya mêjî ya herî saf e."[33]

Yekem teorîsyenê helbesta biîmaj T. E. Helmun (1883-1917) bingeha fikrên xwe ji felsefeya Henrî Bergson a entusiyonîzmê girtiye.[34] Helbestvanên ku li hember helbesta sedsala XXan derdiketin, çavkaniyên xwe di wêjeyên Grekî, Latînî, Îbranî,

---

[29] Eagleton, *Şiir Nasıl Okunur*, r. 222

[30] Hasan Boynukara, *Modern Eleştiri Terimleri*, Yüzüncü Yıl Üniv. Fen-Edb. Fak. Yay., Van, 1993, r. 107.

[31] Yücel, *İmgeden Yoruma*, r. 86.

[32] Karaca, *İkinci Yeni Poetikası*, r. 399.

[33] Karaca, h. b., r. 399.

[34] İnce, *Yazınsal Söylem Üzerine*, r. 53.

Çînî û Japonî de digeriyan.[35] Roger Calîos dibêje ku "bawerkirina helbestê fikra hebûna tiştên hevpar di navbera Homeros û Mallarme de ye."[36]

Fîlozofê egzîstansiyalîst Jean Paul Sartre (1905-1980) di sala 1936a bi navê "Îmgelem" li ser mijara îmajê kitêbeke teorîk nivîsiye. Sartre, di vê kitêba xwe bi nêrîneke felsefî nêzîkî mijarê dibe û ji gelek fîlozof û disîplînên felsefî sûd werdigire. Sartre, îmajê wek problemeke felsefî dibîne, lê aliyê helbestkî jî ji bîr nake.

Özdemir İnce li Tirkiye yek ji kesên ku di nivîsên xwe de li ser teoriya helbestê sekiniye û di sala 1993a de di kitêba xwe ya *"Yazınsal Söylem Üzerîne" (*Li Ser Gotara Edebî) de Di beşên "Zimanê Helbestê 1 û Zimanê Helbestê 2" de bi sûd wergirtina dehan çavkaniyên Ewropî li ser vê mijarê sekiniye. İnce, di sala 2001ê de bi navê *Şîîr ve Gerçeklîk* (Helbest û Rastî) kitêbeke di warê teoriya helbestê de çap kiriye. Di vê kitêba di gelek deran de behsa îmajê dike, lê bi taybetî di beşa "Îmge ve Serûvenlerî" (Îmaj û Serguzeştên Wê) de agahiyên gelek berfireh dide.

### 1. 1. DI HELBESTÊ DE PÊKHATINA ÎMAJÊ

Di helbestê de dema em du bêjeyên ku di zimanê rojane de nayên ba hev bi hev re gire bidin, îmaj çêdibe. Wek mînak dema em dibêjin "Çermê şevê" em îmajekê saz dikin. Ji ber ku çerm û şev di zimanê axaftinê de di peywendekê de nayên bikaranîn. Bênderkirina wan her du bêjeyan nayê hiş. Helbest, rastiyên jiyanê bêyî ku bike têgeh û bicemidîne wek îmaj bi hestyarî digihîne xwendevan û xwendevan bi jiyanê ve gire dide. Lewra zanîna helbestkî, agahiyeke xeyalê ye ku bi jiyanê re têkildar e.[37]

Nîşaneyên du tişt an jî ji diduyan zêdetir tiştan, di peywendekê de nêzîkî hev bibin îmaj (hêma) derdikeve holê. Maneyên nû ji têkiliyên bêjeyên beranber derdikevin. Maneyên ji tariyê tên û di tariyê de rûdinin û maneyên bêjeyên ferhengî têra vegotina wan maneyan nakin. Özdemir İnce dibêje "bangkirina taybetmendiyên tiştekî ji bo tiştekî din, îmaj e. Mekanîzmeya îmajê herî sivik bi vî rengî dixebite."[38] İnce, li gor çêbûn û çêkirina îmajên edebî îmajan di bin sê beşan de dabeş dike:

1) Ji Şênber Ber bi Şênber ve:

---

[35] İnce, h. b., r. 53.

[36] İnce, *Şiir ve Gerçeklik*, r. 22.

[37] Altıok, *Şiirin İlk Atlası*, r. 27.

[38] İnce, *Yazınsal Söylem Üzerine*, r. 20/21.

Ev îmaj, îmajên herî belavbûyî û sade ne. Ev îmajana bangî teşe, lebat, reng û bêhna tiştan dikin. Ev îmaj, îmajên teswîrî ne.

2) Ji Şênber Ber bi Razber ve:

Mirov, bi şertê mubalexeyê şênberiyekê dide hest û ramanên razber. Ev cure îmaj, îmajên herî bimane û xwemal in.

3) Ji Razber Ber bi Şênber:

Kêm çê dibin, lê dema serkeftî bin mirov serobino dikin.[39]

Îmajek, dibe ji gelek bêjeyan pêk bê. Îmajek dibe tevahiya helbestê jî bigire. Bi tena serê xwe dibe bibe helbesteke dûdirêj jî. Wê demê dikeve bin bandora pêwîstiyên rastiyê. Nêrîn û dîtinên bênavber û lebateke berdewam diafirîne.[40] “Ne tenê di helbestê de di pexşanê û di zimanê axaftinê de îmajên ku raman pê rengîn dibin, bi sazkirina analojiya di nava du bêjeyan pêk tê. Yan qiyaseke tam û vekirî yaxût bi riya îstiareyan weyaxût bi hatina cem hev ya jirêzê çê dibin. Bi çi awayî dibe bila bibe ger şênber-şênber, ger şênber-razber, nêzîkkirina hemû tiştan û bangewaziya bi giştî em dikarin di bin navê îmajê de bihewînin.[41]

"Wêneyên îmajê mumkun nîne bê çêkirin, lê îmaj tunebe wêne çê nabe. Dîsa jî îmaja ku tabloyekê diafirîne li derveyî tûalê ye. Di helbestê de jî wiha ye. Îmaj di xeyala xwendevan de pêk tê."[42] Helbestvan, deriyê xeyalxaneya xwe bi mifteya bêjeyan vedike û ji xwendevanan re dibêje: “Fermo derbasî hundir bibin.” Xwendevan çiqasî xwendibe, geriyabe, dîtibe, bihîstibe, bêhn kiribe, pelandibe, dê ewqasî bangewaziya îmajên helbestê li ser wî/wê tesîrê bikin. Her xwendevan, bi qasî feraseta xwe dikare ji helbestê fêm bike. Lêkolîner Nûrullah Çetin di kitêba xwe ya bi navê “*Şiir Çözümleme Yöntemi*”yê (Rêbaza Analîzkirina Helbestê) de derketina îmajê di penc qonaxan de rêz dike:

1) Helbestvan, dinyaya derveyîn raçav dike.
2) Helbestvan, ji unsûrên bi riya hiş çavdêrî kiriye bijartekê çê dike.
3) Helbestvan di hişmendiya xwe de di nav tiştên ku dîtiye de têkilî û girêdanan saz dike.

---

[39] İnce, *Şiir ve Gerçeklik*, r. 26/27.

[40] İnce, h. b., r. 30/31.

[41] İnce, h. b., r. 30.

[42] İnce, h. b., r.116

4) Helbestvan dîmeneke razber ku dikare manîdar be û xwendevan metel bihêle bi dest dixe.
5) Helbestvan dîmena razber a manîdar ku dikare xwendevan metel bihêle, bi awayekî xwemal tîne ziman.[43]

Di peywenda zimanê helbesta modern de zimanê helbestê hem xwe dispêre axaftinê û hem jî ji wê dûr dikeve. Hinek îmaj bi rastî teswîra taybetmendiyên tiştên derveyîn in. Îmaj û tişt (nesne) ne beranberî hev in. Tiştên ji temaşevan xweser hene. Îmaj girêdayî têkiliyên şexsî û mekan in. Çawa ku deng ji guhdarvanan naqetin; îmaj jî parçeyên esas ên dîtin û bihîstinê ne.[44] Naveroka helbestkî, ne ragihandina zimanê siruştê ye. Fehmekî di îmajên helbestê de karîger e. Unsûrên sazker ên bingehîn ku asta maneya wê ya kûr destnîşan dikin, maneyên biçûk in. Evên ku em ji wan re dibêjin îmaj, ne mecbûr in di pêvajoya manedayînê de çêbibin.[45]

Îmaj dema ji hinekan re bê gotin muhtacê bêjeyan e. Divê berî her tiştî îmajek hebe ku pêdiviya gotina wê ji hinekan re hebe. Îmajek ku bi bêjeyan nehatibe gotin, di eslê xwe de tuneye. Îmajeke bi vî rengî, encax di hişê mirov de di rewşa ewrekî (nebuloz) de heye. Rewşek ku naverok û çarçoveya wê nediyar… Îmaj, bi bêjeyan şekil digrin û vediguhezin raman û tabloyên ji bêjeyan çêbûyî.[46]

“Mirov bi bêjeyan û bi îmajan diaxivin. Ziman û îmaj, bi awayekî ji hev venaqetin bi hev re hatine girêdan.”[47] “Helbest, bi riya bêjeyan, hunera çêkirina şeklên xweşik e. Ne tiştekî din e. Dayik e, dost e, qedeh e, hesret e, xeyal e, ango tiştekî ku mane û siyeke wê heye.”[48] Li gor Muzaffer İlhan Erdost di çêkirina helbestê ya bi bêjeyan de, bêyî girêdana fikrekî bi hestekê ve sazkirina risteyan û ceribandina sentezên nû heye.[49]

Di helbestê de bikaranîna ziman xwe dispêre du tradîsyonan. Yek, tradîsyona ziman ya hundurîn bi awayekî din dustûra bingehîn ya ziman e; lewra mehsûla

---

[43] Çetin, *Şiir Çözümleme Yöntemi*, r. 98.

[44] Burnett, *İmgeler Nasıl Düşünür*, r. 93.

[45] Yalçın, *Şiirin Ortak Paydası*, r. 136.

[46] Rasim Özdenören, *Yazı İmge ve Gerçeklik*, İz Yayıncılık, İstanbul, 2011, r. 26.

[47] Burnett, *İmgeler Nasıl Düşünür*, r. 92.

[48] Cahit Sıtkı Tarancı, *Bütün şiirleri*, Berhevkar: Asım Bezirci, Can Yayınları, İstanbul, 1983, r. 23.

[49] Muzaffer İlhan Erdost, *İkinci Yeni Yazıları*, Onur Yayınları, Ankara, 1997, r. 9.

peymaneke hevpişk e. Her ziman pergalek e, şirîkên ziman, her tim vê pergalê bi kar tînin. Didu, tradîsyona derveyî ziman.[50] Dûrketinên ji peywenda peyvê ji bo hin bikaranînên ziman in. Bi şêwazeke din helbest, şeklê ziman ê azad e. [51]

Di helbestê de zimanê bi îstiare, maneya ku mirov dixwaze bigihîne xwendevan, bihêztir nîşan dide. Helbest, heta ku tu bibêje zorê dide vê qada mecazî. Maneyê diderizîne û bêjeya ji çarçoveya wan a xwezayî berdide (…) Maneya ku ji çarçoveya bêjeya ya xwezayî derdikeve, helbestê hîn bêtir tîr û bihêz dike. Bi vî awayî şoreşekê pêk tîne. Şoreşa bihêzkirina maneyê.[52]

Helbest, ji bikaranîna bêjeyên derveyî maneya xwe pêk tê. Peywira helbestvan bi hêza bêjeyên efsûnî yên ku di dawiya maskeyên veşartî de ne ji nû ve afirandina dinyayê ye.[53] Bi bêjeyên zimanê rojane gotina tiştekî, zewqa helbestê ji holê radike. Ji dêleva wê, karê herî baş dramatîzekirina wî tiştê di mêjiyê mirov de ye.[54] Helbestvan helbestê wek xebateke fedakariyê dibîne. Helbesta ku afirîneriya mêjî ye ji bilî wê tu armanca wê tuneye. Di xwe de dest pê dike û di xwe de diqede.[55]

"Maneyên nû, ji têkiliyên bêjeyên beranber derdikevin. Maneyên ji tariyê tên û di tariyê de rûdinên û maneyên ferhengî, têra vegotina wan maneyan nakin.[56] Em dikarin bi riya van her du pirsan fêm bikin ku bêje, îmajê diafirîne an na. Yek: Bêje ji objeya metnê ku tê kolandin pê ve objeyekê nîşan dide yan jî di çêkirina şibandinê de di navbera yê dişibe û yê tê şibandin de dûrî heye? Didu: Ev bêje, bi objeya ku nîşan dide, bi têkiliya şibandinê dikare bibe yek?[57]

Oktay Taftalı di kitêba xwe ya bi navê *Ahlak Estetîk ve Şîîr* de dibêje "ji ber ku helbest, hunera gotin û wêjeyê ye bi ziman re rasterast têkildar e. Encax bêjeyên ku di zimanê rojane de tên bikaranîn, di zimanê helbestê de bi hin guherînan rûbirû re dimînin. Mirov dikare vê guhertinê û çawabûna wê fêm bike. Helbestvan li ser bêjeyên jirêzê dikare hêza xwe îspat bike."[58] Taftalı, ji Mîchel Angela neqil dike "ji

---

[50] Mehmet Yalçın, *Şiirin Ortak Paydası*, C. 2., r. 52.

[51] Yalçın, h. b., r. 55.

[52] Ergüven, *Şiirin Gerçeği Toplumdaki Yeri*, r. 14.

[53] Kula, *XIX. Yüzyıl Fransız Şiiri Üzerine İncelemeler*, r. 144.

[54] Kula, h. b., r. 146.

[55] Kula, h. b., r. 149.

[56] İnce, *Şiir ve Gerçeklik*, r. 21.

[57] İnce, *Yazınsal Söylem Üzerine*, r. 57.

[58] Taftalı, *Şiirin Mikroestetik Eleştirisi, Ahlak, Estetik ve Şiir*, r. 12.

bo helbest bikare bibe vegotineke rasteqîn ji bêjeyan bêtir divê bi îmajan bê nivîsîn. Helbesta ku tenê bi bêjeyan tê nivîsîn, lîstikeke mekanîk e. Hêza wê helbesta ku bibe vegotineke heqîqî tuneye. Eger ev hêz hebûya jixwe wê îmaj, şûna bêjeyan bigirta û wê helbest, ji canbaziya ziman derketa biba çalakiyeke mêjî.

Di roja me de dema em li helbestvanên mezin ku gîhaştine vegotina rasteqîn dinêrin (Neruda, Aragon, Paund, Paz hwd.) di gişa de em dibînin ku helbest ji bêjeyan bêtir wek pirsgirêkeke mêjî û xeyalê tê dîtin. (…) Helbest û îmaj, bi riya bêjeyan dibin tişt.[59] Eger helbesteke derketiye holê, ji dêleva îmajê tenê avahiyeke ji bêjeyan pêkhatiye nîşan bide ewê bibe vegotineke lawaz û nikare bigihêje asta helbesteke heqîqî.[60] Divê Îmaj ji helbestê re nebe bar giranî. Dema îmaj, li stûyê helbestê siwar bû û tenê dengê çakuçê helbestvan yê îmajçêker hat, helbest bêhna xwe ya dawiyê dide. Lewra divê îmaj ne ruhê helbestê be, belkî nazdariya ruhê helbestê ye; lê ne ruh bixwe. Helbestvan divê ne nêçîrvanê îmajan û ne peykertiraşê îmajan be. Helbestvan divê zanibe di kîjan helbestê di îmajan çiqasî bikar bîne.

Helbest, bêjeyan li gor mantiqa xwe ya derunî tîne cem hev û wan di zimanê rojane de ji qalibên jirêzê derdixe di nava sentezên nû de bi kar tîne. Bi vî awayî dibe xwedî derfetên vegotinê yên bitesîr. Îmajên ku kevirên binyada helbestê yên bingehîn in, wiha pêk tên. "Îmaj, dişibin elmasên ku binyada wan karbon e. Her çiqasî îmaj, ji bêjeyên di zimanê rojane de li cem hev nayên dîtin pêk bên jî ne bêmane ne. Divê neyê jibîrkirin ku mantiqeke îmajê ya derûnî heye. Yan na îmaj, bi hêsanî elatewş dibe.[61] Gotina helbesta ku wek hunereke belaxatê tê dîtin, ji dîtbariyê dûr e û ne pêkan e. Tiştê ez dibêjim ew e ku li gor xwe dîtbariyeke helbestê heye ku ji hunerên dîtbariyê yên din cuda ye, xwemal e. Lewra dîtbariya helbestê ne dîtbariyeke ku berê xwe dide gotinê; di mêjiyê mirov de dramatîze dibe. Dîtbariyeke ku helbestvan bi riya gotinan ava dike.[62]

Jean Jacques Rousseau (1712-1778) dibêje "axaftina ji bo çavan, ji axaftina ji bo guhan çêtir e " Bi vî awayî çalakiya îmajê derdixe pêş. Her çiqas ziman ji aliyê ragihandinê pêşeng be jî carina razber û acizker tê dîtin. Carina jî peyama wî nayê bihîstin. Îmaj, ji aliyê ragihandinê destekeke baş e. Îmaj, ragihandina zûzûka pêk

---

[59] Taftalı, h. b., r. 21/22.

[60] Taftalı, h. b., r. 22.

[61] Metin Altıok, *Şiirin İlk Atlası*, YKY, 2003, r. 14.

[62] Altıok, h. b., r. 36.

tîne. J. J. Rousseau dibêje “di kurtedema çavşikandinê de bi riya dîtberiyê hemû tişt tên gotin.”[63]

Roger Caîlloîs (1913-1978) angaşt dike ku îmaj di helbestê de jî di pexşanê de jî bikaranîna ziman a bi şêwazeke nû ye û ji bilî rola nîşandan û binavkirina bêjeyê rola bangewaziyê jî lê zêde dike. Bangewazî parçeyekî sazker ê girîng e. Ji bo helbestê cihê bangewazî lê hebe bivênevê îmajeke ku hatiye îcatkirin jî heye. Li gor ustadê hêja Roger Caîlloîs “helbest, hunera rist û îmajan e.”[64] Divê paşxaneya îmajê dewlemend be û hêza xeyala xwendevan şiyar bike. Ji ber ku îmaj, piranî di paşxaneya wan hizrên di mêjiyê xwendevan de çê dike, hewl dide ku dîkikê kelecan û ramanan jî bikişîne.[65]

Özdemir İnce dibêje “îmajeke baş di mêjiyê xwendevanan de zincîreke bangewaziyê ava dike. Bangewaziyên ku derdikevin holê hemû bi hev re têkildar in. Ji bo coşeke tund nişan bidin hatine afirandin.”[66] Li gor Înce "îmajên teswîrî, rastiya bi riya vegotinê, radigihînin. Tenê tiştên ku teswîr dikin, bi fêmkirin didin. Hêzên wan ên bangewaziyê qels in. Tenê hizran dilivînin lê kelecanê naafirînin."[67] Înce ji Gaston Bachelard (1884-1962) neqil dike dike “hebûna îmajên helbestkî jî heye.” Ji ber ku dîmenekê di mêjiyê mirov de çê dike.[68] Ev dîmena ku di mêjiyê xwendevan de saz dibe, armanca herî girîng ya îmajê ye.

Helbestvan, bi riya îmajan wek wênesazekî li ser tûala mêjiyê mirov wêneyên ecêb çê dike. Tê gotin ku şîroveya îmajan, zewqa metnê kêm dike. Encax bi vekolandina îmajê, em dikarin wê baş fêm bikin, heyranê wê bibin û ezmûnên xwe şênber bikin. Ji bo îmaj, bikare karîgeriya ragihandinê pêk bîne divê bê şîrovekirin û distûrên bikaranîna wê bên zanîn[69] Îmaj, bi mirovan re diaxivin. Lewra dîtin, tê maneya hebûna di hundir û derveyê laş de. Îmaj ji bo sazkirina meşrûiyeta tiştê tên dîtin û domandina wan wek destekekî tên bikaranîn.[70]

---

[63] Yücel, *İmgeden Yoruma*, r. 56.

[64] İnce, *Şiir ve Gerçeklik*, r. 20.

[65] Înce, h. b., r. 29.

[66] Înce, h. b., r. 30.

[67] Înce, h. b., r. 28.

[68] Înce, h. b., r. 45.

[69] Yücel, *İmgeden Yoruma*, r. 71.

[70] Burnett, *İmgeler Nasıl Düşünür*, r. 53.

Hevşirîkatiya cih û manzereyê bi qasî îmajê bixwe girîng e. Dibe ku îmaj, estetîka nêrîna manzereyekê ku nikare pêşkêşî mirov bike wê dîmenê bixwe pêşkêşî mirovan bike.[71] Di afirîneriya îmajan de sînor tuneye. Hestên di hêlkana mêjî de bê sekn û tebat kil dibin, dikarin xeyalên nedîtî bi riya gotinan pêşkêşî xwendevanan bikin. Xwendevan, bi riya manedayina bêjeyan ango mîreteya semiyolojîk a ziman van xeyalên ecêb ji nû ve di mêjiyê xwe de saz dike. Îmaj, ji hêz û bedewiya xeyalên mirov, manzereyên birqokî pêşkêş dikin ku sedema hezkirin, arezûkirin û tirsandina mirovan ji îmaja jî, ew e.[72] Halime Yücel ji John Berger neqil dike "îmaj, berê ji bo tiştên ku ne li vir in, bên dramatizekirin çêbûne. Bi demê re tê fêmkirin ku îmaj, ji tiştê ku dramatîze dike hîn bêtir mayînde ye."[73]

Nêrîna civakan li hember îmajê, tevlihev û guherbar e. Yek ji sedemên herî girîng ê vî tiştî jî şika ku îmaj, rastiyê nikare bide nîşandan, ne sadiq e û dikare derewan bike. Têkiliya îmajan bi ol û baweriyan re bialozî û nakokî ye. Her bawerî di hin wextên xwe de li hember îmajan bi îhtiyat tevgeriyane. Carna jî taybetmendiyeke girîng dane îmajan û ji bo hîn bêtir belav bibin ji hêza îmajan sûd wergirtine.[74] Di *Zebûr*, *Tewrat*, *Încîl* û *Qûrana Pîroz* de gelek ayetên gotinên wan biîmaj derdikevin pêşberî me. Zimanê van kitêbên pîroz, zimanê helbestê yê biîmaj e. Te’wîl û tehlîla kitêbên pîroz, bi îmajan gelekî kûrtir û di warê maneyê de dewlemendtir dibe.

Ji Henrî Bergson (1859-1941) heta Jacques Derrîda (1930-2004) bîrewêrên hevçerx îdia dikin ku îmaj, danakeve gotinê. Ji ber vê sedemê îmaj, tiştên ku bêje nikarin bikin ew dikarin bikin. Helbet îmaj, carna sûretê tiştan yên cemidî çê dikin û pê tên ser, lê têkiliyan jî diafirînin. Aliyekî îmajê jî li sihrê tê. Îmaj û sihr di zimanên biyanî de ji heman kokê tên.[75] Jixwe helbestvan jî bi saya îmajên bixemil xwendevanan heyirmayî dihêlin. Xwendevan, bi bandora îmajên xwemal, di bin avahiya helbestê de weke ku di bin çadira sîrkeke sihrê de be şaş û metel dimîne.

Îmaj ji me re ne dinyaya rasteqîn, ji kaînatan kaînatekê didin nîşandan. Ev tişt, pêşkêşkirineke nû ye. Dibe ku tu têkiliya tiştên îmaj temsil dikin bi vî tiştî re

---

[71] Burnett, h. b., r. 79.

[72] Burnett, h. b., r. 80.

[73] Yücel, *İmgeden Yoruma*, r. 20.

[74] Yücel, h. b., r. 46.

[75] Yücel, h. b., r. 38.

tunebe jî. Dibe ku tenê di kaînata xewnan de jî cih bigire. Dema em li îmajê dinerin çi cure îmaj be bila bibe îmaj berhemeke hişmendiya mirov e. Lêkolerê fransî Rêgis Debray dibêje “em li kaînatekê dipeyivin, di yeka din de dibînin. Îmaj nîşane ye, lê ne xwedî taybetmendiyên ziman ên semantîk e. Zaroktiya nîşaneyê ye.” Ev xwemaliya îmajê, hêzeke nedîtî ya transfera maneyê dide wê.[76] Îmaj ew qasî temsîlên zelal in ku ji temsîliyetê derdikevin û dikevin şûna tiştên temsîl dikin û pê ve dikelijin.[77]

Nivîskarê rusî Şklovsky (1893-1984) dibêje ku "peywira îmajê, zeftkirina dîmenekê ye."[78] Helbestvanê fransî Lamartine (1790-1869) angaşt dike ku ji bo ê ku dizane bibîne û hîs bike li her deverê helbest heye. Ya muhîm mirov bikare vî tiştê helbestkî bi hêza xeyalê zeft bike û maneya ku di kûrahiyê de radizê bi xwendevan re bide hîskirin. Helbestvan, divê bêyî ku sitû li ber distûrên aqil xwar bike bi hevaltiya periyên xeyalan bikare derkeve rêwîtiyên mizgîniyên nû.[79]

Yê ku helbestê dike helbest, unsûrekî cewhera wê pêk tîne îmaj e. Lêkolerê rûs Alexander Potebnya, di derheqê vê mijarê de îdiayeke balkêş dike. “huner bêyî îmajê nabe, helbest qet nabe.”[80] Îmaj, hîmê helbestê yê herî taybet e. “Peyvira îmajê, zeftkirina dîmenekê ye.[81] ”Îmaj, ji bo helbestê kevirê bingehîn yê sazker e. Lewra îmaj, dîmenên tiştên di mêjiyê me û rûdana wan ya di helbestê de ye.”[82]

Îmaj, dîmenên ku hunermend bi riya hîsên xwe fêm kirine anîna wan a ziman e. Ne weke teswîrekê, wek şîroveyekê dikare bê hesibandin.[83] Carcaran giraniya temamê helbestê yan jî qismekî wê ji îmajeke helbestvan zeft kiriye pêk tê. Ev îmaja nû, eger bi vegotineke serkeftî bê dayîn, helbest bi hêz û bandor dibe.[84] “Divê bi riya îmajê bi jiyanê re têkilî bê danîn. Tiştên ku têkiliya wan bi tiştekî ve nehatibin danîn ew ne îmaj e. Tenê lîstika belaxatê ye.”[85] Divê ev neyê jibîrkirin ku tu helbest tenê ji

---

[76] Yücel, h. b., r. 45.

[77] Eagleton, h. b., r. 222.

[78] Şklovsky, (1971) *Sanat Yordamı*, Wer. Tahsin Yücel, Türk Dili, XXIII. 473.

[79] Kula, h. b., r. 130.

[80] Aksan, *Şiir Dili ve Türk Şiir Dili*, , r. 29.

[81] Aksan, h. b., r. 30.

[82] Aksan, h. b. r. 30.

[83] Aksan, h. b., r. 30.

[84] Aksan, h. b., r. 33.

[85] Cemal Süreya, *Güvercin Curnatası*, YKY, İstanbul, 2002, r. 119.

îmajan pêk nayê; lewra divê helbest nefesê rahêle. Helbesta ku tenê pişta xwe dide îmajê rijî ye. Encax helbestvanên ciwan û ecemî vî tiştî dikin. Lewra helbestvanên ciwan wek xirakên rengo rengo li îmajê dinêrin, dixwazin wê di nav helbestê de di kefa desten xwe de tund zeft bikin, bijidînin, lê ev tevger şaşî ye. Îmaj, di helbesteke serkeftî de wek dilekî xwînê pompeyî helbestê dike û piştre dîsa bi xwînê tije dibe. Eger di navbera îmaj û bêjeyan de têkiliyeke wiha pêk neyê îmaj jî helbest jî qîmeta xwe winda dikin. Ji ber ku helbest ji temamiyeke organîk bêpar dimîne îmaj, çiqasî birqok be bila bibe peywira xwe ya helbestkî nikare pêk bîne.[86]

"Îmaj, ji hest û dîmenên di mêjiyê xwendevan yan guhdarvan de ava dibe, dîmenên xwemal û sihêm çê dike. Fêmên ku helbestvan li dinyayê jiyaye bi maneyekê temam dike û dîmenek ahengdar saz dike. Îmaj, tazîkirina xusûsiyeta wan tiştan e ku xuya dibin. Îmaj, ji bilî taybetmendiya pênaseyê, ji bo nîşandana hest û raman û kelecanên me jî derfetên fireh diafirînin."[87]

Meyla helbestê heye ku mirovan bi derfetên îmajan bikole û fêm bike. Helbest bixwe pergalek e. Helbest dikare bibe hêvî û keşifkirina maneya kûr a jiyanê. Bi riya helbestê gîhaştina nirxên mirovatiyê, tê maneya hebûna me.[88] Her îmaj, me dişîne tiştên ku li derveyî ziman hene. Di vê rewşê de em dikarin bibêjin tenê rastiya îmajên tiştên şênber hene."[89] Îmaj dikare rastiyê vekîvekirî pêşkêş bike, lê belê di binê tiştê ku pêşkêş dike rastiyeke bingehîn venaşêre.[90] Di helbestê de mane, bi îmajan dibe xwedî hêz û bandorê li ser feraseta xwendevan dike. Gelekî beriya têgeha îmajê jî vegotinên biîmaj hebûn, lê belê kesekî nizanîbû ev, îmaj in. Helbestvanên van îmajana bikar tanîn, ne ji bo afirandina îmajan tenê ji bo giyanekî jîndar bidin helbesta xwe û bi vî rengî jî helbestên şêwaza wan yekdeng cihê bibin ev rêbaz bikar tanîn.

Abdullah Rıza Ergüven di kitêba xwe ya bi navê *Şiirin Gerçeği ve Toplumdaki Yeri* (Rastiya Helbestê û Cihê Wê di Civakê de) dibêje "îmaj helbestê hîn bêtir tîr û bihêz dike. Bi vî awayî şoreşekê pêk tîne. Şoreşa bihêzkirina maneyê ku bi bêjeyên helbestvan bi kar anîne helbest dibe çavekî ku li mirov û jiyanê

[86] Altıok, *Şiirin İlk Atlası*, r. 17.

[87] Çetin, *Şiir Çözümleme Yöntemi*, r. 96/97.

[88] Ahmet Ada, *Modern Şiir Üzerine Yazılar*, Digraf Yayınları, İstanbul, 2000, r. 152.

[89] Yalçın, *Şiirin Ortak Paydası*, r. 183.

[90] Hayriye Ünal, *Eşikteki Özgürlük Çok Sesli Şiir*, Hece Yayınları, Ankara, 2011, r. 182/183.

vedibe.[91] Her helbestvanek, bêjeyan vediguhezîne îdyûminên xwemal. Mîna ku eynikekê bide rastiya jiyanê. Hatina cem hev a du sê bêjeyan û veguhestina wan ya maneyeke nû… Ev, gelek balkêş e. Helbestvan zorê dide hemû derfetên ziman: maneya, îmaja, îstiareyê hemû unsûrên ku ziman vediguhezînin risteyan diceribîne.[92] Îmaj, bi îmajan tên zeftkirin. Rastiyên siruştê, vediguhezin îmajan û ji nû ve pêk tên.[93]

Îmaj xezîneya hunermend a herî biqîmet e. Bi bandora dinyaya derveyîn pêkhatina dinyaya derûnî ye. Vê pêkhatina encax helbestvan bikare birijîne risteyan. Qada îmajê jî ji nava jiyanê derdikeve û tê.[94] Helbestvan, ji serdema xwe re şahidiyê dikin. Bi dîtinên xwe, bi riya hin îmaj û sembolan, gotinên xwe dermale dikin.[95] Ev cewherê ji nava jiyanê de derdikevin, bi saya serê îmajan dibiriqînin û bandora wan li ser xwendevan an guhdarvanan zêde zêde dibin. Rastiyên jiyanê yên herî mezin jî bi riya îmajên helbestvanan derdikevin roniya tavê. Risteyên ji xeyalan bêpar rij in, bêta'm in, nagihêjin helbestê. Hebûna helbestê û parastina hebûna wê bi hêza xeyala hunermend re têkildar e.[96] Eger helbestvan bi pêşkêşkirina dinyayeke din a derewîn qaîl bibaya tu ferqa wî ji esrarfiroşekî nedima, lê wek min got berhemên xeyala helbestvan e, derew in, rast in.[97] Ji ber ku di xeyalxaneya helbestvan de hebûneke wan heye. Bêje jî ji bo anîna wan ya ziman xizmetkariyê dikin.

Ergüven angaşt dike ku "helbest bi zimanê îmajê, bi nîşaneyên xwe hebûna xwe bi xwendevan re didin hîskirin. Nemaze, pira navbera helbestvan û xwendevan saz dikin."[98] Îmaj, jîndariyekê didin helbestê. Helbest, xwendevanan dikişîne xwe.[99] Helbest, li gor hinek helbestvanan divê ne "loqmeya hazir" be. Divê hin qismên naveroka helbestê xwendevan temam bikin. Divê xwendevan, rasterast tevlî helbestê bibe. Zimanê îmajê pêwîstiya temamkirina vê yekê pêk tînin.[100]

---

[91] Abdullah Rıza Ergüven, Şiirin Gerçeği Toplumdaki Yeri, Berfin Yayınları, İstanbul, 2003, r. 14.

[92] Ergüven, h. b., r. 15.

[93] Ergüven, h. b., r. 25.

[94] Ergüven, h. b., r. 34/35.

[95] Ergüven, h. b., r. 46.

[96] Ergüven, h. b., r. 76.

[97] Ergüven, h. b., r. 83.

[98] Ergüven, h. b., r. 94.

[99] Ergüven, h. b., r. 157.

[100] Ergüven, h. b., r. 116.

## 1. 2. CUREYÊN ÎMAJÊ

Xebatên senifandina îmajê di serdema antîk de dest pê kirine. Zanyaran, ferq xistine navbera îmajên siruştî û îmajên çêkirî. Li gor vî tiştî îmajên siruştî, di encama sî û vebêyinê de derdikevin holê. Îmajên çêkirî ji aliyê mirovan wek wêneyan pêk tên.[101] Helbestvan, dîmenên hişê xwe, bi anîna balhev a bêjeyên dûr mane bi xwîn û goşt dike. Bi vê riya hunerî, xeyalxaneya xwendevanan dewlemend dike. Veysel Çolak, di kitêba xwe ya bi navê *Şiir Nedir Ve Nasıl Yazılır*'ê (Helbest Çi ye û Çawa Tê Nivîsîn) de ji teorîsyen Rene Wellek (1903-1995) û Austîn Warren (1899-1986) neqil dike ku îmaj, li gor van cureyana tên tesnîfkirin: Îmajên xemilandinê, îmajên noqbûyî, îmajên hov, îmajên radîqal, îmajên tîr, îmajên gûr û geş, îmajên belavbûyî.

a) Îmajên Hov:

Ev îmajana, ji kûrahiya mirov ya kirdeyî bêpar in. Yekbûneke sûnî pêk tînin. Peywenda peyvan, vegotineke hestyarî naynin ziman, bangewaziyeke ramanî dernaxin holê. Bi anîna bahev a van peyvan ve divê maneyeke di ferhengan de tuneye bê holê.

b) Îmajên Xemilandinê:

Şibandinên kûrahiya wan a bikêrî tuneye. Ji ber ku lihevanîn in, beranberê heyîna wan tuneye. Vegotineke atmosfera mirovan a siruştî û civakî ya tund e. Ev îmajana, çîroksaziyekê dixin helbestê. Tiştê muhîm, pêkanîna bikêrhatina îmajan e. Ev jî bi bangewaziyên bitesîr û mayînde pêk tê.

c) Îmajên Gûr û Geş:

Îmajên gûr û geş, şêwazeke îmajên hov ên nazik in. Bi anînabahev a bêjeyên maneya wan berfireh û qîmeta wan ya xeyalî bilind pêk tên. A rastîn bianîna hember hev pêk tên.

ç)Îmajên Tîr:

Bi rêkûpêkkirin û pêşxistina îmajên xemilker, îmajên tîr derdikevin holê. Wek çêkirina wêneyekê saz dibin. Bi hemû awayî pala xwe didin dîtbariyê. Îmajên vekirî û zelal in. Vegotinên teswîrî, îmajên bi giştî derdixin holê.

[101] Yücel, *İmgeden Yoruma*, Ayrıntı Yayınları, r. 23

d) Îmajên Noqbûyî:

Ev cure îmaj, tiştên bi pênc uzwên hîsî em pêdihesin naynin ziman. Îmajên bi peyvên razber çêdibin ev îmaj in. Bangî aliyê mirov ê ramanî dikin. Ev îmajana bêtir li gor nivîsên ramanî ne, bi teşbîhên xeyalî pêk tên.

e) Îmajên Radîqal:

Bêjeyên ku îmajên radîqal pêk tînin, têkiliyên mantiqî ne. Di vî karî de afirîneriyek heye. Bêjeyên tên bikaranîn mîna têgehan in. Aliyên wan îmajan yên hestyarî kêm in.

f) Îmajên Belavbûyî:

Ev cure îmaj, dijberê îmajên tîr in; arezûyên mirov derdixin holê û nîşan didin. Têgehek, têgeheke din dewlemend dike. Îmajên belavbûyî, ji bo helbesta modern derfeteke mezin e.[102]

Îmaj li gor peywendê jî hatiye senifandin. İnce, di kitêba xwe ya bi navê *Şîîr ve Gerçeklîk*'ê de îmajê li gor peywenda wê ya felsefî, peywenda mantiq û peywenda hunerî dabeş dike. Di peywenda felsefeyê de ji bo îmajê wiha dibêje "yekem qonaxa agahiya mirov, îmajên hîsa didin sehkirin. Îmaj, tenê bi çav, bi dest, nayên sehkirin. Îmajên bihîstinê, îmajên pelandinê, îmajên bêhnkirinê, ên tehmkirinê jî hene. Ji bilî van îmajên hîsên me yekser digihînin me, îmajên bi zaneyî bi riya bangewaziyên kevin pêk tên jî hene. Îmaj, encax bi zaneyî pêk tê. Gelek hîsên me yên li derveyî hiş de mane, nikarin îmajê saz bikin. Îmaj, şopa hîsan a di mêjî de ye." Ji bo peywenda îmajên mantiqê, İnce, wiha dibêje: "Di mantiqê de îmaj, wek îmajên ferasetê, îmajên xewnan, îmajên bîranînê tên dabeşkirin. Çi di peywenda felsefeye de çi di peywenda mantiqê de îmaj, rûdana rastiya tiştan a di mêjiyê me de ye. Îmaj, wek îmajên sehkirinê û îmajên ramanî jî tên senifandin." İnce, di peywenda îmaj û hunerê de destnîşan dike ku huner çalakiyeke mirov a hişmendî ye. Ew jî rûdana tiştan ya rasteqîn e ku di hişmendiya mirov a estetîkî de pêk tê. Ew îmajên ku me bi peywenda felsefê û mantiqê behs kirin, di warê çavkanî û naverokê de yekîtiya wan bi îmajên hunerî re heye."[103] Esas mirov dikare li gor binyada îmajan behsa du beşên îmajan bike: Ya yekemîn îmajên hîsî ya diduyan îmajên ferasetê ne. Îmajên ferasetê, berovajî îmajên psîşîk li gor nêrîneke rasteqîn tên hilberîn.[104]

[102] Veysel Çolak, *Şiir Nedîr ve Nasıl Yazılır*, Îkaros Yayınları, Îstanbul, 2011, r. 130/137.

[103] İnce, *Şiir ve Gerçeklik*, r. 23/24.

[104] Yücel, *İmgeden Yoruma*, r. 23.

Li gor van agahiyên ku me li jorê dane hate dîtin ku îmaj, ji gelek aliyan ve tê dabeşkirin. Her hunerek li gor pêşkêşkirina xwe ya rastiyê îmajê dikare terîf û tesnîf bike. Bo nimûne: Îmajên wêjeyî, wêneyî, mûsiqî, mîmarî, peykerteraşî, hwd. Hunerên bedewî û plastîkî, li gor amûrên xwe yên hunerî îmajê dinirxînin û bi awayên curbicur di mêjiyê mirov de şopeke dîmenî çêdikin.

Di vê xebatê de çarçoveya me helbet îmajên helbestkî ne. Ji ber vê yekê em li ser têkiliya hunerên din û îmajê nasekinin. Îmajên wêjeyî jî bi gelek awayî tên dabeşkirin. Li gor hunerên belaxatê ku kîjan îmaj, bi saya kîjan hunerê welidiye? Ev dibe bibe cureyekî senifandina îmajan. Îmaj, dibe li gor serdemên edebiyatê bên dabeşkirin. Bo nimûne: Di serdema edebiyata devkî de îmaj, di serdema edebiyata gelerî de îmaj, di serdema edebiyata klasik de îmaj, di serdema edebiyata modern de îmaj, di serdema edebiyata postmodern de îmaj…

Îmajên edebî, divê li gor rêbazên edebî û nêrînên wan yên îmajê jî bên senifandin. Bo nimûne: Îmajên humanîst, îmajên klasîk, îmajên romantîk, îmajên realîst, îmajên naturalîst, îmajên parnasyen, îmajên sembolîk, îmajên surrealîst, îmajên ekspresyonîst, îmajên futurîst û hwd. Binyada van rêbazên edebî û dîtina wan û vebêyina wan a rastiyê, dibe ji cureyên îmajê re bibe pîvanek. Li gor mijara îmajan jî dibe îmaj bên dabeşkirin. Wek mînak: Îmajên evînê, îmajên siruştê, îmajên xurbetê, îmajên zarokatiyê, îmajên tenêtiyê, îmajên mirinê, îmajên azadiyê, îmajên mêrxasiyê, îmajên zordestiyê, îmajên jinê û hwd. Ev lîsteya mijaran dibe gelekî dirêj bibe.

## 1. 3. ÇEND DÎTINÊN LI SER TEORIYA ÎMAJÊ

Yekem teorîsyenê helbesta bi îmaj T. E. Helmûn (1883-1917) bingeha fikrên xwe ji felsefeya fransî ya Henrî Bergson (1859-1941) û felsefeya wî entuîsyanîzmê girtiye.[105] Ev dîtin li ser esasa têkiliya di navbera mirov û îmajê de saz bûye. Her îmaj li gor afirînerê xwe xwedî maneyekê ye. Xwendevan vê maneyê kêm zêde fêm dike û fêma xwe li ser maneya îmajê bar dike. Dibe ku maneya xwendevan li îmajê bar kiriye, ji maneya di hişê helbestvan de jî bixemiltir be. Lewra îmaj şexsî ye. Wek Ereb dibêjin: "El mana fî batinî eş şaîr" ango mane, di zikê helbestvan de ye.

[105] İnce, *Yazınsal Söylem Üzerine*, r. 53.

Bêatrîce Lenoir, ji helbestvan Baudelaire (1821-1867) neqil dike "Baudelaire, di nivîsa xwe ya bi navê "Îmajinasyon Dinyayeke Din Diafirine" de wiha dibêje: "Îmajinasyon, keşifkirin û derxistina holê ya rastiyekê ku siruştê pêşkêşî me nekiriye. Baudelaire di heman nivîsa xwe de wiha dibêje "yê ku maneya bêhnan, rengan û dengan bi mirovan daye fêmkirin îmajinasyon e. Di destpêka dinyayê de yê ku îstiare afirandiye îmajinasyon e. Îmaj, tiştên ku hatine afirandin, yeko yeko ji hev vediqetîne û bi amûrên li gor hin qaîdeyan hatine tenzîmkirin ku kok û rehên wan di kûrahiya ruhê me de ne dinyayeke nû ava dike." [106] Roni Tinyanev di derheqê îmajê ango jirêderketin an ji mane dûrketinê de wiha dibêje "dûrketina ji maneya edebî çiqasî diyar be ew tiştê ku em jê dûrdikevin, ew qasî li ber çavan tê raxistin.[107] Terry Eagleton di kitêba xwe ya bi navê *Şiir Nasıl Okunur*'ê de angaşt dike ku zehmetbûna xwendina helbesta modern, bi îtiraza wê ya zû dahurandinê re têkildar e.[108] "Her çiqasî bi qûwet dibin bila bibin îmaj, di navbera qabîliyeta temaşevanan, afirînerî û şîrovekirinê de di nava rêzikeke têkiliyan de ye."[109]

Hilmi Yavuz, ji Heîdegger neqildike "tradîsyona aqil ya ji Platon heta digihêje Hegel heyîn baş li ber çavan negirtiye. Encax helbest dikare heyînê bi têgihiştineke rasterast bîne ziman. Tiştê ku felsefe nikare, wê helbest bike.[110] Li gor Yavuz, helbest û logos li hev nakin. Lewra heta ku helbstvan nikarîbe tiştên dibêje rave bike û heta ku nizanîbe dibêje çi mecbûr e li derveyî logosê bimîne. Logos, bi îmajên ne diyar pêk nayê. Helbesta ku bi îmajên bêkêr hatibe ziman tu tiştekî rave nake. [111]

İsmail Tunalı di kitêba xwe ya bi navê "Grek Estetîkî" de ji Platon neqildike "poîessîs tiştê ku em jê re dibêjin afirînerî pir fireh e. Tu dizanî her cure tiştê ku ji tune çêdibe ew afirînerî ye.[112] Bi vî awayî Tunalı, têkiliya îmaj û felsefê di peywenda

---

106 Beatrice Lenoir, *Sanat Yapıtı*, Wer. Aykut Derman, YKY, İstanbul, 2004, r. 77/78.

107 Yuri Tinyanev, *Yazınsal Evrim Üstüne*, 2. Bas. Haz. T. Todorov, Wer. M. Sema Rıfat, YKY, İst., 2005, r. 122.

108 Eagleton, *Şiir Nasıl Okunur*, r. 34.

109 Ron Burnett, *İmgeler Nasıl Düşünür*, Metis Yayınları, Wergera Tirkî: Güçsal Pusar, İstanbul, 2012, r. 68.

110 Hilmi Yavuz, *Kara Güneş*, Edebiyat ve Sanat Yazıları, Can Yay., 2. Basım, İstanbul, 2003, r. 104.

111 Hîlmî Yavuz, *Yazın Dil ve Sanat*, Boyut Yayınları, 2. Baskı, İstanbul, 1999, r. 110/111.

112 İsmail Tunalı, *Grek Estetiki*, İstanbul, 1963, r. 48.

afirîneriyê hildigire dest xwe û îmajê wek pirsgirêkeke estetîkê tevlî nav refê felsefê dike.

Arîsto di nêrîna îmajekê de derfeta tazîbûna ji xwestekan dibîne. Wek mînak dîtina sahneyeke naveroka wê bişîddet, me sewqî şîddetê nake. Bereksê wê me ji xwesteka şîddetê dûr dixe. (…) Arîsto, qabîliyeta mirovan ya hilberîna îmajê wek wesfeke wan ya siruştî dibîne. Îmajê wek karîgeriyeke hişmendî dibîne. Li gor Arîsto meyla mirovan li ser teqlîdê heye. Zarok, agahiyên xwe yên ewil bi riya teqlîdê fêrdibin. Bi ser de jî herkes ji teqlîdê hez dike. Em ji nêrîna îmajan jî hez dikin.[113] Aristo dibêje ku: "Mirov, bê îmaj tu carî nikare bifikire û lê zêde dike ku sedema hezkirina me ya nêrîna îmajan em dibêjin ev, ew e. Ew jî ev e. Em bi wan, tiştên din nasdikin.[114]

Özdemir İnce ji Henri Bergson (1859-1941) neqil dike "Bi riya îmaj an jî şibandinê li hember pirsgirêka ragihandinê derdikeve. Difikire ku îmaj, rastiyê nikare bi awayekî temamî nîşan bide, lê derfetên ku îmaj karîbe nêzîkî me jî bibe bi îmajê re mumkun e.[115] Înce neqil dike ku Bergson bi maneyeke giştî dibêje: "Îmajan bidin min ji ber ku îmaj bê sekin diguherin û laşê min jî bê guherandin disekine. Taliya talî wê laşê min di nav îmajan de wek tiştekî cihê hebûna xwe nişan bide."[116]

Sartre ji Spînoza (1632-1677) neqil dike "teoriya îmajê ji teoriya agahiyê hatiye qetandin û bi teswîra laş ve hatiye girêdan. Îmaj li gor spînoza hestyariya laşê mirov e. Tesadufî, hevduzeliqandin, banekî çavkaniya peywendiyên îmajan e."[117] Li gor Spînoza du rûyê îmajê hene îmaj bi awayekî radîqal ji ramanê cihê ye. Îmaja di felsefeya Descartes de ji ramanê cihê, di felsefeya Leibniz (1646-1716) de dixwaze tevlî ramanê bibe. (…) Hemû keda Leibniz di mijara îmajê de sazkirina dewamiya di navbera îmaj û ramanê de ye.[118] Leibniz, dixwaze maneyekê bibîne ku îmajê bi ramanê re girêbide ji bo îmaj nefire neçe.[119]

---

113 Yücel, *İmgeden Yoruma*, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2013, r. 54.

114 Yücel, h. b., r. 55.

115 İnce, *Yazınsal Söylem Üzerine*, r. 54.

116 İnce, h. b., r. 50.

117 Jean Paul Sartre, *İmgelem*, Wer. Alp Tümertekin, İthaki, 2. Baskı, İstanbul, 2009, r. 16/17.

118 Sartre, h. b., r. 17.

119 Sartre, h. b., r. 19.

Sartre ji Edmund Hussrel (1859-1938) neqil dike "ji bo avakirina nêzîkatiyê di navbera îmajên maddî û îmajên psîşîk de tu asteng tuneye.[120] Sartre dîsa ji Hussrel neqil dike "karîgeriya îmajê, tijekirina agahiyên (bîlgî) vala ye." (…) Wek mînak dema ez çûkekê difikirim ez dikarim vêya di valahiyê de bifikirim ji bo ez vê valahiya hiş tije bikim nêrîna min a li çûkeke bixwîn û goşt bes e. Mane, îmajê wiha tije dike.[121] Jean Paul Sartre dibêje "îmaj ji ramanê cihê ye, himalê ramanê ye. Di vê rewşa de têkiliya bi ramanê re datîne, têkiliya nîşaneyê maneyê ye. (…) Îmaj dibe ku ji ramanekê pê ve ne tiştek be."[122] Li ser îmajê teza Sartre ev e: Îmaj ne ji vê dinyayê ye. Bi kurtasî li gor Sartre îmaj, dirûveke hişmendiyê ye, ji rastiyê bi dûr dixe, lê Sartre îmajê wek Platon mîna "teriya rastiyê ya ji tiştekî re nabe" nabîne. Li gor wî îmaj, înkara hebûnê ye.[123]

Îmajên poetîk an jî têgeha xeyalê, îroj hîn jî astengiya herî mezin ya estetîk û rexneya wêjeyê ye. Ji aliyekî ve tê gotin ku îmaja poetîk hemalê heqîqetê ye, lê ji aliyê din ve bi awayekî ne vekirî gotin ku fikr û raman ji hebuna îmajê nayê. Ji ber ku îmaj amûrên maneyê ne ji bêjeyên hemalê maneyê venaqetin.[124]

Öner Yağcı ji İoanna Kuçuradi neqil dike "di helbestê de afirînerê dengê ku îmajê saz dike, anîna zimên ya îmajê ye. Li vir tiştê tê ziman ne mane ye îmaj e. Mane, encax bi îmajên ku wan bêjeyana sazkiriye, dikare bê ziman."[125] Wek li jorê jî tê dîtin têgeha îmajê di her serdemê de ji aliyê gelek kesan ve hatiye guftugokirin û li ser vê têgehê gelek kesan serê xwe êşandiye. Her çiqasî mijar poetîk be jî aliyê wê yê felsefî, vê tegêhê dike mijara gelek huner û zanistan. Her feylesofekî, li gor nêrîna xwe ya felsefî fîstanek ji vê têgehê re fesilandiye.

Şîroveya îmajan karekî rexneya poetîk e û wek her xebata li ser helbestê bi estetîkê re têkildar e. Şîroveyên îmajan, li gor distûrên şerha deqên edebî tên kirin. Her şerh, divê hêza xwe ji peywenda bêjeyan û bangewaziya maneyê bigire. Li gor Ece Ayhan "helbest bi îmajan tê avakirin. Bêyî îmajan tiştek nayê gotin. Ji ber ku

---

120 Sartre, h. b., r. 142/143.

121 Sartre, h. b., r. 145.

122 Sartre, h. b., r. 79.

123 Yücel, *İmgeden Yoruma*, r. 57.

124 Bedrettin Cömert, *Croce'nin Estetiği*, Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara, 1979, r. 108/ 109/ 110.

125 Öner Yağcı, *Cumhuriyet Dönemi Edebiyat Çevirileri Seçkisi*, Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara, 1999, r. 507.

helbest hunera îmajan e."[126] Îmaj çawa bin wiha ne. Bi awayekî din nabin. Dibe ku îmajek me ber bi dilxelandinekê an dehşetekê bikişkişîne, lê em nikarin midaxeleyî wê û hebûna wê bikin. Îmaj; tazî, wekhev, dagirker, biaheng û teşhîrkar e.[127]

Têkiliya îmaj û xeyalan dibe sedem ku pêlikên xeyalan yên bi salan nikarîbûn bihatana salixandin, em li ser wan bifikirin. Em dibînin ku berî her tiştî plan, bername, bangewazî, xeyalên berbipaş, teswîr, tiştên din û gelek lebat di nav maneya îmajê de ne. Wek mînak wêneya bangewaziyeke şênber jî nîşan dide. Herikîna hiş, axaftina derûnî û hin teknîkên wek wan dikevin çarçoveya îmajê. Bi vî awayî di demên dawîn de gelek lêkolerên li ser îmajê agahiyan didin, dibêjin ku îmaj, wan tiştên ku me li jorê behsa wan kir, hemûyan dixe nav çarçoveya xwe. Teknîka îmajê ku bi awayekî din dewlemendiyekê didin me, ji aliyekî din di têgeh û lebatê de me ber bi xizaniyekê ve dibin. Li şûna gelek têgehên teknîkî, îmaj dibe têgeheke xelasker.[128]

"Helbest bi risteyekê yan bi îmajekê tê hişê mirov. Karê helbestvan, cewhera vê îmaj an jî risteyê pêş ve bixe, bi temamî wê derxe holê. Helbestvan, hemû hostetiya xwe li ser vê armancê tîr dike. Helbest carina bi yek nefesê derdikeve holê. Carina jî helbestvan dixe zorê, wî diştexiline, lê helbestvan di vî karê bi zehmet de tu carî nakeve heyra fesalê. Armanca wî ya sereke ew e ku cewherê di wê îmaja derketiye holê pêşve bixe.[129]

Ji sedsala 19mîn û vir ve dîroka hunerê di warê muzîk û wêjeyê de serîrakirina hunermendan a li hember rastiya siruştî ye. Serîrakirin berê bi deformasyonê dest pê kiriye. Her çûye huner ji siruştê qetiyaye. Herî dawî xwestiye ku rastiya xwe biafirîne[130] Rastiya helbestê bi îmajan tê zeft kirin. Rastiyên siruştê dibin îmaj û derdikevin pêşberî me.[131] Helbest ji her tiştî zêdetir rengvedana jiyana rasteqîn e, rastiyan, ne bi hemû tûjiya wan bi awayekî vebêyînî bi xwendevan dide bihîstin.[132]

---

[126] Ece Ayhan, *Dipyazılar*, YKY, İstanbul, 1996, r. 74.

[127] Hayriye Ünal, *Eşikteki Özgürlük Çok Sesli Şiir*, Hece Yayınları, Ankara, 2011, r. 181/182.

[128] Mehmet Önal, *Yeni Türk Edebiyatı*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2009, r. 227.

[129] Metin Altıok, *Şiirin İlk Atlası*, YKY, 2003, r. 31.

[130] Karaca, *İkinci Yeni Poetikası*, r. 247.

[131] Ergüven, *Şiirin Gerçeği Toplumdaki Yeri*, r. 25.

[132] Ergüven, h. b., r. 55.

Dema helbestvan, helbesta xwe ava dike, dinivîse dibe dildarê rewşa ku hîs dike. Di risteyên xwe de berî her tiştî cih dide vana. Qîmeteke taybet dide hestên ku bi carekê lê dicivin. Ji aliyekî vebêyînên jiyana rasteqîn, ji aliyê din ve xeyalxaneya helbestvan bi hev re ew qasî dikelijin ku rastî ji cihekî xwe asê bibe jî dîsa jî rastiya xwe ya cewherî winda nake.[133] "Rastî qedexe ye, ji jiyana me hete heta surgûn bûye. Derfeta gîhaştina heqîqetê tuneye. Wênesaz Pablo Pîcasso (1881-1973) îdia dike ku helbest dereweke, rastiyê fêrî mirov dike.[134]

Ahmet Haşim di mijara îmaj û rastiyê de cuda difikire û dibêje ku xewê wek dijjehrekê bandor li ser şevê nekira mirov bi dîtin û bihîstina tiştên di nava tariyê de dikarîbû eqlê xwe winda bikira.[135] Rastî tûj e, tehl e, carina pîs û xerab e. Mirov bi saya helbestê ji nav lepên rastiyê difilite û bi saya îmajan di paxila xeyalan de laş û giyanê xwe guhdarî dike. Helbesta biîmaj, mirovan ji rastiyên jiyanê dûr dixin. Ji şûna rastiyên jiyanê kêliyeke kin be jî mirov bi xeyalên helbesta biîmaj rûbirû dimîne û bi wê rastiya cîhana derewîn xwe aşdike, aram dibe. Helbestvan, rastiyê wek rastiyê hetta ji rastiyê hîn rasttir, hîn tam, hîn xweşik, hîn nexweşik, hîn bicoş, hîn sade, hîn tevlihev hîn ronî nîşan dide.[136] Helbest, bi rastiyê re eleqedar dibe, rastiyê dişixulîne, wê bilind dike, lê "Divê nebe xwînmijê rastiyê." Di helbestê de cihê rastiyê heye, lê di pênaseya wê de na.[137] Divê têkiliya helbesta razber bi rastiyê re çi be, sînorên wê dikarin herin heta ku? Wek wêneyên razber helbesteke razber jî dikare çê bibe. Tiştê nebe tuneye. Divê ji bîr nebe wêne, wêne ye; helbest jî helbest, lê divê ji bîr nebe bêje, parçeyên herî biçuk ên rastiyê ne.[138]

Oktay Rifat dibêje ku "li gor min dîmena helbesta nû, weke dîmena resmê nû ji keda avakirina rastiyeke nû ya hunerê diwelide.[139] Di peywenda hunerê de îmaj, tevgereke hişê mirov e ku rastiya objektîf, wek rengvedaneke bedew derdixe pêşberî me. Ev rengvedana dibe ku ne rast be jî, lê çiqasî estetîk be ew qasî poetîk dibe. Îmaj jî hîn bi hêztir û bi xemiltir dibe.

---

[133] Ergüven, h. b., r. 153.

[134] Veysel Çolak, *Şiir Nedir ve Nasıl Yazılır,* r. 43.

[135] Ahmed Haşim, *Bize Göre, Gurabahane-i Laklakan, Frankfurt Seyahatnamesi,* MEB Bilim ve Kültür Eserleri Dizisi, İstanbul, 1986, r. 171.

[136] Cemal Süreya, *Uzat Saçlarını Frigya*, Yön Yayınları, İstanbul, 1992, r. 177.

[137] Cemal Süreya, *Toplu Yazılar*, YKY, İstanbul, 2000, r. 279.

[138] Cemal Süreya, *Güvercin Curnatası*, r. 193.

[139] Oktay Rifat, *Şiir Konuşması*, Adam Yayınları, İstanbul, 1992, r. 130.

"Dustûra helbestê bêrîkirina mirov a xweşikbûneke bilind e. Ev dustûr, di coşekê de di fûrandineke ruh de xwe nîşan dide. Ev coşî, ji derveyî heqîqeta ku mêjî distirê ye."[140] Armanca hunerê ya sereke bidestxistina bedewiyeke nedîtî ye. Ev bedewî di her cureyên hunerê de bi awayekî tê zeftkirin. Di hunera helbestê de bi mecaz û îstiare an jî teşxîs û tewriye ev yek derdikevin holê.

Helbest, bi bêjeyan li dinyayê dinêre û bi bêjeyan ji xwe re dinyayeke nû ava dike. Rastiya vê dinyaya nû, di ser rastiya tiştan re ye. Ev rastiya, rastiyeke ziman e ku qayişê bi rastiya tiştan re dikişîne. Helbestvan, bixwaze nexwaze wê rastiyê xera bike. Ev pêwîstiya xwezaya helbestê ye. Helbest çiqasî rastiya tiştan xera bike, ew qasî dikare hebe.[141] Dema ku di rastiyê de nayê dubarekirin, di her xwendina helbestê de ji aliyê xwendevan tê dubarekirin û ji nû ve tê herikandin.[142]

"Helbest, rastiyê ji çapameniyê, ji siyasetê û ji jiyana rojane re bihêle wê bikare vekişe nav nivîna xwe ya siruştî û biherike. Bêşik nivîna helbestê ya xwezayî utopya ye.[143]Ango îdeaye di mêjiyê helbestvan de ye ku helbest ji bo wê îdeayê dibe amûrek di destê helbestvan de. Helbestvan her tim hesreta dilê xwe, xewn û xeyalên xwe li teşiya gotinê dirêse. "Êdî tu kes qîmetê nade hestyariya erzan. Êdî hest û ramanên bi awayekî hunerî tên gotin, biqîmet in. Biqafiye ye an bêqafiye ye, ev ferq nake. Îro ji bo mirov di helbestê de serkeftî bibe, tenê qabiliyet têrê nake. Divê mirov karibe ruhê serdemê bixwîne. Ji îro û pê ve helbestvan nikare di dinyaya xewnan de bijî. Helbestvan êdî bûye hemwelatiyê dewleta rastiyê ya serdema xwe. Divê hemû rabirdû di helbestvan de bijî.[144]

"Rastî ne tenê tiştên ku em dibihîzin û di heman demê de tiştên em dikarin xeyal bikin, hestên fantastik jî rastî ne.[145] Her çiqasî hebûna şênber ya wan tiştên fantastik tunebe jî ew tişt, di mêjiyê helbestvan û xwendevanan de xwedî rastiyekê ne. Ev rastî, razber be jî dikare dîkikê hest û kelecanê bikişîne û rastiyeke xeyalî saz bike. Ev raman, bendên ji kevir û sitiriya yê navbera îmajan û rastiyê ji binî ve radike. Xeftanê xeyalê, li laşê rastiyê dike.

---

140 Kula, *XIX. Yüzyıl Fransız Şiiri Üzerine İncelemeler*, r. 18.

141 Altıok, *Şiirin İlk Atlası,* r. 19.

142 Altıok, h. b., r. 46.

143 Ahmet Telli, *Sulara mı Yazıldı*, Telos Yayıncılık, İstanbul, 2001, r. 34.

144 İnce, *Şiir ve Gerçeklik*, r. 73.

145 İnce, h. b., r. 37.

Binyada îmajekê rastî ye. Ev normal e. Lewra huner ji serdemên herî kevin û vir ve zimanekî taybet e ku mirovahî pê diaxive. Çawa ku heta hemberê wê tunebe bêjeyek nabe bêje, hunera rasteqîn jî îmajekê nikare bi awayekî objektîf ji têkiliya wê û rastiyê tazî bike.[146] Her îmaj, di peywenda xwe ya helbestkî bi rastiyê re têkildar e. Ne destê rastiyê ji îmajê dibe û ne jî îmaj bê rastiyê dikare bibêje ez heme. Îmaja herî rasteqîn be jî taybetmendiyên afirînerê xwe hildigire. Her çiqasî hebandina "Îmaj tiştekî xweser e." zor be jî pêwîst e. Divê îmaj bi modela wê neyê tevlihevkirin. Wek mînak qertpostala Ayasofya'yê, ne Ayasofya bixwe, qertpostala çavkaniya îmajê temsîl dike.[147] Îmaj, erka nîşaneyê digire ser xwe. Ji bo nîşaneyek, karîger be û dikarîbe peyamekê bide ragihandin, divê çend wesfên hilgire hebe. Divê berî her tiştî dokûmenter be. [148]

Bi derketina îmajê ya ser naverokê, îmaj derbasî şûna yan jî pêşiya maneyê dibe û bi wî awayî girêdana rastiyê û îmajê tê sistkirin an jî qutkirin. Îmajên bangewaziyên wan dûr an jî dijber saz dibin.[149] Hemû pirsgirêkên mijara îmajê derin û tên vedigerin têkiliya an jî dijberiya îmaj û rastiyê.[150] Her helbestvan li dinyayê dijî û bixwaze, nexwaze di jiyana xwe ya rojane de bi rastiyê re rûbirû dimîne.

---

[146] İnce, h. b., r. 53.

[147] Yücel, *İmgeden Yoruma*, r. 18.

[148] Yücel, h. b., r. 21.

[149] Asım Bezirci, *İkinci Yeni Olayı*, Su Yayınları, 2. Basım, İstanbul, 1986. r. 26/27.

[150] Yücel, *İmgeden Yoruma*, r. 66.

# BEŞA DUYEM

## 1. ÎMAJ Û HUNERÊN CIWANKARIYÊ

Hunerên ciwankariyê her çend di edebiyata klasîk de bêtir hatibin bikaranîn jî di edebiyata modern û bi taybet di helbesta modern de jî di peywenda îmajê de zehf hatine bikaranîn. Helbesta hevçerx a cîhanê, hunerên ciwankariyê wek gencîneyekê dîtiye û helbestvanan ji wan sihrên gotinê heta radeyekê sûd wergirtine. Xeml û xêza helbestê, rewşa hunerên belaxatê ye. Gotinên bi mecaz, îstiare, kînaye, tenasub, teşxîs û întaq, naveroka helbestê ji îmajên resen re vedikin.

Helbestvanên klasîk, hunerên dişibiyan hev bi kar dianîn. Ji ber vê yekê ji şêwazên wan ên gotinên edebî re "mazmûn" dihate gotin, lê helbestvanên modern, her çend heman hunerên ciwankariyê bi kar anîbin jî ew hunerana bi derfetên îmajê û bi bedewiya xwemaliyê ava kirine û îmajên nedîtî derxistine holê. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku di helbesta klasîk de cîhaneke xeyalên hevpar hebû û her helbestvan ji van xeyalan wek milkê bavê xwe sûd werdigirt.

Di helbesta modern de îmajên ku bi hunerên ciwankariyê hatine avakirin, ji ber ku dil û mêjiyên helbestvan li ser rûyê xwe wek xemlekê hildigirin helbestvan ji dafika teqlîdê xelas dikin û ber bi asoyên afirîneriyeke nedîtî dibin. Helbestvan, dikare helbesta xwe li ser yek hîmê hunerekê jî ava bike û temsîla hunerê li hemû laşê helbesta xwe bipêçe. Yan jî dikare her risteya helbesta xwe bi curbicur hunerên axaftinê bixemilîne. Wê demê helbest bi îmajan digihêje xwendevanan. Her xwendevan ji van gotinên dîmenkûr li gor fêma xwe ya estetîkî, li gor dewlemendiya xeyalên xwe cîhaneke fanteziyan derdixe. Dibe ku ew cîhana fantastîk, ji cîhana îmajan ya di mêjiyê helbestvan de ava bûye dûrtir, kûrtir û bixemiltir be jî, lê dibe ku li gor fantazya helbestvan lirû, teng, rijî, lawaz û bêtam jî be. Ew êdî ji rabirdûya xwendevan a hunerî re dimîne.

Xebatên ku bi navê arkeolojiya helbestê hatine kirin, li ser zimanê helbestê pir sekinîne, zimanê helbestê ji gelek aliyan ve ji zimanê rojane yê axaftinê veqetandine. Bêjeyên ku tena serê xwe di axaftina rojane de ji me re jirêzê tên, di peywenda helbestê û îmajê de roleke girîng dilîzin û dibin parçeyekî muhîm ê hunerê. Bêje, bi vî rengî formeke wêjeyî digirin. Em ê di vê beşa xebata xwe de li ser hunerên edebî ku di avakirina îmajan de zêde zêde hatine bikaranîn bisekinin. Em ê bi awayekî teorîk terîfa wan hunerên edebî bikin û di helbesta kurdî ya nû ya bakur

de ji bo her hunerekê em ê çend mînakan bidin. Bi vî awayî dê têkiliya îmaj û hunerên ciwankariyê çêtir bê fêmkirin.

Hunerên ciwankariyê, çêkerên îmajan e. Gotinên ku di peywenda helbestê de wek îmaj derdikevin pêşberî me, bi saya hunerên ciwankariyê saz dibin. Îmaj, bi hunerên ciwankariyê kirasekî rengîn li bêjeyan dike û wan dike parçeyekî dîmenên dûrî rastiyê. Her îmajek, herî kêm bi têkiliya di navbera du bêjeyan de pêk tê. Ev têkilî piranî bi hunerên mecaz, îstîare û teşxîsê çê dibe.

Hunerên ciwankariyê ji aliyê maneyê ve îmajên helbestkî ji hev vediqetîne. Bi mantalîteya van hunerên ciwankariyê em dikarin çêbûna îmajên helbestkî terîf bikin. Her hunerek ciwankariyê, ji bo îmajê derfeteke cuda derdixe holê. Bi saya van hunerên ciwankariyê îmajên rengîn ku di zimanê helbestê de xwedî roleke giring in, derfetên vegotinên resen dide helbestvanan û deriyê maneyên kur yê helbestê li xwendevanan vedike.

Di zanista edebiyatê de gelek hunerên ciwankariyê hene, lê di vê xebatê de me cih neda hemû hunerên ciwankariyê. Ji ber ku gelek hunerên ciwankariyê di çêkirina îmajan de nayên bi kar anîn. Helbestvanên ku me mijara teza xwe bi berhemên wan sînor kiriye, di berhemên xwe yên helbestan de ji bo çêkirina îmajan piranî cih dane hunerên teşbîh, îstîare, mecaz, teşxîs, kinaye, mubalexe, tenasub, tezad, husna talîl û tecahula arîfê. Ji ber vê sedemê me jî di çarçoveya vê xebatê de sînorên hunerên ciwankariyê bi van hunerên navborî diyar kir.

## 2. HUNERÊN CIWANKARIYÊ

### 2. 1. Teşbîh / Dirûvpêxistin

Ji bo xurtkirina gotinê şibandina tiştekî qels bi tiştekî berz teşbîh e. Teşbîh, ne hunereke mecazê ye ji ber ku bêje di teşbîhê de bi maneyên xwe yên rast tên bikaranîn. Di teşbîhê de li gor Cem Dilçin çar unsûr hene.

a) Ê ku dişibe: Di şibandinê de yê ku ji aliyê çawabûnê ve qels e.
b) Ê ku tê şibandin: Di şibandinê de tiştê ku ji aliyê çawabûnê ve bihêz, bilind û berz e, ew, mûşebbehun bîh e.
c) Aliyê Teşbîhê: Têkilî û hevpariyên navbera du tiştan pêk tîne e. Ev têkilî ji aliyê çawabûnê ve çar cure ye:

1) Aqlî: Şibandina bi pîvanên aqil û mantiqê dikare bên fêmkirin.

2) Hîsî: Şibandinên bi penc hîsan dikarin bên fêmkirin.
3) Xeyalî: Şibandinên encax bi riya muxayîleyê dikarin bên fêmkirin.
4) Wehmî: Şibandinên ku di rastiyê de tuneye.

d) Daçeka Şibandinê: Daçeka ku di navbera bêje, têgeh an jî bêjeyên di peyvira daçekan de hatine bikaranîn. Di şibandinê de ev daçekana tên bikaranîn: wek, mislê mîsal, sifat, manend, mîna, adeta… Li gor unsurê teşbîhê çar cure teşbîh hene:

1) Teşbîh-a mufassal/Dirûvpêxistina têkûz: Teşbîha ku çar unsûrên teşbîhê di naveroka xwe de dihewîne jê re teşbîha mûffassal tê gotin.
2) Teşbîh-a mûcmel/dirûvpêxistina kurt Teşbîha ku aliyê şibandinê nehatiye gotin.
3) Teşbîh-a muekked/Dirûvpêxistina xurtkirî: teşbîha ku tê de daçeka şibandinê nehatiye bikaranîn.
4) Teşbîha belîx/dirûvpêxistina rewan: Şibandina ku tenê bi du unsurên eslî (ên dişibe û tê şibandin) çêdibe. Teşbîha aliyê şibandinê û daçeka şibandinê nehatiye bikaranîn xweşiktir û meqbultir tê hesibandin.[151]

Mînak:
"pelek bi tenê zerik mişmişî
wek porê payizî hişk û ziwa"[152]

Di van risteyan de pelekî zerik û mişmişî bi porê payizê ve hatiye şibandin. Di vê mînaka teşbîhê de aliyê şibandinê jî hişkbûn û ziwabûn e. Hunera teşbîhê îmajeke payizê derxistiye holê.

"şev weke lehiya reş tê
ji çiyayên jiyaneke derewîn"[153]

---

[151] Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, TDK Yayınları, 10. Baskı, Ankara, 2013, r. 405, 406, 407, 408, 409, 410.

[152] Arjen Arî, *Ev Çiya Rûspî Ne*, Avesta, Stenbol, 2002, r. 43.

[153] Berken Bereh, *Pandomîm,* Belkî, Stenbol, 2006, r. 89.

Şev ji aliyê tariyê ve wek lehiyeke reş hatiye teswîr kirin. Herikandina lehiya şevê ji çiyayên jiyaneke derewîn, ev îmaj dewlemend kiriye.

“ax! Kitaneke reş-tarî ye şev
li ser lûtkeya Nemrûdê”[154]

Di risteyên jorê de şev, bi kitaneke reş hatiye şibandin, Hunera teşbîhê îmajeke pastoral welidandiye.

“keriyek mozqirtk e dûrî
zilqitk zilqitk bi dil vedide”[155]

Di van risteyan de dûrî, bi keriyek mozqirtk ve hatiye şibandin. Hunera teşbîhê, ji aliyê kul û keserên dûriyê ve îmajeke şênber saz kiriye.

“çavên te du agirdankên dilbirêj[156]

Çav bi du agirdankan hatiye şibandin, aliyê şibandinê jî biraştin e. Çawa ku agirdank goşt dibirêje çavên yarê jî dilê evîndar dibirêje. Îmaja evînê ku hatiye sazkirin bi saya hunera teşbîhê welidiye.

“dilê xwe dikim destar
bîranînan dihêrim”[157]

Dil, bi destar hatiye şibandin, aliyê şibandinê jî hêrandin e. Dema dil, bîranînan bihêrê hêza hunera mecazê jî arîkariyê ji teşbîhê re dike û îmajeke nûwaze ji kaniya hunerên ciwankariyê dize.

---

[154] Berken Bereh, *Dilê Min Palgeh e Ji Işqê re*, Lîs, Dîyarbakir, 2011, r. 45.

[155] Arjen Arî, *Eroûtîka,* r. 81.

[156] Arjen Arî, *Eroûtîka*, Lîs, Stenbol, 2006, r. 61.

[157] Gulîzer, *Bûka Baranê,* Avesta, Stenbol, 2009, r. 13.

"îro dîsa çavên min du çemên xemgîn
dilê min ji kerban qereçî"[158]

Çav bi çeman ve hatiye şibandin, lê çem jî xemgîn in. Di risteya dawî de dil jî bi qereçiyan ve hatiye şibandin. Ji aliyê hêsiran ve çav û çem gelek caran bi hev ve hatine şibandin, lê ji aliyê arezûyan ve şibandina dil bi qereçiyan, îmajeke resen ava kiriye.

"hespeke rewan e şev
hespeke rewanê ku
siwarên wê tim bûk in
di dawetan de"[159]

Di van risteyên jorê de şev bi hespeke rewan hatiye şibandin. Ji aliyê zû hatin û zû çûyînê ve şibandina şevê bi hespeke rewan îmaj saz kiriye. Siwarên vê hespa rewan bûk in, ev yek jî îmajê dikemilîne.

## 2 . 2. Îstîare

Te'rîfkirina tiştekî ji xeynî navê wî bi navê tiştekî din, îstiare ye. Ji vî aliyî ve îstîare hem hunera mecazê hem hunera teşbîhê ye. Li gor van her du taybetmendiyên îstîareyê divê di îstîareyê de sê wesif hebin:

a) Bêjeyek, ji bilî maneya wê ya rast, ji têgehekê re bibe nav.
b) Bertekek manêyê hebe ango nemumkuniya bêjeyê di maneya xwe ya eslî de bê bikaranîn.
c) Hebûna mebesta şibandinê

Di îstîareyê de hebûna mebesta şibandinê nîşan dide ku ew, rewşeke taybet a hunera şibandinê ye. Li gor vê îstîare, ji du unsurên eslî yê teşbîhê bi bikaranîna yekê tenê (muşebbeh an jî muşebbehûn bîh) çê dibe. Cureyên îstîareyê ev in:

a) Îstîareya Vekirî (Îstîare-i Mûsarraha):

[158] Fatma Savcî, *Şewq û Payîz*, Avesta, Stenbol, 2011, r. 15.
[159] Gulîzer, *Şevname,* Avesta, Stenbol, 2011, r. 17.

Ji unsûrên teşbîhê tenê bi unsûra ên tê şibandin (muşebbehun bîh) derdikeve meydanê. Di vê cure îstîareyê de unsûra ê dişibe nayê bikaranîn. Pirê mecazên bi teşxîs ên edebiyata klasîk di rewşa îstîareya vekirî de ne.

b) Îstîareya Girtî (îstîare-i Mekniye):

Îstîareya bi unsûrên teşbîhê tenê bi unsûra yên ku dişibe (muşebbeh) tê sazkirin. Di van cure îstîareyan de ên ku tê şibandin (muşebbehun bih) nayê bikaranîn. Bi awayekî din tên veşartin.

c) Îstîareya Temsîlî :

Di nava gelek ûnsûrên teşbîhê bi rêzkirina komek şibandinan pêk tê. Ji bilî van îstiareyên bingehîn çend cure îstiareyên din jî hene. Ji îstîareya ji yek bêjeya pêk tê re îstîare-î mufred tê gotin. Ji Îstîareya bertekeke maneyê tunebere îstîare-î mûtlaka, bertekeke maneyê hebe îstîare-î mucerrede tê gotin.[160]

Mînak:
"îşev nîvçe ye heyv
ez nîvçe me
gerdûn û ew kerr û lal"[161]

Di van risteyan de ji aliyê kerr û lalbûnê ve unsura bi hêz însan e, lê nehatiye gotin. Ji ber vê sedemê hunera îstîareya girtî bingeha vê îmajê daniye. Hunera teşxîsê arîkariya îstîareyê kiriye û îmajeke balkêş tevlî refên helbestê bûye.

"tiliyên şeveke qetranî dialastin porê heyatê"[162]

Ji aliyê alastinê ve ajal bi hêz in, lê ajal nehatiye gotin. Îstîareya girtî konteksa îmajê saz kiriye. Dîsa tiliyên însanan hene, lê tiliyên şevê tuneye. Dema gotina tiliyên şevê îstîareyeke girtî çê dibe. Porê însanan heye, lê porê heyatê tuneye. Di gotina porê heyatê de îstîareya girtî heye. Bi arîkariya gelek îatîareyan îmajeke komplek ava bûye.

---

160 Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, r. 412/415.

161 Bereh, *Pandomîm,* r. 21.

162 h. b., r. 99.

û ji nû ve şax veda
hêviya bi rengê minminîkan[163]

Ji aliyê şaxvedanê ve hêvî qels in û dar jî bi hêz in. Ji ber ku dar nehatiye gotin îstîareya girtî di vê îmajê de bingeha îmajê daniye.

“peyvan jî koç kirin ji ser dil”[164]

Êl û eşîr ji cihên xwe koçber dibin, lê koçkirina peyvan ji ser dil gotineke helbestkî ye û ev gotin bi saya îstîareya girtî derketiye holê. Ji ber ku ji aliyê koçkirinê unsura bi hêz êl û eşîr an jî însan nehatiye gotin.

“bi ruhekî pînekirî digerim ez jî”[165]

Cil û bergên ku diqetin tên pînekirin, lê ruh nayê pînekirin. Ji aliyê pînekirinê ve unsûrên bi hêz nehatiye gotin ji ber vê yekê îstîareya girtî di van risteyan de derî li îmajeke resen vekiriye

“bifire hêla binxetê
xwe bigihîne lêv şerbetê[166]

Di van risteyên jorê de bi gotina "lêv şerbete" helbestvan yara xwe qest dike, lê yar nehatiye gotin. Îstîareya vekirî çêkerê vê îmajê ye.

“va gavê kulîlka vedikin xewnên me
li ber kenê bayê çiya”[167]

[163] Bereh, *Dilê Min Palgeh e Ji Işqê re*, r. 59.

[164] h. b., r. 114.

[165] Gulîzer, *Bûka Baranê*, r. 21.

[166] Arî, *Ev Çiya Rûspî Ne*, r. 38.

[167] Savcî, *Gulên Qasid*, Avesta, Stenbol, 2006, r. 36.

Dar kulîlka vedikin, lê xewn kulîlka venakin. Ji aliyê kulîlkvekirinê ve unsura bi hêz dar nehatiye gotin û unsura qels xewn hatiye gotin. Ji ber vê sedemê di van risteyan de îstîareya girtî ev îmaj saz kiriye.

### 2. 3. Mecaz / Xwaze

Bêjeyek, ji bo bidestxistina maneyeke zarîf, ji derveyî maneya xwe ya rast, maneyeke din hilgire, hunera mecazê derdikeve holê. Hem di wêjeya klasîk hem jî di wêjeya modern de helbest, bi hunera mecazê dewlemend dibe. Mecaz, Ji bilî helbestê di pexşanê de jî gelek karîger e. Mecaz, asoya gotinên edebî berfireh dike û derfetên maneyên nû dide helbestvan.

Mecaz, gotinan dixemilîne û bêjeyan ji barê wan ê rojane xelas dike. Barekî hunerî li pişta wan dike ku xwendevan, an jî guhdarvan li hember vî tiştê nû, şaş û metel dimîne. Maneya nû gelek bandoreke mezin li ser wan çê dike. Di nav hunerên ciwankariyê de hunera herî zêde hatiye bikaranîn mecaz e. Mecaz, kurahiyeke felsefî dixe hest û ramanan. Her gotina bimecaz, îmajekê diafirîe. Helbestvan, çiqasî maneyeke dûr li bêjeyê bar bike ew qasî îmajeke xwemal derdikeve holê. Gotinên bi îmaj, şêwaza helbestvanan ji hev vediqetîne. Di helbesta kurdî de ev huner gelek karîger e.

Minak:

"Em serboriya hişê xwe
Li moxila dilê xwe dixin"[168]

"Moxila dil" gotineke bi hunera mecazê pêk hatiye. Di van risteyan de bêjeya moxila ji maneya xwe ya ewil bi temamî dûr ketiye û maneyeke din hilgirtiye. Moxil û dil du bêjeyên dûr mane ne. Bi hatina wan ya cem hev maneyeke dersiruştî derketiye holê. Ev dîmena ku çêbûye di hişê mirovan de îmajekê çê dike.

"êş nayê veşartin zayîna wê zehmet e"[169]

---

168 Bereh, *Pandomîm,* r. 68.

169 Gulîzer, h. b., r. 74.

“lê heta mirov li ber dergûşa êşê rûnenê
mirov kêm e”[170]

Di van risteyên jorê de "êş" û "zayîn" di peywendekê de nêzîkî hev bûne. Bêjeya zayînê ji maneya xwe ya ferhengê dûr ketiye û maneyeke din hilgirtiye ser xwe. Bi vî awayî îmaja "zayîna êşê" çê bûye. Dîsa di gotina "dergûşa êşê" de jî mecaz heye. Dergûş ji maneya xwe ya ewil dûr ketiye.

“bêndera evînê li kê cîhlivîn ma
vezilandî bi tenê kî maye li ser”[171]

Evîn hesteke bingehîn ya mirovan e. Ji aliyê maneya xwe ya ferhengê tu têkiliya vê bêjeyê bi bêjeya "bêderê" re tuneye, lê helbestvan xwestiye nîşaneyên bênderê û dilxweşî û bereketa bênderê bi evînê re bicebirîne û bi vî awayî îmajeke ji aliyê kûrahiya maneyê ve dewlemend saz bike. Di bêjeya bênderê de hunera mecazê heye û ev îmaj bi saya mecazê pêk hatiye.

“bayekî mê û esmer dihêlî li dû xwe”[172]

"Mêyitî" bêjeyeke zayendê tîne ziman ji bo însan û ajalan tê bi kar anîn, lê dema mirov dibêje "bayekî mê " maneya vê bêjeyê ya ferhengê transferî maneyeke din dibe. Ev maneya nû ya di hişê mirovan de çêdibe dîmeneke di şert û mercên dinyayê de nayê dîtin derdixe holê. Vê dîmena nû bi keda hunera mecazê îmajeke poetîk saz dike.

“her berêvar keziyên xeyaleke nû dihûnim
hewldidim çavên birîneke xwe ya din bigirim””[173]

[170] Gulîzer, *Bûka Baranê*, r. 21.

[171] Arî, *Ev Çiya Rûspî Ne*, r. 35.

[172] Arî, *Eroûtîka*, r. 23.

[173] Savcî, *Şewq û Payîz*, r. 17.

Di risteyên jorê de îfadeya "keziyên xeyaleke nû" gotineke bi îmaj e. Keziyên jinan hene, lê "keziyên xeyalan" bi hunera mecazê pêk hatiye û maneya keziyê ya ferhengê li maneya xeyalan bar kiriye. Vê şêwaza edebî jî îmaj çê kiriye.

“çend sitêr weşiyan
ji ezmanên dilê min”[174]

"Ezman" tena serê xwe bilindahiyê, ewr, berf û baran û tiştên bi vî rengî tîne hişê mirovan, lê dema bi bêjeyeke wek "dil" peywenda wê bê sazkirin maneyeke mecazî digire ser xwe û kûrahî û berfirehiya evînê tîne ziman. "Sitêr ji ezmanên dil biweşin" îmajeke hezkiriyên ji destçûyî di hişê xwendevanan de diwelide.

“li ser şaneşîna ramûsanên birîndar”[175]

Şaneşîn, dikên pêşiya xaniyan e. Remza bihar û havînê û şadî û bextewriyê ne. Di gotina "şaneşîna ramûsanên birîndar" de bêjeya şaneşînê maneyeke mecazî girtiye ser xwe û ji maneya xwe ya ewil dûr ketiye. Bi vî rengî îamjeke surrealîst saz bûye. Di mînakên mecazê de diyar e ku hunera mecazê yek ji çêkerên îmajên helbestkî ye. Di helbesta kurdî ya nû ya bakur de mecaz di nav hunerên ciwankariyê de wek hunera herî zêde îmaj pê çêdibin derdikeve pêşberî me.

### 2. 4. Teşxîs / Kesandin

Teşxîs, kesandina heyînên biruh û bêruh ên derveyî mirovan e. Nîşandana wan a lebatî, ramanî û hestyarî ye. Dema pêkanîna vê hunerê ji hunerên din wek teşbîh, îstiare û mecazan sûd tê wergirtin. Ev heyînên di kesayeta mirovan de tên bixwîn û goştkirin, bên axaftin, hunera întaqê derdikeve holê. Di întaqê de teqez teşxîs an jî kesandin jî heye. Lewra heyinên biruh ê diaxive hew însan e, lê di teşxîsê de her tim ne mecbûr e întaq hebe.[176]

---

174 Savcî, *Gulên Qasid*, r. 61.

175 Savcî, *Xewnên Zîvîn,* Avesta, Stenbol, 2007, r. 61.

176 Dilçin*, Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, r. 419.

Îskender Pala dibêje ku "teşxîs û întaq pirî caran bi hev re tên dîtin. Bi riya mecaza mursel an jî îstiareyê pêk tê. Pirî caran di çîrokan, di fabilan de tê dîtin. Di çîrokên menzûm de sedema lebatê ye.[177] Hunera teşxîs û întaqê di hemû cureyên wêjeyê de gelekî tê bikaranîn. Ji ber ku xeyalxaneya mirov zêde zêde berfireh e mirov qabiliyetên însanî dixwaze bide tiştên ji derveyî însanan û bi vî awayî çarçoveya derfetên ragihandina peyamê fireh bike. Mirov, carna jî tiştên ku rasterast nikare bibêje bi riya tiştên ji derveyî însanan dîsa bi însanan dide ragihandin. Bi vî rengî neştera wêjeyê ya rexneyî jî tujtir dibe.

Mînak:

"du pelê zuha
bê şerm û heya
rûyê avê maç dikin"[178]

Di mînaka jorê de pelên ku ji dara xwe ketine û av hatiye teşxîs kirin. Îmaja "pel rûyê ava maç dikin" têkiliya di nav mirovan de transferî siruştê kiriye û dîmeneke çîrokî an dersiruştî derketiye holê. Hunera teşxîsê çêkerê vê îmajê ye.

"dilerize çîrok
weke pela
ji dara xwe xeyidî"[179]

Di risteyên jore de jî gotina "pela ji dara xwe xeyidî" gotineke bi teşxîs e. Însan dixeyidin, lê pela darê ji darê bixeyide ev kesandina pel û darê ye. Hunera teşxîsê hîmê îmajê daniye.

"bi sinfoniya spîndaran
çem

---

[177] Îskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Leyla ile Mecnun Yayıncılık, 9. Baskı, İstanbul, 2002, r. 466.

[178] Bereh, *Pandomîm,* r. 9.

[179] Bereh, h. b., r. 17.

destmala xwe li ba dike”[180]

Însan destmala xwe di dawetan de li ba dikin. Helbestvan ji vê dîmena îlham girtiye û ji jiyana mirovan ev dîmen transferî siruştê kiriye. Bi vê transfera maneyê têkilî di navbera însanan û siruştê de hatiye danîn. Di îmaja "sinfoniya spîndaran" de sipîndar, di îmaja "destmala çem" de çem hatiye kesandin. Her du îmaj jî bi saya hunera teşxîsê çê bûne.

“darên xweşik in em
çemên porgijlokî
mexel tê bihar li himbêza dengê me”[181]

Di risteyên jorê de dar diaxivin û dibêjin em xweşik in. Ev cure gotin teşxîsên bi întaq in. Çemên porgijlokî, mexelhatina biharê, himbêza deng îmajên ku bi saya hunera teşxîsê hatine saz kirin.

“hîv bi kirasê xwe yê birqok
wek diya heft lawan
rûniştiye li şevbêrka sitêrkan”[182]

Hîva ku kiras li xwe dike û rûniştina wê li şevbêrka sitêrkan îmajên bi teşxîsê çê bûne.

“zivistan jî qefilî bi min re
di pêçekê demê de rojan serê şevan xwar”[183]

Rojên ku serê şevan dixwin gotineke bi teşxîs e îmaj bi teşxîsê hatiye saz kirin. Dîsa di risteyên jorê de gotina "pêçeka demê" bi saya mecazê hêzek daye îmaja ku bi teşxîsê derketibû holê.

---

[180] Bereh, h. b., r. 21.

[181] Bereh, *Pandomîm*, r. 52.

[182] Gulîzer*, Keziyên Jinebî*, Avesta, Stenbol, 2006, r. 11.

[183] Arî, *Eroûtîka*, r. 76.

"bi nefelê re ketin dîlanê
pîvokê lîlîn gîhand cîhanê"[184]
"û çiya kanî bi kanî verşiya"[185]

Dîlana nefel û pîvokan, lîlîna pîvokan û verişandina çiyayan sê îmajên ku bi hunera teşxîsê çê bûne. Her sê gotin jî dîmenên pastoral li ser tûala helbestê çê kirine.

"heyv ket kirasê pîrejinên me û bi hev re
di ber xwe de dinuhurandin"[186]

Di van risteyan de heyv hatiye kesandin. Ketina kirasê pîrejinan ji bo heyvê teşxîs e, nihurandina heyvê tabloya îmajê ji aliyê lîrîzma helbestê ve temam kiriye. Helbestvan bi vê teşxîsê xwestiye bibêje ku êdî tu bedewiya heyvê nemaye.

## 2. 5. Kînaye / Nixmane

Bêjeyeke ji derveyî maneya wê ya rast ku mebesta şibandinê tê de tunebe û di maneya mecazî de hatibe bikaranîn ev kînaye ye. Di vê hunerê de dikare maneya rast ya bêjeyê jî bê qestkirin. Bi gotineke din kînaye, bi riya mecazê vegotina rastiyê ye. Eger encamek ji rastiya gotinê derkeve jî ya esas maneya mecazî ye. Piraniya îdyûman ji ber ku di maneya mecazî de tên bikaranîn gotinên bi kînaye ne. (…) Eger îhtîmala gotin, bê maneyeke din tunebe ev cure kînaye "kînayeya karîbe" ye. Cureya ku maneya gotinê tê veşartin "kînayeya baîde" ye.[187]

"Kînaye, vegotina mebestê bi awayekî veşartî ye. Bêjeyeke di wêjeyê de dikare bê du maneyan, bi maneya mecazî bê bikaranîn ew, kînaye ye. Di kînayê de mecazek û maneyeke rast heye, lê maneya bêjeyê ya mecaz, serdestiyê li ya rast dike. Kînaye, vegotina peyvekê bi awayekî veşartî û bi bandor e. Dîsa jî di navbera van her du maneyan de xaleke hevpar heye. Ji ber ku di îdyûman de jî gotinên bi kînaye pir in di zimanê rojane de jî gelek mînakên kînayeyê derdikevin pêşberî me. Kînaye, ji

[184] Arî, h. b., r. 72.

[185] Arî, *Şêrgele*, r. 11.

[186] Savcî, *Şewq û Payîz*, r. 35.

[187] Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, r. 416.

aliyê mane, pêywendî, çavkanî û bikaranînê ve tê dabeşkirin: (Pesindar, xweşikker, qerfî, kînayeya bi amûr hwd.)”[188]

Mînak:
“di nav destarekî dilkevir de
dihêrînin dilê min”[189]

"Destarê dilkevir" gotineke bi saya kînayeyê hatiye saz kirin. Bi maneya rastî destar jixwe ji kevir e, bi maneya mecazî dilkevirbûnî, bêrehmiyê îfade dike. Ji ber ku hem maneya rastî hem jî maneya mecazî di heman demê de bi hev re tîne hişê mirovan ev gotin îmajeke bi derfetê hunera kînayeyê hatiye çê kirin. Di risteya dawî de hêrandina dil ji aliyê destarê dilkevir îmaj dewlemend kiriye.

“şer dîne şervan dîne
çarmêrkî rûniştî dibin berfê de
ev çiya ruspî ne heyran”[190]

Dîtina şer û şervanan û çarmêrkî rûniştina di bin berfê de teşxîsên ku îmaja di risteya dawî de dermale kirine. "Rûspîbûna çiyayan" gotineke bi kînaye ye. Maneya rastî dîmena çiyayên di bin berfê de ye, aneya mecazî pîrbûna çiyayan e ku her çiya ji demeke kevnare de maye.

## 2. 6. Mubalaxe / Pirole

Bi mebesta bihêzkirina gotinekê, vegotina tiştekî yan jî rewşekê ya gelekî zêdetir an jî kêmtir e. Divê vê vegotina pirole, ne cemidî be. Divê biwesf û zarîfane be. Ev huner ji aliye helbestvanên klasik ve di medhiye, fexriye û hîcviyeyan de gelek hatiye bikaranîn. Helbestvanên qedîm, ji bo hêz û firehiya xeyalên helbestvanekî nişan bidin gelek girîngî didan hunera mubalexeyê. Li gor pîleya tundbûna mubalexeyê hunera mubalexeyê dibe sê beş:

---

188 Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 288/289.

189 Gulîzer, *Keziyên Jinebî*, r. 23.

190 Arî, *Ev Çiya Rûspî Ne*, r. 37.

1) Teblîx: Mubalexeya li gor aqil û kevneşopiyê.
2) Îxrak: Mubalexeya li gor aqil, lê ne li gor kevneşopiyê.
3) Gulûv: Mubalexeya ne li gor aqil û kevneşopiyê [191]

"Helbestvan, ji bo ku di hiş de şopeke bihêz bihêle li gor pieya kelecana xwe mubalexeyê dike."[192] Îmaj, bi deformasyona şemayên di hişê mirov de û sazkirina wêneyên resen de tê avakirin. Hunera mubalexeyê, jî ji aliyê rastiya şemayên hişê mirov serobino dikin û bi vegotina tund, îmajên xerîb, ecêb, nedîtî û pir balkêş diafirînin. Di zargotina gelerî ya kurdî de ev huner gelekî karîger e. Di helbesta kurdî ya nû ya bakur de jî helbestvanan, ji derfetên vê hunera ciwankariyê îstîfade kirine.

Mînak**:**
"mar û gurên ku di goştê min de direqisîn"[193]

Mirov çi qasî bêhal be jî û heta mirov mirî be jî mar û gur li ser laşê mirovan nareqisin. Di van risteyan de mubalexeyeke mezin heye. Ev mubalexe îmajeke xofê di hişê mirovan de çê dike.

"asîman beravêt ji kerban
masiyan goştê xwe xwar"[194]

Beravêtina asîman, masiyên goştê xwe duxwin gotinên bi mubalexe ne. Her du gotin jî îmajên rsen in û di çêkirina wan de karîgeriya hunera mubalexeyê gelek e.

"sitêrkek bixuruce nalîna wê dibihîzim
orîniya dara ku tê birîn li daristanekê"[195]

---

[191] Dilçin*, Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, r. 447/448.

[192] Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 351.

[193] Bereh, *Pandomîm*, r. 51.

[194] Bereh, h.b.r., r. 60.

[195] Bereh, *Dilê Min Palgeh e Ji Işqê re*, r. 232.

Bihîztina nalîna sitêrkeke bixuruce û orîniya dara ku tê birîn di gotinên bi mubalexeyê çê bûne. Tu kes nikare nalîna sitêrkên dixuruce bibihîze û dema birînê orînî ji dara nayê. Her du gotin jî derveyî rastiya jiyanê ne.

"ez qam dikim xwîna qeşagirtî
bigirî hubra pênûsa min bigirî"[196]

Xwîn li ser rûyê erdê qeşa bigire û ev xwîna qeşagirtî qamek hebe ev dîmen derveyî rastiya jiyanê ye. Ji ber vê yekê hunera mubalexeyê hostetî ji vê îmajê re kiriye.

"ne jî hûn li bin baranên ji agir geriyan"[197]

Baran ji avê ye, lê îmaja baranên ji agir gotineke bi mubalexêyê çê bûye. Ev îmaj, dîmeneke dersiruştî di hişê mirovan de çê dike.

"niha
çemekî ji agir diherike
li vî bajarî"[198]

Çêmê ji agir û di nav bajarekî de biherike dîmeneke bi saya hunera mubalexeyê saz bûye. "Çemekî ji agir" di warê orîjînalîteya îmajê de nûwaze ye. Çavkaniya reseniya vê îmajê hunera mubalexeyê ye.

"bila îcar jî xewna min
dengê çemê giriyê te were"[199]

Mirov çi qasî bigirîn jî hêsirên mirovan nikare bibe çemek û biherike. Helbestvan bi çêkirina dîmena çemê hêsiran nehatiye ser, dengê çemê hêsiran û

---

[196] Bereh, *Pandomîm*, r. 84.

[197] Gulîzer, *Bûka Baranê,* r. 24.

[198] Gulîzer, h. b., r. 79.

[199] Savcî, *Xewnên Zîvîn*, r. 82.

xewn di peywendekê de bênder kiriye. Bi vê gotinê pîleya hunera mubalexeyê bilind kiriye.

## 2. 7. Tenasub / Lihevî

Di riste yan beytekê de li ser mijarekê herî kêm du bêjeyên ku di navbera wan de têkiliyên curbicur hene, bi awayekî bê pergal bên bicihkirin hunera tenasubê pêk tê, lê divê di navbera van bêjeyan de têkiliya dijberiyê tunebe. Helbestvanên klasîk, di helbestên xwe de di peywenda hunera tenasubê de têgehên hin zanînan, lehengên mîtolojî, dîrok û mesnewiyan, navên gul, giha û ajalan zêde zêde bi kar anîne. Ji hunera tenasubê re murat-i nazîr, cem'iyyet, telfîk, tevfîk, îtîlaf û muvahat jî tê gotin.[200]

"Tenasub, hunereke girêdayî maneyê ye û pala xwe dide bangewaziyên kelecanê. Helbestvanên klasîk, xwestine ku bêjeyên têkiliya wan bi hev re hene di beytekê de bînin ba hev. Bi vî awayî tenasub bûye hunereke belavbûyî. Carna di berhemên pexşanê de jî serî li tenasubê tê dayîn. Sedemek vê jî di dema vegotina mijarê de zarûreta bikaranîna bêjeyên têkildar e. Heta helbestên dirêj ku pişta xwe didin hunera tenasubê jî hatine nivîsîn."[201]

Helbest avahiyeke ahengdar e. Ahenga helbestê, hem bi muzîkalîteya fonetîk hem jî bi pêywendiya maneya bêjeyan tê afirandin. Bêjeyên ku bangewaziyên wan nêzîkî hev, îmaja ku helbestvan di hişê miov de dixwaze çê bike di warê temsîlê de têkûz dike. Bêjeyên pêywendîdar, hîmê îmajê datînin û bi her bêjeyeke têkildar, avahiya îmajê bi awayekî estetîk bilind dibe. Wek mînak helbestvan bixwaze îmajeke şevê biafirîne û di helbesta xwe de "şev, tarî, heyv, sitêrk, heyveronê" bikar bîne ev kome bêje, îmaja şevê di xeyalxaneya xwendevan de bixwîn û goşt dike. Yan jî em bibêjin helbestvan, îmajeke zeryayê saz bike bêjeyên "wek behr, pêl, masî, keştî, şîn" arîkarî didin helbestvan ku îmaja di hişê wî de mîna wêneyekê derkeve holê. Hunera tenasubê îmajên rengîn, biaheng û têr estetîk derdixe pêşberî me. Di helbesta kurdî ya nû de ev hunera gelekî karîger e. Helbestvanên modern, bi teşiya tenasubê gelek xeyalên resen hunandine.

---

200 Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, r. 431.

201 Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 461.

Mînak**:**

"xunava hestên min
di payîzeke koçber de
bi ser guliyên darên zer î zêrîn de dibarîne"[202]

Bêjeyên xunav, barîn, payîz, dar, gulî, zer, zêrîn di peywendekê de hatine bi kar anîn. Ji ber vê yekê di van risteyan de îmaja derketiye holê bi tenasubê çê bûye.

"ez dilketiya bilindbûna ezmanê dilê wî bûm
digot baskên te dilê te ye"[203]

Di van risteyan de jî di navbera bêjeyên bask, bilindbûn, ezman, dil û dilketinê de liheviyek heye. Bi tenasuba van bêjeyan û bênderkirina wan îmaj welidiye.

"li keviya helbesteke xunavî
agirekî devliken dêmên ezman radimûse
li dora wî hespên ji mijê" [204]

Di bin banê ezman de bêjeyên kevî, xunav û mij çarçoveya îmajê temem kiriye. Îmaja agirê devliken ev îmaj dermale kiriye. Dijberiya xunav û agir jî îmaj ji aliyê dîmenê ve pir tebaqeyî kiriye.

"çavên hêviyên me yên kilkirî
ji nezera xirab nastirin"[205]

Di van risteyan de çav, kil, nezer bêjeyên ku di navbera wan de tenasub heye. Çavên ku behsa wan tên kirin çavên hêviyan e. Ev yek jî îmajê ji aliyê mecaz, teşxîs û îstîareyê tekûz dike.

---

[202] Savcî, Xewnên Zîvîn, Avesta, Stenbol, 2007, r. 21.

[203] Gulîzer, Bûka Baranê, Avesta, Stenbol, 2009, r. 31.

[204] Savcî, *Bîra Birînê,* r. 43.

[205] Savcî, h. b., r. 68.

“şêrgele hene kefen ezmanê sayî
şêrgele hene bi qasî stêrkan rijiyayî
şêrgele hene şevçirax û heyve-ron
li van çiyan bê kêl û gorn windayî”[206]

Di risteyên jorê de bêjeyên şêrgele, kefen, ezman, sayî, stêrk, şevçirax, çiya, kêl û gorn lihevhatî ne. Bi hatina cem hev ya van bêjeyan peywenda îmajê saz bûye, ango ev bêje bûne çêkerên îmaja mêrxasiyê.

### 2. 8. Tezad / Dijberî

Di navbera du raman hest û xeyalan de wesfên dijberî hev, li ba hev bên gotin ev, tezad e. Mirov dijberiyên tiştekî bibîne û derxe, ev jî dikeve hunera tezadê. Hunera tezadê di edebiyata klasîk de bi navên tibak, nutabakat, tatbîk, tekafû jî tê zanîn.[207] Tezad, ji bangewaziyê derdikeve holê. Bêjeyên dijber ku di hişê xwendevan de du rewşên dijber ava dike, di vê rewşa han de hunera tezadê diwelide. “Di hevokekê an jî beytekê de dijberiya du bêjeyan tenê (havîn-zivistan, reş û sipî) ji bo tezadê ne bes e. Ji bo tezad çê bibe divê taybetmendiyên dijberî hev jî bên destnîşan kirin. Tezad, di helbestê de di diyalogan de di rexne û teswîran de ramanê hîn qewîtir, vegotinê hîn bi xemiltir û kelecanê hîn zidîtir dike.”[208]

Tezad, di helbestê de rola aksiyonê hildigire ser xwe. Riya îmajê ku rast diçe, fitloneka didê, herikîna hest û ramanan disekinîne, carna hîn bicoş û kelecan çemê xeyalan diherikîne. Ev hunera gotinê, hêza xwe ji çêkirin û xerakirina du îmajên senkronîk digire. Xeyalxaneya xwendevan, deriye xwe ji îmajekê re vedike û wê himbêz dike, lê di heman demê de xwendevan diwerqile ku ev îmaja himbêz kiriye, di himbêza wî de hilweşiyaye û îmajeke nû di himbêza wî dilabite. Ev, zayîna hunera tezadê ye.

Helbestvanên kurd ku jiyana wan a kesayetî, civakî, dînî, siyasî heta çandî û hunerî di navbera rê û şiverêyên cihê cihê derbas dibe, di helbestên xwe de mîna ku dixwazin heyfa xwe ji wan şert û mercên tevlîhev bigirin gelek caran dest avêtine hunera tezadê. Jixwe dema mirov li gor mijaran li helbesta kurdî dinêre diyar e ku

---

[206] Arî, *Şêrgele*, r. 30.

[207] Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, r. 449.

[208] Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 468.

gelek mijarên dijber di nivîna heman çemî de bi hev re diherikin. Mînak: azadî û bindestî, mirin û jiyan, evîn û dûrketin, şîn û şahî di gelek risteyan de bi hev re tên bênder kirin. Îmajên bi riyê tezadê hatine afirandin, wêneyên mêjiyê helbestvanên kurd mîna eynikekê, zelal nişan didin.

Mînak:
"herkes tenê ye dema digirî
dema dibişire hogirê dilê xwe"[209]

Di risteyên jorê de di navbera bêjeyên girî û bişirînê de ji aliyê maneyê ve dijberî heye. Ev dijberî jî bi arîkariya îmaja "hogirê dil" îmajeke dewlemend derxistiye holê.

"roj radizên şev şiyar in
şer distirê di geliyan de"[210]

Bêjeyên razandin û şiyarbûnê di van risteyan de hunera tezadê derxistine holê û bingeha îmajê ava kirine. Dîsa di navbera roj û şevê de dijberiyeke din heye. Ji aliyê razandin û şiyarbûnê û sitrandina şer de hunera teşxîs û îstîareyê arîkarî ji vê îmajê re kiriye.

"xwezî ez miribûma û hew bû
newal bêguh diman û şer bû
çiya bê ser diman û şer bû
şev serjê bû bi ser rojê de û şer bû"[211]

Di risteyên jorê de atmosfera helbestê bi du bêjeyên dijberî hev şev û rojê hatiye dorpêç kirin. Hunera tezadê di çêkirina vê îmaja şer de xwedî roleke giring e.

---

209 Bereh, *Pandomîm*, r. 62.

210 Arî, *Ev Çiya Rûspî Ne*, r. 34.

211 Arî, *Şêrgele*, r. 29.

"keçên rojhilatî radibin dîlanê
li girava kederên min"[212]

Li aliyekî dîlan û li aliyê din keder hebe ev du rewşên dijberî hev ne ji aliyê bêjeyan, lê ji aliyê rewşê ve dijberiyekê dihewîne, ev îmaj jî bi saya hunera tezadê çê bûye.

**2. 9. Husna Talîlê / Xweşbahane**

Dema mirov sedema peydabûna bûyerekê, bi sedemeke xeyalî û xweşik girê bide husn-a talîl derdikeve holê. (…) Di hunera husna talîlê jî de wek hunera tecahul-î arîfê sedema rastî nayê hesabkirin, lê husn-î talîl, bi girêdana sedema xeyalî ji tecahul-î arîfê vediqete.[213] Îskender Pala dibêje ku: "Di husna talîlê de sedema rastî ya bûyerê tê înkarkirin û di şûna wê vegotineke kelecanî tê bikaranîn. Eger ev vegotin, bişik hatibe gotin ji vê cure husna talîlê re 'şibh-î husn-î talîl' tê gotin. Ji bo pêywendî bi risteya ewil ya helbestê re bê danîn û têkiliyeke manedayîna zarîf pêk bê tê bikaranîn. Divê di navbera sedema rast û sedema xeyalî de pêywendiyeke analojîk hebe. Husna talîl di helbesta klasîk de gelekî hatiye bikaranîn û pir jî îtîbar dîtiye. Dema helbestvan, di bin bandora hestên xwe de li dinyaya derveyîn temaşe dike serî li vê riya dide û helbesta xwe bi dinyayeke xeyalan dewlemend dike." [214] Husna talîl di helbesta modern de jî zehf hatiye bikaranîn.

Mînak:
"ma wan ewran
hestên te dizîne ku
ji êvar de digirîn"[215]

Helbestvan, sedema barîna baranê dizane, lê sedema eslî vedişêre û sedemeke xweş derdixe pêşberî me. Weke ku ewran hestê wê dizîbe nîşan dide. Ev îmaj ji

---

[212] Savcî, *Gulên Qasid*, r. 56.

[213] Dilçin*, Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, r. 443.

[214] Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 230.

[215] Bereh, *Pandomîm*, r. 9.

gelek aliyan ve hebûna xwe deyndarê hunerên ciwankariyê ye. Ji bilî nîşandayina sedemeke fîktîf, "diziya ewran ya hestan" gotineke bi teşxîs û îstîare ye. Dîsa îmaja "giriyê ewran" bi saya teşxîs û îstîareyê pêk hatiye.

“çiyayê porsipî
hêdî hêdî digirî
êêê kalbûn zor e”[216]

Di van risteyên jorê de îmajeke pastoral bi hunerên civankariyê teşeyeke poetîk girtiye. Sedema giriyê çiyayên porsipî helandina berfê ye. Dema berfa çiyayan dihele ji çiyayan bi aliyê berjêr ve av diherike. Helbestvan ev ava ku diherike wek hêsirê çavên mirovan xeyal kiriye û ji sedema wê re xweşbahaneyek dîtiye, Weke ku çiyayên porsipî ji ber derdê kalbûnê bigirin nîşan daye.

bi bayê porê te firfirok diketin cizbê” [217]

Firfirok ji ber tiştekî din li ezman difirin. Helbestvan sedema rast negotiye û sedema cizbeya firfirokan porê yarê nîşan daye. Ev husna talîl, ji îmajê re rê vekiriye.

“ba, tûyê
paqij dike ji tozê
da şev xweş lê mexel bê”[218]

Helbestvan, sedema bayê ku tuyê ji tozê paqijdike negotiye û xewşbahaneya "şev lê mexel bê" derxistiye pêşberî me. Hayê ba ji şevê û mexelhatina şevê tuneye, lê bi saya hunera husna talîlê îmajeke pastoral tevlî refê helbestê buye.

“çavên guliyên min
ji bendemayînan sor bûne
ma nebû tu werî[219]

[216] Bereh, h. b., r. 10.

[217] Bereh, h. b., r. 79.

[218] Bereh, *Dilê Min Palgeh e Ji Işqê re*, r. 430.

[219] Gulîzer, *Bûka Baranê*, r. 20.

Di van risteyan de sedema eslî ya sorbûna serê guliyan hinenekirina por e. Porê berê ku hatiye hinekirin dirêj bûye û ew cihên sor hatine serê guliyan, lê helbestvan, têkiliya sedema vê sorbûnê bi bendemayinê re daniye û bi saya hunara husna talîlê ji aliyê çîroksaziyê ve îmajeke nûwaze ava kiriye.

"çirçirk li mahnê bû sitira ji şevê re
rûçik vekir heyvê ewr da alî
keniya demekê di ava kaniyê de"[220]

Di van risteyan de di nabera ewrên ku ji ber heyvê xwe didin alî û çirçirka distirê de tu têkilî tuneye, lê helbestvan sedema ewrên ji ber heyvê vedikişên bi husna talîlekê diyar kiriye. Weke ku ji ber sitirandina çirçirkê, heyvê ewr dabin alî nîşan daye.

"roj bi ramûsanekê re hiltê
di pacê re dibişire her tîrêj"[221]

Di navbera hilatina rojê û ramûsanê de tu têkilî tuneye, lê helbestvan sedema hilatina rojê bi ramûsanê ve girê daye. Ji ber vê sedema xweşbahane îmajeke lîrîk derketiye pêşberî me.

## 2. 10. Tecahula Arîf / Nezaniya bi Zanîn

Eger rastiyek bê zanîn û herwekî ku nayê zanîn bê gotin tecahula arîf çê dibe. Ango tecahul-î arîf ne qet nezanî ye ne jî veşartina zanînê ye. Di pêkhatina vê hunere de ji hunera mubalexe û îstîfhamê sûd tê wergirtin. Hunera tecahula arîf, wek tecahula arîfane, tecahul arifîn jî tê zanîn.[222] "Di vê hunerê de mebest, afirîneriya maneyeke zarîf e û divê teqez heyret, pesn, biçûkdîtin, berzkirin, tê de hebe. Ev heneka ku cewhera hunerê pêk tîne dibe ku ji bo çar armanca pêk hatibe. Tenşît (Şadkirin), tevbîh (hişyarkirin), tehayyur (heyret)tedellûh, (gotina jixwe ve çûnê)"[223]

---

[220] Arî, *Ev Çiya Rûspî Ne*, r. 56.

[221] Arî, *Eroûtîka*, r. 61.

[222] Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, r. 441.

[223] Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 457.

Tecahula arîf di helbesta klasîk de hunereke birewac bû, lê di helbesta modern de zêde nayê bikaranîn. Li gor hunerên gotinê yên din di çêkirina îmajan de qels e, lê dema tecahul-î arîf bi arîkariya mubalexeyê pêk bê dikare bandoreke mezin li ser xwendevan bike. Hunera tecahul-î arîf, di estetîka helbestê de wek surprîzeke vegotinê dikare bê hesibandin. Helbestvan, bi hemû zanebûna xwe dema xwe nezan nişan dide yan jî zanebûna xwe vedişêre ruhê helbestê dibişire, xwendevan kelecanî dibe. Helbestvan, ji rola afirîneriyê derdikeve, xwe jirêzê dihesibîne û nêzîktirî xwendevan dibe. Di navbera helbest û helbestvan de, di navbera helbestvan û xwendevan de germahiyek, dilsoziyek ava dibe.

Mînak**:**

"spîndara bêgore
nexweş nebe gelo
di bin berfê de"[224]

Di van risteyan de helbestvan bi empatiyeke berfireh li giyanê siruştê guhdarî dike û dibêje: "spîndara bêgore di bin berfê de nexweş nebe gelo?" Bi rastî helbestvan dizane spîndar gorê naxin pê û di bin berfê de nexweş nabin, lê weke ku vê rewşê nizanibe xwe nîşan daye û îmajeke pastoral bi hunara tecahula arîf velidiye.

"tu nebê
ruhê agir di nav xweliyê de veşartî ye
agir hişyar bû carekê
çem şewitand"[225]

Di risteyên jorê de helbestvan dizane ku ruhê agir tuneye û di nav xweliyê de neveşartiye. Agir hişyar nabe û çem naşewitîne, lê tevlî zanebûna van tiştan jî helbestvan bi zaneyî xwe li nezanînê daniye, ango tecahula arîf kiriye. Vê hunera ciwankariyê jî îmajeke nûwaze derxistiye holê.

Di van mînakên jore de jî diyar e ku di navbera hunerên ciwankariyê û çêkirina îmajan de têkiliyeke giring heye. Hunarên ciwankariyê, ne tenê lîstokên

[224] Bereh, *Pandomîm*, r. 10.

[225] Gulîzer, h.b., r. 79.

belaxatê ne û her yek di çêkirina îmajên helbestê de xwedî karîgeriyeke xwemal in. Bêyî hunerên ciwankariyê îmajên poetîk çê nabin.

Hunerên ciwankariyê ne tenê cîlaya gotinê xweşik in. Ew hîmê îmajên poetîk in, îmajên poetîk ji bo çêkirina gotinên edebî û xwemal derfeteke mezin didin helbestvanan. Helbestvanên ku me mijara teza xwe bi wan û berhemên wan sînor kiriye jî ji van hunerên ciwankariyê gelek sûd wergirtine.

## BEŞA SÊYEM

## ÎMAJÊN HELBESTA KURDÎ (KURMANCÎ) YA NÛ YA BAKUR

Helbesta kurdî ya nû ya bakur ji îmajên poetîk gelek sûd wergirtiye. Her helbestvanî, di avakirina helbestê de di anîna ziman ya hest û ramanên xwe de ji îmajan arîkarî girtiye. Hunerên ciwankariyê yên ku di helbesta klasik de hatine bi kar anîn bingeha îmajên helbesta kurdî ya nû pêk aniye û helbestvanên modern bi van hunerên ciwankariyê şêwazên vegotinê yên xwemal derxistine holê.

Modernîzasyona helbestê tenê bi avêtina kafîye û weznê ne pêkan e. Divê kakilê helbestê biguhere. Modernîzasyona helbesta kurdî bi mijarên nû û bikaranîna amûrên jiyana modern dest pê kiriye. Helbesta kurdî ya nû ya bakur, ji serê sedsala dawî û heta aniha ji gelek aliyan ve guheriye. Di vê peywendê de dema ji aliyê mijara vê tezê û çarçoveya ku me diyarkiribû em nêzîkî meseleyê bibin em dibinin ku her çar helbestvanên me hemdem in, kêm zêde di heman erdnîgariyê de hatine dine û di heman şert û mercên siyasî û civakî de derbas bûne. Vê hevpişkiya jiyana dîroki, atmosfera îmajên helbestên wan nêzîkî hev kiriye.

Arjen Arî, Berken Bereh, Fatma Savcî û Gulîzerê hem helbestên mijarên wan takekesî û hem jî siyasî û civakî nivîsîne. Trajediyên kurdan ên dîrokî, serhildanên wan, zordestiyên ku li wan hatine kirin, êşên kişandine û hest û ramanên însanî havênê îmajên wan e. Mijara wan her çi dibe bila bibe ev muşterekên rabirdûya wan bi şêwazên îmajên xwemal di helbestên wan de ji xwe re cih vekiriye. Evîn, erotizm, siruşt, xerîbî, tenêtî, mirin, zordestî û azadî di helbesta kurdî ya nû de mijarên îmajan ên sereke ne.

Helbestvanên ku helbestên wan ji aliyê îmajan ve mijara vê xebatêne di çêkirina îmajan de piranî ji hunerên teşbîh, mecaz, mecaza mursel, îstîare, teşxîs, mubalexe, husna talîl, tecahula arîf, tezat û tenasubê sûd wergirtine. Helbestvanên navborî di helbestên xwe de îmaj bi hişmendî bi kar anîne û tu carî îmaj nekirine armanca helbestên xwe, tenê ji bo helbestên xwe îmaj wek derfeteke vegotina estetîk dîtine.

Arjen Arî, îmajên xwe bi gotinên folklorik saz kirine. Îmajên wî deng, bîhn, reng û xeyalên wextên kevnare bi mirovan dide hîskirin, dilsozî taybetmendiya îmajên Arî ya sereke ye. Arî, Carina ji gotinên pêşiyan û îdyomînên wan, carina jî ji amûrên jiyana derbasbûyî û bejeyên kevin îmajên nûwaze diwelidîne. Ev cûre gotin, helbesta Arî dike qada vegotina gelerî.

Berken Bereh, di helbesta kurdî ya nû de bi îmajên pastoral û lîrîk derdikeve pêş. Her rewşa siruştê bi her halê mirovan bênder dike û îmajên xwe saz dike. Rewşa dar û daristanan gul û gihayan, çem û çiyayan, çûk û ezmanan bi îmajên rengîn di risteyên helbestên xwe de nişan dide.

Fatma Savcî bi tesîra rabirdûya wê ya siyasî êş û elemên zordestiyê, bîranînên şoreşgerî, jiyana zindanê û psîkolojiya têkçûyînê di çêkirina îmajan de wek mijarên lokomotif bi kar aniye. Jintî û hestên jintiyê di helbesta Savcî de zêde dernakeve pêş. Dîsa jî nêzîkbûna wê ya li hember bûyer û rewşan li gora Arjen Arî û Berken bereh nermtir e.

Gulîzera ku di nav helbestvanên mijara vê xebatê de herî ciwan û jin e, bi hîssîyata xwe ya nazik îmajên gelek xwemal saz kirine. Îmajên wê, ne wek îmajên Arjen Arî saf in, ne jî wek îmajên Berken Bereh pastoral û lîrîk in û ne jî mîna îmajên Fatna Savcî tije xwîn û hêsir in. Ji yên her sê helbestvanan jî bi çîroksaziya xwe cuda ne. Îmajên Gulîzerê li gora îmajên helbestvanên navborî bi hejmara bêjeyên zêde pêk tê. Gulîzerê dixwaze îmajan ji sînorên riste yan jî malikan xelas bike û li seranserê helbestê belav bike.

Bi kurtasî Helbesta kurdî ya nû ya bakur ji aliyê îmajan ve gelek dewlemend e. Helbestvanan ji îmaj û derfetên îmajê zehf sûd wergirtine. Me li jêrî li gor hin mijarên sereke îmajên helbesta kurdî ya nû di helbestên helbestvanên ku me çarçoveya teza xwe bi berhemên wan sînor kiriye dabeş kir û em li ser çêkirina îmajên wan sekinin. Îmajên ku em li ser wan sekinin û me ew şîrove kirin ev in: 1. Îmajên takekesî. 2. Îmajên Civakî û Siyasî.

## 1. ÎMAJÊN TAKEKESÎ

Takekes di helbesta cîhanê de û di helbesta kurdî ya nû ya bakur de xwedî roleke giring e. Edebiyat li dora hizrên takekesî û civakî de dizîvire. Hin hunermend di avakirina hunera xwe de civakê esas digirin û hin hunermend jî takekes esas digirin. Carina jî takekes û civak di nav hev de derdikevin pêşberî me.

Takekes di edebiyata modern de çavkaniya hizrên însanî ye. Xem û xeyal, evin û xerîbî, tenêtî û mirin û gelek hizrên din di bin sîwana takekes de dicivin. Kûrahiya hest û ramanên edebî piranî li ser hizrên takekesî pêk tê. Gelek hunermend bi bandora agirê evînê dest bi hunerê dikin. Helbest an jî beşên hunere yên din ji bo wan dibe qada verişandina kul derdan an jî avakirina hêvî û xeyalan.

Psîkolojiya mirovan li ser nêrîna wan ya jiyanê tesîreke mezin dihêle. Binehişê helbestvanan bi xwestek, tirs qehr, kîn, xeyal û gelek tiştên din yên takekesî tije ye. Di helbesta modern de îmajên helbestvanan di warê deşîfrekirina hin hest û ramanan de şîfreyan dide xwendevanan. Ji ber vê yekê di navbera helbesta helbestvan û jiyana helbestvan de têkiliyeke transferi heye û di şîroveya helbestê de agahiyên di derheqê jiyana helbestvan de ji bo şîrovekirina hestên takekesî giring e.

Di helbesta kurdî ya nû de takekes di çêkirina îmajan de kakilê helbestê ye. Her çar helbestvanên ku mijara xebata me ne piraniya îmajên xwe li ser hizrên takekesî ava kirine. Îmajên takekesî ku di vê beşê de em ê li ser wan bisekinin û wan bi mînakên helbestan şîrove bikin ev in: evin, erotizm, siruşt, xerîbî, tenêtî û mirin.

## 1. 1. ÎMAJÊN EVÎNÊ

Têgeha evînê di edebiyata cîhanê de yek ji wan têgehan e ku herî zêde tê bikaranîn. Her hunermend hest û ramanên xwe bi mîrateya berî xwe dermale dike û hewl dide bêhna hunera xwe bide vê mijarê da ku sirên evînê eşkere bike. Hin hunermend, bi dubarekirina metaforên mîrateya berê, xwe xapandine û benîştê bi sedan sala hatiye cûtin di devê xwe de birine û anîne; hinek hunermend jî bi pey xeyalên ter û taze ketine. Her hunermend bi amûrên qada hunera ku pê ve diştexilin evîna xwe vedibêjin. Wênesaz, bi harmoniya rengan evîna xwe tînin ziman. Peykertiraş, bi hemû hostetiya xwe zêdahiyên kevir diavêjin û laşên bêrûh û can diafirînin.

Di helbesta kurdî ya nû de mijara evînê, yek ji mijarên sereke ye û têra xwe pirşaxî ye. Evîna cîsmanî, evîna welat, evîna siruştê, evîna azadiyê hwd. Di helbestên helbestvanên kurd yên modern de bi vêbêyînên curbicûr derdikevin holê. Her helbestvan li gor jiyana xwe, fikr û ramanên xwe, rabirdûya xwe ya hunerî, têgihiştina xwe ya estetîkê û felsefeya xwe ya jiyanê nêzîkî mijarê bûye. Gelek îmajên bedew di mijara evînê de peyda dibin. Wek gelek helbestvanên cîhanê helbestvanên kurd ên hemdem jî têgeha evînê bi arîkariya hin têgehên din zelal kirine: evîn û xerîbî, evîn û şoreş, evîn û mirin û hwd.

Em ê hewl bidin bi arîkariya gelek mînakên ji helbestên helbestvanên ku me mijara teza xwe pê sînordar kiriye vê mijarê rave bikin û ya esas bi hurgilî lêbikolin bê helbestvanên kurd yên modern, bi îmajên çi rengî nêzîkî vê mijara sereke bûne.

### 1.1.1. Îmajên Evînê di Helbestên Arjen Arî de

Arjen Arî, mijara evînê ji gelek aliyan ve şîrove dike. Evîna beşerî, evîna seksuel, evîna azadiyê hin aliyên vê mijarê ne. Arî, di sazkirina îmajên evînê de ji keresteyên kevneşopiya jiyana kurdan û ji bêjeyên arkaîk sûdê werdigire.

#### a) Îmajên Pênaseya Yarê

Ev îmaj çavkaniya xwe ji xweşikbûna yarê digirin û hestên helbestvan ên di derheqê azayên laşê yarê bi me re didin ragihandin. Armanca van îmajan teswîra yarê ye. piranî bi teşbîh, îstîare û mecazan pênaseya yarê tê kirin. Hejmara van îmajan ji hejmara îmajên pênaseya evînê û xemên evîndaran zêdetir in. Di îmajên jêrê de hin mînakên risteyên pênaseya yarê û şîroveyên wan ji aliyê estetîka îmajan de hene.

Arî, yara xwe dişibîne unsûrên siruştê: Rûyê wê wek gulan, hinarkên wê wek meha nîsanê dibîne. Her êvar qesta goştê wê dike. Dema yara xwe dibîne bûkikên çavên wî dibin du hût, carina jî bi temamî yara xwe dişibîne mewîjka binê tûrik, Çavên yara xwe dişibîne du agirdankên dilbirêj, dil ji bo wê wek guldankekê dinirxîne, carna jî dibe qereçiyê pesnê çavên yara xwe.

“kîjan demsalê bipesinim bi navê te
rûyê te gulan be, nîsan in hinarkên te
bihar bi xwe diheside ji wan çavan
û temmûz didexise j’ lêvên te” [226]

Ev çarîn ji rêze teşbîhan pêk tê. Arjen Arî, xweşikbûna yara xwe wek meh û demsalên cîhanê dibîne. Rûyê yarê dişibîne meha gulanê. Hinarkên rûyê wê, dişibîne meha nîsanê. Biharê teşxîs dike û dibêje bihar diheside ji çavên yarê. Lêvên yarê hingî bişewat in meha temmûzê ji wan lêvên yarê yên germ didexisin.

“kinik î hebekî
hebekî hûrik

[226] Arî, *Ev Çiya Rûspî Ne*, r. 13.

mewîjka min î binê tûrik" [227]

Şibandina yarê bi mewîjka binê tûrik ve, ne îmajeke jirêzê ye. Ji aliyê qîmetdayînê ve teşbîheke serkeftî ye. Şivanan, demên berê tûrik diavêtin piyên xwe. Di tûrikê wan de xwarin û vexwarina wan û lazimiyên wan yên rojane hebûn. Mewîj, bastêq, dims, gwiz, benî, nan, mast û penîr xwarinên şivanan yên herî tên zanîn. Carna tiştên xwarinê bi şivana re namîne û pir birçî dibin. Li binê tûrikê xwe dinêrin eger yek du mewîj bi şaşî ketibin qozîkên tûrik, şivan kêfxweş dibin. Ew mewîj ji wan re têra xwe biqîmet e.

"çavên te du agirdankên dilbirêj" [228]

Çavên yarê, evîndaran dîl digire. Wan, bi agirê evînê dişewitîne. Di vê risteyê de helbestvan, çavên yarê şibandiye du agirdankên dilbirêj. Îmajeke teşbîhî ye. Agirdank, ji bo ronahiyê tên bikaranîn, lê di vê risteyê de helbestvan, agirdank ji bo biraştina dil bi kar aniye. Dil, hêlîna hesta ye, hessas e. "Biraştina dil bi agirdankê çavan" îmajeke evîna melankolîk e.

"şa'îr im qereçiyê pesnê çavên te" [229]

Helbestvan, di helbestên xwe yên evînê de piranî pesnê yara xwe didin. Wê bi teşbîhên tewlo tewlo tînin ziman. Di vê risteya jorî de Arjen Arî ji bangewaziyên bêjeya "qereçî"yê sûd wergirtiye û xwe şibandiye qereçiyekê ku her tim karê wî pesnê çavên yarê ye.

"birçiyê te me ez birçiyê te
qesta goştê te dikim her êvar" [230]

---

[227] Arî, *Eroûtîka*, r. 16.

[228] Arî, h. b. r. 61.

[229] Arî, *Şêrgele*, r. 39.

[230] Arî, h. b., r. 23.

Evîndar, hingî ji yara xwe hez dike. Bi firkandin an jî maçîkirina laşê wê yî bedew têr nabe û dixwaze wek dirindeyekî, goştê nêçîra xwe bixwe, goştê yara xwe bixwe. Di van risteyan de bangewaziyên seksuel jî hene. Ji aliyê evîna bidaxwaz îmajeke berbiçav e û şopên erotîzmeke nixumandî jî di naveroka xwe de dihewîne.

**a) Îmajên pênaseya Evînê**

Di van îmajan de helbestvan pey pênaseya evînê dikevin û hewl didin evînê bidin nasîn. Evîn çiye, tesîra wê li ser giyan û laşê mirovan bi çi rengî ye, evîn çawa tê his kirin? Ev pirsên ku me behsa wan kir di îmajên pênaseya evînê de tên bersivandin. Di edebiyatê de evîn ji aliyê gelek kesan ve hatiye salixandin. Her helbestvanekî li gor fêma xwe û hizrên xwe ev têgeha bingehîn daye nasîn. Li jêrê hin mînakên pênaseya evînê hatine şîrove kirin.

"bi êvarê re ta digire şeva min
bayê evînê her min dilerizîne" [231]

Ta girtin, biwêjek e di nav gel de ji bo nexweşiyan tê bikaranîn. "Ta girtina şevê" bi saya hunera teşxîsê îmajek welidandiye. Ji ber ku evîndar dûrî yara xwe ye ji hesreta yara xwe bi şev heta sibehê ranakeve, keserên kûr dikişîne. Wê demê şev, bi hatina êvarê re tayê digire û dikeve heyra evîndar. Piştî vê îmajê Arjen Arî, bi îmaja "bayê evînê" mazmûneke kevnare ji îmaja xwe ya risteya jorê re dike hevrê.

"destên min şuştin ji zeriyê
lê dil ka ez bi çi bişom
ji evîn û vê hêviyê" [232]

Evîndar her daîm ji bo wisletê bihêvî ne, lê dema hêviyên wan dişikin û fêmdikin derfeta gihaştina yara wan nemaye ji bêçaretî destên xwe ji evîna xwe dişon. Ev hal nayê maneya ku evîndar dev ji hezkirina yara xwe berdaye. Lewra dil li

[231] Arjen Arî, *Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî*, Avesta, Stenbol, 2000, r. 25.
[232] Arî, h. b., r. 28.

gor Arjen Arî ji evînê nayê şuştin. "Şuştina dil ji evînê" îmajeke bi îstîare ye. Cil û berg tên şuştin, lê ev nehatiye gotin. Ji ber vê yekê di vê îmajê de îstîareya girtî heye. "ramûsanan rêz bikim li gerdena te morî morî" [233]

Di van risteyên jorê de îmajeke evîna bihesret bi bêjeyên "gerden" û "morî" şênber bûye. Helbestvan her ramûsaneke gerdena yara xwe dişibîne morîkekê. Her ramûsan ew qas tije arezûye ku li ser gerdena yarê wek şûna devlêkirinê şopek hiştiye û bi hatina cem hev ya van rêzeramûsanan li gerdena yarê zîyneteke ji ramûsanên moriyê derketiye holê. Du bêjeyên bêelaqe wek ramûsan û morî di peywendeke xeyalî de îmajeke nûwaze ava kirine. Elbet rola hunera mecazê di vê îmajê de gelek e.

"mezin dibin bûkên çavên min
bi her çavlêketinê re dibin du hût" [234]

Mirov zêde kelecanî bibin an jî bi agirê arezûyekê bisincirin bûkên çavên mirovan mezin dibin. Di dema arezûya cinsî de jî gêra bûkên çavên mirov, fireh dibin. Arjen Arî ji bo şîddeta arezûya cinsî baş bîne ziman ev bûkê çavan her yek şibandiye hûtekî. Hût, remza heybetê û birçîbûnê ye. Di van risteyana de jî çavbîrçîbûneke cinsî heye. Agirê evînê geş bûye.

"di sînga xwe de her êvar
çira evînê bi destên min vêxiste" [235]

Arjen Arî, di van risteyan de bi hev re şabûna evîndaran bi awayekî sergirtî nîşan daye. Çiraya evînê ku di nava sîngên yarê de vêketî, bextewariya wûsleta evînê jî bi awayekî zelal eşkere dike. Çira, hêlîna agir e. Di vê îmajê de helbestvan, agirê laş yê cinsî jî bi sembola çirayê li ber çavan raxistiye.

"roj bi ramûsanekê re hiltê
di pacê re dibişire her tîrêj" [236]

---

[233] Arî, h. b., r.61.

[234] Arî, *Eroûtîka*, r. 8.
[235] Arî, *Eroutîka*, r. 35.

Bi ramûsanekê re hilatina rojê, husna talîl e. Lewra ramûsan tûnebe jî dê roj dîsa hilê. Arjen Arî, hilatina rojê weke ku bi saya ramûsanê be nîşan dide. Ev îmaj, hêza evînê tîne ziman. Evîndar hevdû radimûsin, bi hev re şadibin rûyê wan dikene. Helbestvan, di navbera bişirandina tîrêjên rojê ku di paceyê de xuya dibin û rûyê evîndaran yê bi ramûsanê re dikene têkiliyek daniye. Ev yek jî îmaja kêfxweşiyê xemilandiye.

"guldanka dil bêgul nabe
bêgulî her dem ezab e" [237]

Di van riseteyana de dil bi guldankekê hatiye şibandin. Dil, guldankek be, gula dil jî yar e. Xwîna dil, yara ku wek gulekê vê guldankê dixemilîne zindî dihêle. Mîna ku gulên di guldankekê de di nava avê de neçilmisin yar jî bi saya xwîna dilê evîndar naçilmise, zindî dimîne.

Îmajên Arjen Arî yên evînê, hêz û bedewiya xwe ji kevneşopiya feraseta kurdan a evîn û seksualîteyê digirin. Piranî bi bêjeyên peywendeke wan ya folklorê heye, îmajên kevnare saz dike. Bi çi mebestê îmaj saz kiribe bila bibe zelaliya şêwaza wî û herikbariya zimanê helbesta wî di bin giraniya îmajên wî de napeçiqe. Di mantalîteya Arjen Arî de helbest ne ji bo çêkirina îmajan e, îmaj ji bo fêmkirina helbestê ye. Arî, vê yeke tu carî ji bîr nake.

### 1.1.2. Îmajên Evînê di Helbestên Berken Bereh de

Di helbesta Berken Bereh de wek gelek mijaran evîn jî temayeke sereke ye. Bereh, Îmajên evînê piranî ji siruştê berhev dike. Hemû jiyana mirov ji bo Bereh fêmkirina efsûna siruştê ye. Bereh, ji aliyê evîna cîsmanî ve nêzîkî fikra evînê dibe. Ûnsurên siruştê tevlî şîroveyên evînê dike. Bêjeyên arkaîk di avakirina îmajên wî de xwedî roleke giring in. Carina jî ji bêjeyên arkaîk û bêjeyên modern kompozîsyoneke postmodern derdixe holê û îmajên evîneke pastoral li ser tûala helbesta xwe dineqişîne.

---

[236] Arî, h. b., r. 61.

[237] Arî, h. b., r. 75.

### a) Îmajên pênaseya Yarê

Bereh, yara xwe bi her endamên laşê wê dişibîne dar û ber, kulîlk û pel, gul û gîha, teyr û tulûr, ax û ava siruştê. Bi teşbîh an jî rêze teşbîhan û bi gotinên îstîare, îmajên evîneke bi kul û keser saz dike.

"çavên te
du gul pirpizêk in
her di destê êvaran de"[238]

Di van risteyan de şibandina çavên yarê û pirpizêk deriyê îmajê vekiriye. Bi îstiareya "destê êvara" îmaj kemiliye. Dema Berken Bereh, çavên yarê, di destê êvaran de mîna du gul pirpizêk dibîne îmaja ku hatiye afirandin hîn jî xemiliye. Êvar demeke ecele ya mirov temsîl dike. Êvarî herkes hewl dide zûzûka bigihêje mala xwe. Ji ber vê yekê helbestvan çavên yara xwe di destê êvarê de dibîne. Ew çav mîna pirpizêkan pir xweşik in, lê çi fêde wê êvar zû here û ew çav nema tên dîtin.

"di nava biska şevê de
du gul şevçirax in
çavên te"[239]

Berken Bereh, xwestiye şêvê, bişibîne keçekê, lê keça ku ji aliyê biskan ve bihêz e negotiye ji ber vê yekê îstiare di van risteyan de heye. Şibandina çavan bi şevçiraxê îmajeke resen e. Dema ev şevçirax di nav biskê şevê de tên xeyalkirin îmaj bêtir dewlemend dibe. Şev, remza tariyê, tirs û xofê ye. Çavên yarê bi ronahiya xwe tirs û xofa şevê ji hev belav dike.

"min keçeke ciwan nas dikir li vî bajarê diheze
xweşik bûn çavên wê mîna baranên biyan"[240]

---

[238] Bereh, Pandomîm, r. 13.

[239] Bereh, h. b., r. 18.

[240] Bereh, h. b., r. 63.

Şibandina çavan bi baranên biyan, îmajeke nûwaze ye. Bêhna xerîbî û penaberiyê ji vê îmajê tê. “Baranên biyan” ji kesên penaber re xweşik in ji ber ku rastiya bajêr hinekî xumamî dikin. Yan jî baranê welatên kesên ku penaber bûne tîne bîra wan û bi xatireyên baranên kevin, ev baran jî xweşik dibin.

“min xwe avête hembêza çavên te yên keskeşîn
li kîjan gulê binihêrim tu vedibî ji nişkê ve”[241]

Himbêza yarê ji evîndar re hêlekaneke bêhempa ye, lê ne îmaj e. Vegotina “himbêza çavên keskeşîn” bi arîkariya hunera teşxîsê îmajeke rengîn diafirîne. Çavên yarê ji evîndar re wek himbêzeke germ û nerm tên. Hinekî jî birehm. Gul di wêjeyê de ji hezaran îmajan re bûye destebirak. Di van risteyan de jî dema evîndar li gulan temaşe dike li şûna gulan yar vedibe. Şibandina yarê bi gulê, bi awayekî resen derketiye pêş.

“Stêrkeke xwînşêrînê her tîpeke navê te”[242]

Navê yarê ji bo evîndaran her dem şêrîn tê. Evîndar dema tenê be navê yara xwe dubare dikin û bi vê rewşê şad dibin. Carina jî bi darikan li ser axê yan jî bi kêrikan li ser der û daran qet nebe bi tiliyan li ser neqş û numuşê balîf û lihêfan bi sedan car dinivîsin. Evîndar, hingî ji navê yara xwe hez kiriye her tîpeke navê yara xwe şibandiye sitêrkeke xwînşêrîn. Mezinbûn, bişewqbûn û bedewbûna stêrkê kê dîtiye stêrk xwînşîrîn kiriye?

"her tîpeke navê te stêrkek e
diçirûsin di şevên tarî yên dilê min de" [243]

Navê yarê ji evîndaran re gelek bimane ye. Evîndar dema tenê bin bi deng û dema li ba hinekan bin di dilên xwe de her daîm navê yara xwe dûbare dikin. Nav, bi

---

[241] Bereh, h. b., r. 270.

[242] Bereh, h. b., r. 271.

[243] Bereh, h. b., r. 53.

dûbarekirinê maneya xwe wenda dikin, lê evîndar çi qasî navê yara xwe dûbare bikin ew nav ji wan re ew qas biqîmet dibe. Di risteyên jorê de Berken Bereh, her tîpeke navê yara xwe dişibîne stêrkekê ku di şevên tarî yên dilê wî de diçirûsin. Di şevên hicrana evîndariyê de dilê evîndaran tije kul û keser in. Ji ber vê yekê helbestvan mecaza "şevên tarî yên dil" bi kar aniye. Çirûsandina her tîpeke navê yarê di şevên tarî yên dil de, hêviya evîndaran ya ji bo bextewariya jiyanê nişan dide.

"te wek kulîlkeke hinarê vekir di dilê min de" [244]

Evîn, wek çûkeke azad li semaya hestan digere û ne diyar e kengî, li kîjan deverê siya xwe bera ser serê kê bide. Di risteya jorê ya Berken Bereh de ev rewş bi "vekirina kulîlka hinarê ya dil" de krîstalîze bûye. Wextê vekirina kulîlka hinarê reng û rewşa wê ya xweşik û nazenîn ji bo evîneke nûwaze îmajeke biteşbîh ava kiriye.

"ey karxezala
ku di çavên wê de bihar direqisin" [245]

Karxezal, di nav daristanan de diwelidin. Ji ber xweşikbûn û masûmiyeta wan gelek caran ji kilam, helbest, destan û çîrokan re dibin nexşeke tûala siruştê. Bazdana karxezalan bibeza ye û biaheng e. Dema vê bazdana biaheng bihar di çavên wan de bi jor û jêr, bi çep û rast diçe û tê. Helbestvan ev rewş, bi "reqsa biharê ya di çavan de" aniye ziman. Mebesta helbestvan yara xwe bişibîne karxezalê, lê naxwze vî tiştî rasterast bibêje. Ji ber vê yekê îmajeke bi îstîareya vekirî saz dike. Behsa yara xwe nake, lê behsa karxezala ku ji aliyê xweşikbûn û masûmiyetê dişibe yara wî dike.

"min bi rengên tîrêjeke ji hiş çûyî
tîna çavên te nîgar kir li dile xwe" [246]

Mirov ji ser hişên xwe ve diçin gêj dibin, nema zanin bi kîjan hêlê ve diçin û çawa tevdigerin. Ev rewş dişibe zikrî îlahî. "Rengên tîrêjeke ji hiş çûyî" remza coş û

---

[244] Bereh, h. b., r. 57.

[245] Bereh, h. b., r. 64.

[246] Bereh, h. b., r. 69.

kelacanê ye, gotineke biteşxîs e. "Tîna çav" ji bo anîna ziman ya enerjiya evînê sembolek e. Bi tîrêjeke ji hişçûyî, nîgarkirina tîna çav li dil" îmajeke hêza xwe ya edebî ji hunera mecazê digire.

"li perestgeha dengê te
min destxeta dilê xwe
wek goreyekê verist" [247]

Perestgeh, bêjeyeke dînî ye. Berken Bereh di risteyên jorê de pîroziyek bi riya bêjeya perestgehê li dengê yara xwe bar kiriye. Dengê yarê ji bo evîndar ji hemû dengan cûdatir e, tije xeyal e, tije bîranîn e, tije jan û kelecan şadî û bextewariya evînê ye. "Persetgeha dil", "Destxeta dil" gotinên bimecaz in. "Veristina destxeta dil wek goreyekê" bi arîkariya hunera teşbîhê saz bûye. Bi tevahî ev îmaj, îtîrafnameya evîneke pinhan bi zimanekî metaforîk li hember me radixe.

**b) Îmajên Pênaseya Evînê**

Berken Bereh di gelek risteyan de pênaseyên evînê dike. Carina evînê di taldeya rojhilatê dil de dişibîne teyisandina sitêrkan carina dilê xwe ji işqê re dike palgeh, dilê wî diperpite di qefeseke ji hestiyan, dengê evînê dineqişîne li ser baskên çûkan, evîna wî diqefile carina jî li ber tifika evînê rûdinê. Di risteyên Bereh de evîn temayeke bingehîn e.

“ger hûn bixwazin
evînê binasin
taldeya rojhilatê dilê xwe bipelînin
bê çawa biken diteyîsin stêrk”[248]

Di van risteyên jorê de helbet alegoriyeke siyasî jî heye. “Taldeya rojhilatê dil” û bi ser de pelandina wê derê, tiştekî balkêş e. “Kenê stêrkan” teşxîseke jirêzê ye. Belê di pelandina dil de, kenê sitêrkan, ji bo nasîna evînê çavdêriyê dike û îmaj

---

[247] Beken Bereh, Xewna Dawi, Lis, Diyarbakır, 2016, r. 87.

[248] Bereh, *Dilê Min Palgeh e Ji Işqê re*, r. 105.

dewlemend dibe. Taybetmendiyên mirovan, dema transferî siruştê dibin, rê li vegotina alegorîk vedibe û atmosfereke çîrokî pêk tê.

“min rûyê xwe diyarî bageran kir
dilê xwe ji işqê re kire palgeh”[249]

Diyarî, li gor derfetên maddî û manewî tên dayîn. “diyarîkirina tiştekî“ ji aliyê vegotinzaniyê ve cure axaftineke jirêzê ye, lê diyarîkirina “rû ji bageran” re, ji ber ku du tiştên ji aliyê maneyê ji hev ve dûr in, nêzîkkirina wan, îmajeke bedew derxistiye holê. Helbestvan di risteya dawî de “dil û palgeh”ê bi hev re dikelijîne û îmajeke nedîtî peyda dike. Bereh, hingî bêriya eşqê kiriye û dixwaze nêzîkî eşqê bibe, tiştekî hessas wek dil, ji eşqê re dike palgeh. Hunera teşbîhê roleke mezin lîstiye di vê îmajê de.

"işq diperpite li qefeseke ji hestiyan" [250]

Evîn rêyeke dûr û dirêj e. Di vê riyê de zor û zehmet gelek in. Evîndar heta ku ji dest wan tên li hember van zehmetê evînê serî hildidin, lê axir di dahfika evînê de rastî dijwariyan tên. Dil, paytexta evînê ye. Her çi qas evîn di mejiyê mirov de bikemile jî ji ber ku dema mirov hezkiriya xwe dibîne xwîna mirov di tamaran de hîn bi coş û kelecan diherike evîndar, dil wek hêlîna evînê dibînin. Yar çûkek be, dil jî qefesa wê ye. Dema evîndar, ji ber kesera evîna xwe ji xwarin û vexwarinan vedibin laşê wan lawaz dibin û dilên wan diperitin. Dema dil dihele tenê qefesa sînga evîndaran dimîne. Berken Bereh ev rewş bi îmaja "qefeseke ji hestiyan" aniye ziman.

"her sibeha ku te dibinim li ber serê xwe
beytak dengê evînê dinexşînin li ser baskên xwe" [251]

Evîndar, di rewşa evîndariyê de bawer nakin bigihêjin yara xwe. Wislet ji wan re wek xewneke şîrîn e. Carina di xewnên xwe de dibînin ku bi yara xwe re

[249] Bereh, h. b., r. 303.

[250] Bereh, h. b., r. 31.

[251] Bereh, h. b., r. 35.

gihaştine hev, ji xewê şiyar jî bibin hîn ji dibêjin qey yara wan li ber serê wan e. Ev rewş wek hallusînasyoneke evînê ye. Berken Bereh di risteyên jorê de bi dîtina evîndar ya yarê bawer dike ku beytak dengê evînê li ser baskên xwe dinexşînin. "Nexşandina dengê evînê li ser baskan" îmajeke surrealîst e. Îmajeke bi hunera îstîareya girtî saz bûye. Lewra ji aliyê nexşandinê ve mirov bihêz e û mirov nehatiye gotin.

"tu mîna ku nameyekê vekî
bi metirsî
bi lez
bi şermokî vedikî deriyê dilê min"[252]

Dil, paytexta evînê ye. Di wêjeyê de li ser dil bi hezaran îmaj hatine sazkirin. Dil, piranî wek xane, seray koşk tê dîtin. Bereh, vekirina deriyê dilê xwe şibandiye vekirina nameyekê. Wesfên yarê ku dema derî vedike îmajê dermale dikin.

"berfa te ya heliyayî di eşqa ewil de
min bi keziyên dilê xwe hûnand ev helbest
nizanim kî û kî hene tê de"[253]

Berf, ji wêneya vê îmajê re bûye tûalek. Berf, sembola safîtî û masûmiyetê ye. Di eşqa ewil de bi germahiya agirê evînê şermokî û masumiyeta zarokatiyê ji mirov dûr ve diçe. Hûnandina helbestekê bi bêjeyan pêk tê, lê Berken Bereh dibêje ku min ev helbest, bi keziyên dilê xwe hûnandiye. Dil, remza hezkirinê ye. Helbestvan dema afirandina vê helbestê ew qasî di kûrahiya dilê xwe ev hest hîs kirine ku wan, bi keziyên dilê xwe hûnandine. Kezî, pir hessas in dema bên kişandin êşeke mezin didin mirov. Xulase îmaj, bi biskên dil, hatiye hûnandin.

"tu êvaran rûdinî li ber tifika evînê
bi bîr tînî dildarên bênav û bêgor"[254]

---

[252] Bereh, h. b., r. 47.

[253] Bereh, h. b., r. 62.

[254] Bereh, *Pandomîm*, r. 69.

Evîn her tim bi germahî, bi agir, bi şewat, bi sincirandin, bi bizot, bi lêkerên kizirandin, qelandin, kelandin, peritandin û hwd. hatiye te'rîfkirin. Ji ber ku evîndar, dema ku çav li hev du dikevin xwîna wan li hev dikele, kelecanî dibin, xwîna wan hîn bihêztir di tamarê canê wan de diçe û tê. Ji ber vê yekê laşê wan disincire. Di van risteyên jorî de Berken Bereh bi bêjeyên "evîn û tifikê" îmajeke germ saz kiriye.

"evîn diqefile
bajar pişta xwe dide xewê
li devereke dûr mexel tê dengê te"[255]

Eger evîn biqefile ji bo evîndaran xetereyeke mezin heye. Lewra dawî li evînê tê. Yan jî evîndarek nema rû dide evîndara/evîndarê din. "qefilandina evînê" bîleksa îmajên evînê yên ku ribîniya agir ji wan diçe îmajeke resen e. Ku "bajar pişta xwe bide xewê" teqez tiştê ku îro wan xemgîn bikin pêkhatine. Lewra xew, reva ji rastiyê ye. Mirov, dema di bin giraniya rastiyê de dipeçiqe wek şikeftekê xwe li xewlexaneya xewê digire. Di vê îmajê de bajar pişta xwe daye xewê. Ev yek îmajeke balkêş e. Dema evîndar ji hev dûr dikevin dengê wan jî ji hev dûr dikeve. Berken Bereh, bi îstiareyeke balkêş deng li dûrî mîna mîh û bizinan mexel kiriye.

"bayekî tolaz porê te dîl girtiye
û evînê xwe berdaye newalan"[256]

"Tolaziya ba" û "dîlgirtina por" îmajeke bi hunera teşxîsê hatiye holê. Bayê tolaz ku evîna xwe berde newalan û porê yarê dîl girtibe tê zanîn ku evîna wî bayê tolaz, porê yarê ye. Ango yar bixwe ye. Berken Bereh, dixwaze bibêje ku bêhna porê yara min ji newalan tê. Îmaja ku ba, bêhna yarê bigihîne evîndaran di helbesta klasîk de jî gelekî hatiye bikaranîn.

"ez û tu û evîn li hev in
ji her sewteke hestên me
bi hezaran stêrk difûrin"[257]

---

[255] Berken Bereh, *Dilê Min Palgeh e Ji Işqê re*, r. 14.

[256] Bereh, h. b., r. 25.

Di navbera du evîndaran de kesayetdayîna evînê û lihevbûna wan peywendek afirandiye ji bo îmajê. “Sewta hestan” ku bi hezaran stêrk jê difûre bextewarbûna wan tîne ziman. Ji ber ku stêrk remza xeyalên şadiyê ye, “fûrandina sitêrkan” bi îstiareya di naveroka xwe de dihewîne, îmaj bireng û aheng kiriye.

“bi herikîna her dilopeke hezkirinê
gulek vedibe di bîbikên çavên we de”[258]

“Dilopên hêsira” vegotineke rojane ye, lê dema ew dilop, dilopa hezkirinê be, îmaj serê xwe radike. Ji ber ku du bêjeyên peywenda wan ne yek e tên cem hev. Her wiha Berken Bereh bigota di bexçe de gulek vedibe ji aliyê helbestê û îmajê de tu qîmeta wê tunebû, lê gotina “vebûna gulan di bîbikên çavan de” gotinê bihêz dike. Ev yek, hunera îmajê ye. Lewra îmaj, dîmenên ku di rastiya jiyanê de dîtina wan ne pêkan e, di mêjiyê mirovan de diwelidîne. Ev dîmena xeyalî, helbestê ji aliyê xwemaliyê ve resen dike.

### c) Îmajên Xemên Evîndaran

Ev cure îmaj li ser hizrên evîndaran ên kul û keserên evînê tînin zîman teşeya xwe digirin. Agirê evînê ku dilê evîndar disoje û hemû xemên evînê, bi van îmajan di risteyên helbestan de derdikevin qada hunerê. Di helbesta kurdî ya nû de helbestvanan di derheqê xemên evînê de gelek îmaj saz kirine. Berken Bereh di gelek risteyên lîrîk de xemên evînê bi îmajên rengîn aniye ziman.

"ez û tu du kulîlkên rûgeş û westiyayî
li bin çiyayê kulan
li ser deryaya xeyalan"[259]

Sînorê xeyalan tuneye. “deryaya xeyalan” ji bo vê bêsînoriyê îmajeke baş e. Zerya, her tim kûr e, bi coş e, difûre, diçe û tê. Xeyalên mirovan jî wiha ne. Ne dawî li wan tê û ne jî sekn û tebat li wan heye. “çiyayê kulan” ji bo ifadekirina kul û

---

[257] Bereh, h. b., r. 130.

[258] Bereh, h. b., r. 136.

[259] Bereh, h. b., r. 57.

keserên dinyayê metaforeke hêja ye. Kul çiqasî zêde bin xeyal jî ew qasî bêtir dibin. Ne ji xeyalan be kî dikare barê giran ê kulan bikişîne? Di nav van her dû îmajan de Berken Bereh xwe û yara xwe şibandiye “du kulîlkên rûgeş û westiyayî “ ev jî masumiyeta mirov li hember zor û zehmeta jiyanê nîşan dide.

“vê işqê
baskê esmanê min şikenand
stêrka dilê min vemirand”[260]

Di evîndariyê de carina evîndar xwe ew qasî bêçare hîs dikin ku per û baskên wan dişkên. Her çiqasî di vê gotinê de ji ber rola mecazê îmajek hebe jî îmajeke ji rêze ye. Bereh, ji vê yekê haydar e lewra baskê ezman şikenandiye. Bi hezaran çûkên biper û bask li ezmanan azad difirin. Helbestvan, dema baskê ezmên dişkîne tevlî mubalexeyeke mezin bêçaretiya xwe jî bêtir bi tesîr tîne ziman. Her wiha “vemirandina stêrka dil” jî dawîlêanîna şadî û bextewariyê ye.

"bi her awirekî wê çiyayek hildiweşi ji emrê min
bi her rûbadanê karwanê hestan kerr û lal" [261]

Awirên hezkiriyan li gor hest û ramanên wan her daîm diguherin. Xemgînî, dilşadî, aramî, tirs û xof dexisîn û gelek cûre rewş li ser rûyê hezkiriyan konê xwe vedide. Evîndar li gor feraseta xwe ji van awiran maneyan derdixin. Di risteyên jorê de evîndar dihizire ku bi her awirekî yara wî çiyayek ji emrê wî hildiweşe. "Çiyayê emir" gotineke bi mecaz e, hilweşîna çiyayê emir bi arîkariya hunera mubalexeyê derketiye holê. Eger yar rûyê xwe babide wê demê karwanê hestan kerr û lal dibe. "Kerr û lalbûna karwanê hestan" hem bi mecaz û hem jî bi hunera teşxîsê ava bûye. Ev îmaj, ji bo li hember awirvedanên yarê, guherîna hestan bîne ziman pir bihêz e.

“şagirtên evînê
li dergehê kubaran
bi kilamên birîndar mezin bûn”[262]

[260] Bereh, h. b., r. 253.

[261] Berken Bereh, *Ji Dûriyê re*, Lîs, Diyarbakır, 2013, r. 22.

Evîn tiştekî nayê fêrkirin an jî fêrbûn, lê Berken Bereh, bêjeyên “şagirt û evînê” di peywendeke perwerdeyê de aniye cem hev. Mirov birîndar dibin, lê kilamên birîndar, teqez ne şêwaza axaftina rojane ye. Helbestvan, bigota kilamên mirov xemgîn dikin, zêde bandora gotinê li ser xwendevanan çê nedikir. Di van risteyana de aliyê evîn û evîndariyê yê bikul û keser jî derdikeve pêş.

“û navê te
min bi ramûsanên sosinî û beybûnî dax kir
wekî hingiv helbesteke tehmxweş
li ser lêvên tî bûyî”[263]

Daxkirina nav bi ramûsanên sosinî, îmajeke estetîk derxistiye holê. Evîndar, hingî bi germahiya evîna xwe ji dil ve radimûse û navê yara xwe dibêje ew nav, bi germahiya ramûsanan dax dibe. Vê îmaja bi îstiare, helbest ji aliyê maneyê ve kûr kiriye.

“çend temen bûn xwelî kî dizane
hêsirên te dibên rûnê, lêvên te dibên here”[264]

Ji aliyê bûna xweliyê temen qels e. Ji ber vê yekê îstiareya girtî di vir de heye. Di risteya duduyan de hunera tezadê, îmaj hinekî din dermale kiriye. “Axaftina hêsir û lêvan” bi saya întaqê îmaj xemilandiye. Yê diaxive, ne tenê lêv e; dev bi xwe ye. Parçeyek hatiye gotin û temamê dev hatiye qestkirin. Ev yek jî bi derfeta mecaza mursel pêkan bûye.

“min heft caran daqurtandin peyvên xwe
û min heft caran serê xwe danî li ser balîfa navê te”[265]

---

[262] Bereh, *Dilê Min Palgeh e Ji Işqê re*, r. 147.

[263] Bereh, h. b., r. 92.

[264] Berken, h. b., r. 116.

[265] Bereh, *Dilê Min Palgeh e Ji Işqê re*, r. 293.

Mirov avê yan jî xwarinê dadiqurtîne, lê "daqurtandina peyvê" bi saya hunera mecazê derî li îmajê vedike. Wek me di îmaja berî vêya de jî anîbû ziman navê evîndaran ji bo yar/yarê wan gelek xwedî maneyeke kûr e. Di van risteyan de jî xuya dibe ku evîndar ew qasî ji navê yara xwe hez dike ku dixwaze serê xwe deyne ser balîfa navê yara xwe. "Balîfa nav" di warê taybetmendiyên navê yarê de têra xwe îmajeke resen e.

"mîna pelek li dara xwe vegere
ramûse dengê dilê min"[266]

Em li hezkiriyê xwe vedigerin. Carina jî venagerin. Vegera pelan îmajeke balkêş e. Kesayet daye dar û pelan tev de. Yar wek pelê li dara xwe vegere evîndarê xwe, îmajeke bedew ji bo wesletê tîne holê. Dil, ew qasî bêriya yarê kiriye û dibe ku giriyaye, zûriyaye, qîriyaye dengê dil zelûl û melûl bûye. Dibe ku ji ber vê sedemê Berken Bereh gotiye dengê dilê min ramûse. "Ramûsana dengê dil" îmajeke gelekî estetîk derxistiye holê.

"bibişire
da ku vê payizê
pelên zer
semayê nekin
di navbera dilê me de" [267]

Sema, reqsa dervêşên mewlewî ye ku li dora xwe biaheng dizîvirin. Payîz ji evînê re piranî tûaleke xerîbiyê û tenêtiyê ye. Di demsalên payizê de pelên dara yên hişk zerik û weşiyayî li ser axê kom dibin, dema bayek tê û ecacokek radibe ew pelên zerî hişk li erdê wek derwêşên mewlewî li dora xwe dizîvirin. Berken Bereh ji yara xwe tika dike ku bila yara wî bibişire ji bo ku ew pelên payizî nekevin navbera dilê wan û wan ji hev dûr nexin. Eger yar bibişire jixwe her daîm demsal bihar e. "Semaya pelên dara di navbera dilan de" îmajeke pastoral e. Di vê îmajê de rola

---

[266] Bereh, *Pandomîm,* r. 61.

[267] Bereh, h. b., r. 45.

hunera teşxîsê divê neyê jibîrkirin. Bişirandina yarê eger bikare rewşeke demsalê bisekinîne ev yek jî mubalexeyeke mezin e.

Berken Bereh di çêkirina îmajên evînê de bi şibandin, mecaz, îstiare û teşxîsên bedewiya xwe ji siruştê digirin aliyê evînê yê xweş derdixe pêş. Ba û bager, berf û baran, sitêrk û ezman, gul û sosin, pel û dar, dilop û çem di îmajên Berken Bereh de çêkerên xeyalên resen in.

### 1.1.3. Îmajên Evînê di Helbestên Fatma Savciyê de

Îmajên Fatma Savciyê yên di derheqê mijara evînê de ji aliyê peywenda temayê ve bêqerar in. Savcî, di hin îmajan de evîneke cîsmanî dirêse û di hin îmajan de sirûda evîna azadiyê distire. Ken li bihara çavan radixe, awirên xwe yên dildariyê şima dike, li şaneşîna dilê hezkiryê xwe radikeve, evînên parzûnkiri ji helbestên hinekirî diwelidîne, ji kenê hezkiryê xwe şelaleya kulîlkan diherikîne.

#### a) Îmajên Pênaseya Yarê

Fatma Savcî bi gelek teşbîh, îstîare û mecazan pênaseya yarê dike. Mefhûma yarê di helbesta Savcî de piranî ne diyar e ango yara ku behsa wê tê kirin mêr e, an jî jin e? Ev pirs pirê caran bêbersiv dimîne. Ev taybetmendî dibe ku ji ber jinbûna wê û bandora zayenda wê ya li ser helbesta wê be. Savcî ji bo jinan behsa dildarekî mêr û ji bo mêran jî behsa yareke nazenîn dike.

“min li behara çavên xwe raxist
kenê te yê ji kulîkan” [268]

“Bihara çavan” remza ciwantiyê ye. Nêrînên ciwanan wek wêneyên biharê zindî ne. Ken nîşaneya kêf û şahî û eşqê ye. Kulîlk sembola biharê, ter û tazetiyê ciwantî û naşîtiyê ye. “Raxistina kulîlkên ken li bihara çavan” îmajeke bi bêjeyên lihevhatî çê bûye. Lewra hunera tenasubê û her wiha hunera mecazê ev îmaja saz kiriye.

[268] Savcî, *Gulên Qasid*, r. 56.

"minê çavên te
bikirana ezmanek têr baran
bexçeyê stêran
li ber av bidana
dilê te secadeyek nimêjê
û ji kenê te
şelaleya kulîlkan biherikandana" [269]

Şibandina çavên bihêsir bi ezmanên têr baran û avdana sitêran li ber vê baranê, dîsa şibandina dil bi secadeya nimêjê, teşbîhên xwemal in. "Ji ken herikandina şelaleya kulîlkan" bi hêza vegotina îstiareyê îmaj wek bûkek li ser hespê xemilandiye.

"min şima kirin
awirên xwe yê dildariyê
ji kenê te yê têr gul re
veşartin di ezmanê çavên xwe de" [270]

Şima, wek mezeloqê ye û tiştan bi hev dizeliqîne. Awirên dildariyê tije arezû ne. Evîndar bi nêrînên zoq li hevdu temaşe dikin. Dema yar dikene rûyê yarê mîna gulekê vedibe. "Kenê têr gul" îmajekê wêneya vê dîmenê dikişîne. "Şimakirina awirên dildariyê bi kenê têr gul" îmaj kemilandiye. "Veşartina wan awirên bi kenê têr gul ve zeliqî di ezmanê çavan" de hêz û bedewiya îmajê bilind dike. "Ezmanê çavan" îmajeke xwemal e.

"tenê ez mam li şaneşîna dilê te
ya ku heyvek çardeh şevî
lê raketiye" [271]

---

[269] Savcî, *Xewnên Zîvîn*, r. 38.

[270] Savcî, h. b., r. 98.

[271] Savcî, h. b., r. 99.

Dil, gelek caran bi qesran tê şibandin, lê di van risteyana de “şaneşîna dil” îmajeke nedîtî afirandiye. “Raketina heyveke çardeh şevî li şaneşîna dil” dîmeneke surrealîst li ber çavan radixe. Mezinahî, bedewiya heyva çardeh şevî li şaneşîna dil razayî, hem teşxîs û hem jî mubalexeyekê di naveroka xwe ya maneyê de dihewîne. Dil jixwe biçûk e, şaneşîna dil hîn biçuktir e. Mezinahiya heyva çardeh şevî û raketina vê heyvê li şaneşîna dil tezadekê ava dike. Heyva çardeh şevî di wêjeyê de temsîla yarê ye jî. Fatma Savcî bi îstiareyeke vekirî dixwaze wiha jî bibêje: “Yara wek heyva çardeh şevî xweşik, di şeneşîna dilê evîndarê xwe de raketiye.”

"Agirê heft newroza di kevçîka kezeba xortan de pêxistibû" [272]

Di demen berê de di cejnên Newrozê de keç û xortan hevdû didîtin û dibûn evîndarên hev. Agirê mezin yên Newrozê ku dihatin pêxistin û keç û xortan xwe di ser wan agiran de diavêtin. Coşa cejnê, bi agirê evînê di dilên ciwanan de xurttir dibû. Di risteyên Fatma Savcî yên jorê de agirê evînê bi agirê heft Newrozan ve hatiye şibandin. Dîsa mubalexe yek ji çêkerê vê îmajê ye.

"ew tilîkên xwe yên ji hevrîşimê
wek mûmikên ji şimayê
ta bi ta ji hev pêdixe" [273]

Dest û tiliyên yarê ji evîndar re gelekî biqîmet in. Di evîna pînhan de evîndar her daîm arezû dike ku rojekê an şevekê bikaribe bi destên hezkiriya xwe bigire, destên wê maç bike. Di risteyên Jorê de helbestvan tiliyên yarê dişibîne hevrîşimê û mûmikên ji şimayê. Dema tiliyên yarê bişibin mumikên ji şimayê wek mûmikên ku mirov wan ji hev pêdixe dê yek bi yek ji hevdû agir pêkevin. Di van risteyan de îmajeke li gor derûniya giyanê jinan a mîkroestetîk derdikeve pêşberî me.

[272] Savcî, h. b., r. 28.

[273] Savcî, h. b., r. 52.

## b) Îmajên Pênaseya Evînê

Fatma Savcî, dema pênaseya evînê dike, evînê bi nêrîneke hêvîşikestî dinirxîne û piranî li ser xetereyên evînê disekine. Evînê dişibîne devê lûleyê, evînan parzûn dike, Peyman dide xwe ku li ser pelên gulan ayetên evînê hew dixwîne.

"çerxa xwînê ye xak
Devê lûlê ye evîn jî" [274]

Bi hezaran pênaseyên evînê hene. Çend evîndar hebin ew qas pênaseyên evînê jî hene. Fatma Savcî di vê îmaja jorê de evînê dişibîne lûleya tivingê.

“wê demê ez ê jî
evînên parzûnkirî
helbestên hinekirî
biwelidînim
ji qolincên me her duyan“ [275]

Parzûnk, ava tiştan vedixwe û cewhera wan derdixe holê. Evînên parzûnkirî ji bo vegotina evîna heqîqî, îmajeke serkeftî ye. Hine, remza şahî û kêfxweşiyê ye. “Helbestên hinekirî” ji bo sembola helbestên evînê, îmajeke baş e. Ji qolincên evîndaran welidandina helbestên hinekirî, ji bo îmajê çîroksaziyeke balkêş e.

“li ser pelên gulan
ayetên evînan hew dixwînim” [276]

Mirov unsûrên siruştê ji bo evînê wek amûrên vegotinê bibîne tiştekî balkêş e. Evîndar ji maneya remza gulê ku li hemû cîhanê tê zanîn, sûd wergirtiye. Di edebiyata klasîk de fêma gul ji dilopa xwîna evîndaran çêbûye heye. Nexşên ser pelên gulê jî bûne ayetên evînê.

---

[274] Savcî, h. b., r. 57.

[275] Savcî, *Gulên Qasid,* r. 101.

[276] Savcî, h. b., r. 56.

### c) Îmajên Xemên Evîndaran

Fatma Savcî, mefhûmên ku di helbesta xwe de li ser wan disekine bi berçavkeke reşbînî dibîne û wiha nîşanî me dide. Ji ber vê yekê di mijara evînê de jî aliyên evînê yên bi kûl û kser di risteyên wê de ne kêm in. Şadî û bextewarî di helbesta Savcî de bi qehr û girî hatiye meyandin.

“ji evîna te re
min berdêl da
kenê çavên xwe
ma ne bes e” [277]

Çanda berdêliyê bandor li ser helbestvanên jin kiriye. Helbestvanên jin, di gelek risteyan de wek bangewazî ji vê bêjeyê sûd werdigirin. Di van risteyana de ji bo evînê “berdêlîkirina ken” xwemaliyek daye îmajê. Maneya vê bêjeyê ya kevnare îmaj ji aliyê estetîka vegotinê dermale kiriye.

"dest nedin dilê min
qelûnên xwe
ji hestiyên min çêbikin" [278]

Dil ji bo evîndaran ew qas biqîmet e ku evîndar ji bo dilê xwe li hember her cefayê bisebr û aram tevdigerin. Heta ku dil hebe dê evîn û evîndar jî hebin. Ji ber vê yekê Fatma Savcî dibêje ku hûn qelûnan ji hestiyê min çêbikin, lê tenê dest dile min nedin. Hundirê qelûnê vala ye. Ji bo ku ji hestiyên mirov qelûn çê bibin mecbûr hundirê hestîyê mirov bê kolandin. Êşa hestiyan jixwe geleke zêde ye. Helbestvan tevlî hemû êş û şikenceya çêkirina qelûna ji hestiyên wê qebûl dike, lê dibêje dest dilê min nedin. "qelûna ji hestiyê mirovan" îmajeke resen e.

"lê ji dil keyayekî xewnek di keskesora eşqê re derbas kiribû

[277] Savcî, h. b. r. 71.

[278] Fatma Savci, *Dotmara Lal*, Avesta, Stembol, 2014, r. 12.

û bajarek li ber sûretê wê ava kiribû" [279]

Keskesora ku baran dibare an jî piştî baranê carina li semayê derdikeve dişibe kenê ezmanan. Ew keskesor ji gelek kesan re wek rengîniyeke siruştê ye, lê hinek bawerdikin ku dibin wê keskesorê re derbas bibin dê qedera wan baştir bibe. Di risteyên Fatma Savcî yên jorê de keskesor, keskesora işqê ye. Gotina "keskesora işqê" tevlîheviya hest û raman û jan û kelecana evînê destnîşan dike. Hunera mecazê rê li vê îmajê vekiriye. "Avakirina bajarekî li ber sûretekî" jî ev îmaj bi mubalexeyê kemilandiye.

dilê xwe di havînekî zîvîn de dikute
û xwe li bejna yara rûqedîfeyî berdide" [280]

Dengbêj ne tenê derdên xwe di heman demê de kul û keserên civaka xwe jî tînin ziman. Dilê xwe bi kilamên dibêjin dihelînin. Di risteyên jorê de Fatma Savcî, îmaja dengbêjekî ji ber eşqa yara rûqedîfeyî dilê xwe dikute saz kiriye. "Kutandina dil" îmajeke bi îstîareya girtî pêk hatiye. Lewra ji aliyê kutanê ve unsura bihêz nehatiye gotin.

Fatma Savcî di îmajên evînê de cihekî taybet dide siruştê û evîneke bişewat, evîneke derengmayî, evîneke qedexe bi hesreta dil dixemilîne û diyarî xwendevanan dike. Dema behsa evîna azadiyê dike dengê çilmisî yê evîneke beşerî ala gazin û belengaziyê kil dike. Dema qala evîna beşerî jî dike, heyf û mixabiniya evîna azadiyê serê xwe ji nav arezuya evîna cîsmanî de derdixe û bi çavên kelogirî li wê dinêre.

### 1.1.4. Îmajên Evînê di Helbestên Gulîzerê de

Gulîzer, bi giştî behsa evîneke platonîk an jî evîneke bi hesreta zewacê dike. Di risteyên Gulîzerê de evîn wek temayeke navendî derdikeve pêşberî me. Temayên civakî, siyasî, dînî û zayendî li dora temaya evînê formeke wêjeyî digirin. Hêjayê gotinê ye ku îmajên Gulîzerê yên evînê xwedî çîroksaziyeke mantiqî ne. Ev çîroksazî bi xeyalên gelek rengîn û bi ramanên aqilane ava dibin.

---

[279] Savcî, h. b., r. 25.

[280] Savcî, h. b., r. 49.

### a) Îmajên Pênaseya Yarê

Gûlîzerê, di îmajên pênaseya yarê de bi teşbîh, îstîare û mecazan sûretê evîndarê xwe çê dike. Di nav teswîrên Gulîzerê de unsûrên rûyê mirov derdikevin pêş. Gulîzerê bi wêrekî behsa mêrekî dike, ango hezkiriyê ku di helbestên xwe de behsa wî dike mêr e. Ev yek jî di helbesta wê de ji bo şopên zayendê giring e. Gulîzerê li gor Fatma Savcî aliyê zayendê di helbestên xwe de bêtir bi wêrekî derdixe pêş.

"ez belawela dibûm li ber deriyên çavê te û xencî çavên te
tu navnîşanan ez nedihewandim." [281]

Evîndar, çavên hev wek cih û warê xwe dibînin. Belawelabûna li ber deriyê çavê evîndar, rewşa evîndar a şerpeze baş teswîr kiriye. Dîtina çavên yarê wek navnîşan, tiştekî balkêş e. Evîndar ew qasî ji yarê hez dike ku ji bilî yarê xwe nema tu kesî dibîne. Sûretê evîndar, li çavên yarê wî neqş dibe, lê dimîne. Bi vê boneyê çavên yar, ji evîndar re dibe navnîşan.

"girî bela xwe ji çavên min venake
ez ketime dexlê şekala çavên te
tu serîkî li çavên min bixî" [282]

"Şekala çavan" ji bo zimanê helbestê ji zimanê rojane veqete vegotineke nebihîstî ye. Bêçarebûna evîndar jî bi laveyên parsekî têkûz kiriye. Ji ber ku evîndar ji evîna xwe dûr e karê evîndar her tim girî ye. Giriyê ku bela xwe ji çav ber nede teşxîs bûye. Eger yar, were û serîkî bide evîndarê xwe dê ev girî bisekine. Ji bo serlêdana evîndar "laveya ji şekala çavan" manîdar e.

"were tiliyên xwe bike şûrê Şamê
porê min têl bi têl talan bike"[283]

---

[281] Gulîzer, h. b., r. 49.

[282] Gulîzer, h. b., r. 55.

[283] Gulîzer, *Keziyên Jinebî*, r. 62.

Şûrê Şamê bi tûjbûna xwe navdar e. Şibandina tiliyên evîndar bi şûrê Şamê îmajeke resen afirandiye. Bi destê evîndar talankirina porê yarê îmajê temam dike. “Por, têl, tilî, şûr û talankirin” wek çêkerên vê îmajê lihevhatî ne. Ango hunera tenasubê ji îmajê re hostetî kiriye.

“her ku min lê dinêrî
lêvên min bi werîsan dihatin dirûtin
dengê min rengê herî tarî li xwe dikir” [284]

Evîndar, dema li hevdu dinêrin kelecanî dibin. Bêhna wan diçike. Rûyê wan sor dibe. Ligel daxwaza gotina gelek tiştan bi wan re hebe jî carna devê wan bi hev disuqume. Gulîzer, vê rewşa bi dîmena “biwerîs dirûtina levan” li ber çavan raxistiye. Dema lêv bi werîsan bê dirûtin tu çareya deng derkeve dervê namîne. Ji ber vê yekê deng jî rengê herî tarî li xwe dike. “Dengê ku rengê tarî li xwe dike” dişibe jineke di matemê de ye.

“her ku li min dinêrî
min ji nêrînên wî
kiras û binkirasan didirut
ji sêwiyên dilê xwe re”[285]

Dema evîndarek, yên din terk dike dilê evîndarê hatiye terkkirin sêwî dimîne. Evîndarek ku ji “nêrînên hezkiriyê xwe kiras û binkirasan çê bike” tê maneya ku dixwaze laşê xwe û mehremiyeta xwe bi nêrînên hezkiriyê xwe bipêçe. Di van risteyan de kiras û binkiras ji sêwiyên dil çê dibin. Ev yek jî konteksa îmaja sêwîtiyê têkûztir dike.

“çavên te mîmarê dojehên dilê min in
her roj
bi solên xwe yên leşkerî
li ser dilê min dîlanê dikin” [286]

---

[284] Gulîzer, h. b., r. 64.

[285] Gulîzer, h. b., r. 64.

Dojeh, têgeheke dînî ye. Evîndar çavên hezkiriyê xwe şibandiye mîmarê dojehekê, lê dojeha dil. Agirê ku bi evînê ketiye dilê evîndar, bi dojehekê hatiye bilêvkirin. Ev ezab ji evîndar re kêm hatiye dîtin an jî çavên hezkiriyê evîndar bi vî ezabî nehatiye ser û her roj bi solên leşkerî li ser "dojeha dilê evîndar" dîlanê dike. Wek hunermendekî li ber berhema xwe şad bibe. "Çavên ku li ser dojeha dil bi solên leşkerî dîlanê dikin" îmajeke ji aliyê mane û dîmenê gelek bihêz e.

### b) Îmajên Pênaseya Evînê

Gûlîzerê, di helbestên xwe de mijara wê çi dibe bila bibe ji felsefeyê sûdê werdigire û felsefeya mefhûmên ku mijara wê ne, di çîroksaziya îmajên wê de xwedî roleke giring in. Evîn di helbesta Gulîzerê de wek temayeke lîrîk ya bingehîn derdikeve pêşberî me.

"ku meriv
nexşeya dilê xwe da hinekan
wê teqez
werin û bikolin
di tariya şevekê de" [287]

"Nexşeya dil" ji çîroksaziya vê îmajê re dayiktî kiriye. Di tariya şevê de li ber rêberiya vê nexşeyê hatina hinekan û "kolandina axa dil" mecazeke kompleks saz kiriye. Her çiqasî nehatibe gotin jî di peywenda "nexşe, kolandin, tariya şevê" de tê fêmkirin ku Gulîzer, dil wek xezîneyekê dibîne. Eger mirov nexşeya xezîneya xwe riya hinekan bide jixwe wê şevekê bên û erda xezîneya mirov bikolin. Îmajên Gulîzer ên ser evînê, piranî di derheqê cudahiya evîndaran de ye.

"ne qelen dixwazim ne jî xelat
em ê dilê xwe berdêlî bikin" [288]

---

[286] Gulîzer, h. b., r. 74.

[287] Gulîzer, *Bûka Baranê*, r. 66.

[288] Gulîzer, h. b., r. 31.

Berdêlî, di çanda kurdî ya kevnare de guhertina keçan e ji bo zewacê. Çandeke ji aliyê civakî, giyanî zehf hatiye nîqaşkirin. Di van risteyana de Gulîzer dibêje em ê dilê xwe berdêlî bikin. Di nava evîndaran de guhertina dilan îmajeke nedîtî ye. Aşiq, hingî ji evîndara xwe hez dike dixwaze dilê wan bi hev re biguhere.

"bila nêrgiz ji bêhna wî sermest bibûna
min ê valahiya nav her du pêsîrên xwe bikira
guldank ji wan re" [289]

Bêhn, di evînê de pir muhîm e. Evîndar carina aşiqî behna hevdû dibin. Carina destmalê xwe didin hevdû û bi bêhna hevdû ya ku ji destmalê tê sebra dilê xwe tînin, hişê xwe diewgirînin. "Sermestbûyina nergizan ji bêhna evîndaran" hem teşxîs û hem jî mubalexe ye. Valahiya nav her dû pêsîran ku mirov wek guldankekê bi kar bîne ji bo îmajê gelekî estetîk e.

### c) Îmajên Xemên Evîndaran

Gulîzerê, di helbestên xwe de kûl û xemên evînê ji îmajên xwe re dike tûal. Piranî dûrbûna ji hezkiriyan û xemgîniya evînên yekalî, ji bo wisletê bêhêvîtî sedemên xemên Gulîzerê yên sereke ne.

"min ê birînê te bi hêsirên xwe bişuşta
min ê bi bijangên xwe kêl biavêta birînê te" [290]

Evîndar, halê xwe gelek caran bi birîndariyê tînin ziman. Ev îmaj li ser birînekê saz bûye û xemla xwe ji nûjdariyê girtiye. Birîn, berî bên dermankirin bi avekê tên şuştin û paqijkirin. Gulîzer jî dixwaze birînên laşê hezkiriyê xwe, bi hêsirên çavên xwe bişo. Di hêsirên çavan de xwê heye. Xwê jî ji bo dezenfekteya birînan baş e. Berî hekîmtiya modern li gundan ji bo birîn zû rehet bibe xwê bera nav birînan didan. Piştî ku birîn bi hêsiran hatin paqişkirin, yara evîndar, dibêje ez ê bi bijangen xwe kêlan biavêjim birînê te. Ev îmaj, wêk wêneyeke evîna bişewat e.

---

[289] Gulîzer, h. b., r. 20.

[290] Gulîzer, *Keziyên Jinebî*, r. 14.

"çavên min du bîr in
peyvên te dewlên bê xem"[291]

Bîr kûr in, tarî ne, bitirs û xof in. Tiştê kûr, ji şîroveyê re vekirî ne. Şibandina çavên yarê bi du bîran, ji aliyê nêrînê ve kûrahiya wan nîşan dide. Dîsa bi saya dewlê mirov avê ji bîra dikişîne. Helbestvan Gulîzer peyv jî şibandiye dewlê ev jî balkêş e. Esas helbestvan dixwaze bibêje ku "Tu bêxem li çavên min ên kûrmane dinêrî û peyvên ku ez pê biêşim ji min re dibêjî.

"di payizan de destê xwe hine dikim
û nenûkên xwe yên bi hine dişînim ji wî re
bila zanîbe ez rojan dijmêrim
hinne carna teqwîma pîrekekê ye" [292]

Dema jinek, destên xwe hine bike ew hineya nenûkê wê, encax wextekî jê here. Bi her jêkirina nenûkan ji binî ve nenûka nû ya bêhine derdikeve. Bi vî awayî jin dizane çend hefte çûye û ji ew tiştê ku li hêviyê ye çiqasî wext maye. Şandina nenûkên jinekê ji evîndarê wê re ji bo teqwîmê, îmajeke fîktîf e. Çîroksaziya wê têra xwe afirîner e.

"ha ji te re
dilê min ê li pey te şewitî
bike pîşo
ji navoka evîna xwe ya çilînî re" [293]

Beriya nûjdariya modern zarokên nû xwedêdayî, navika wan girê didan û pîşo dişewitandin, dixistin navika wan. Di van risteyana de helbestvan ji evîndarê xwe re gotiye: "Tu çûyî û te min li pey xwe hişt; dilê min li pey te wek pîşo şewitî, tu jî dilê min ê wek pîşo şewitî, ji navika xwe ya çilînî re bike pîşo." Ev îmaj, bedewiya xwe ji çîroksaziya xwe ya kevnare digire. Îmajeke resen e.

---

[291] Gulîzer, h. b., r. 14.

[292] Gulîzer, h. b. r., 19.

[293] Gulîzer, *Keziyên Jinebî*, r. 25.

Kul û keserên evîn û cudahiyê di risteyên Gulîzerê de bi îmajên ji aliyê çîroksaziyê ve resen hatiye ziman. Orîjînalîte taybetmendiya herî mezin a îmajên Gulîzerê ye. Di paşxaneya her îmajeke Gulîzerê de kurteçîrokeke veşartî heye. Ev kurteçîrokên evîneke pînhan; bi mecaz, îstîare, teşbîh û hunera husna talîlê vediguhezin îmajên nebihîstî û helbestê dikin qada reqsa raman û xeyalan.

## 1.2. ÎMAJÊN EROTÎZMÊ

Dîroka erotîzmê, bi dîroka mirovahiyê ve dest pê dike. Her çiqas ji bo zêdebûna mirovan û bi vî awayî domandina cinsê mirovan wek şuxleke karîger bê hesibandin jî erotizm, lûtkeya hedonîzmê ye. Zayend, ji bo cinsê mirovan bi salên dûr û dirêj bi awayekî bêqaîde hatiye jiyandin. Piştî ku mirov bû parçeyekî civakê di qada zayendê de jî hin qaîde derketine holê. Ev qaîde di mêjiyê civakê de bûne xwediyê kevneşopiyekê. Bi derketina dewletan ev kevneşopiyên devkî, bi dirûvê zagonan, di jiyana mirovan û civakan de cih girtine.

Di edebiyata gelek miletan de erotîzm, kêm zêde cih digire. Zayenda ku di navbera du kesan de bi awayekî veşartî pêk tê. Di qada hunerê de ji gelek guftûgoyan re bûye mijar. Di hunera wêneyê de, di peykerteraşiyê de û di wêjeyê de şayesandina erotîzmê li gor nirxên exlaqî rast e an na, eger rast be ev rastî çiqasî estetîk e? Ev pirsana di felsefeya hunerê de her daîm mêjiyê mirov meşxûl kiriye.

Hunermend, berî her tiştî însan in û hîsa zayendî bi wan re jî heye. Wê demê mumkun e hunermend, ev arezûyên tund di hunera xwe de vêşêre? Di edebiyata gelerî de erotîzm bi hin bêjeyên bijarte û bi awayekî sergirtî derdikeve ser qada helbestê, lê di edebiyata nû ya kurdî de erotîzm di helbestê de bi wêrekî hatiye bikaranîn. Arjen Arî bi navê “Eroûtîka” pirtûkeke helbestê di 2006an de çap kiriye. Ev pirtûk, di helbesta kurdî de di warê erotîzmê de wêrekiyeke mezin e, lê divê neyê ji bîrkirin ku erotîzm, her dem bi mecaz, îstiare xulase bi hêza îmajan hatiye bilêvkirin. Em binêrin helbestvanên me di vê mijara bisitirî de îmajên çawa afirandine?

Îmajên erotîzmê herî zêde di helbestên Arjen Arî derdikeve pêşberî me. Berken Bereh di mijara erotîzmê de ne wek Arî wêrek e, lê di helbestên wî jî de kêm be jî îmajên erotîzmê hene. Erotîzma Bereh li gor erotîzma Arî lirû ye. Di helbesta Gulîzerê de jî îmajên erotîzme hene. Hêjaye gotinê ye ku Gulîzer ji aliyê arezûyên

zayendî yên jinan nêzîkî erotîzmê bûye. Ev yek jî ji bo helbestvaneke jin di edebiyata kurdî ya nû ya bakur de serkeftinek e. Fatma Savcî di vê qadê de ne wek Gulîzerê wêrek e, di helbesta Savcî de cihê mijara erotîzmê tuneye.

### 1.2.1. Îmajên Erotîzmê di Helbestên Arjen Arî de

Arjen Arî, di mijara erotîzmê de di helbesta kurdî ya nû de lutkeyek e. Tu helbestvanên kurd di warê bilêvkirina erotîzmê de ne wek wî wêrek in. Arî, di gelek helbestên xwe de cih dide risteyên mijara wan zayend e, lê bi taybet çarçoveya kitêba wî ya bi navê "Eroûtîka" erotîzm e. Arî, carina bi bêjeyên arkaîk hestên erotîzmê tîne ziman û ji çanda dengbêjiyê sûdê werdigre; carina jî bi şêwazeke modern vê mijara bisitirî di naveroka helbesta xwe de bi cih dike. Têrxwarina wî ji goştê yarê tuneye, laşe yarê wek tenûreke har dibîne, mêyîtiyê ji bo yarê wek mertalekî dinirxîne, Di risteyên jêrî de hin mînakên îmajên erotîzma wî hene:

"û bixwe nikarim
şevek din salek e
tu paxilê veke
derî ez ê li dû xwe darim" [294]

Agirê arezûya cinsî, laşê mirov rapêçe her saniyeyek ji mirov re wek salekê dûr û dirêj tê. Dema hefsarê hespa har ya lîbîdo ji destê siwarê wê bifilite ew arezûya cinsî wek jehrê di tamarên mirovan de digere. Di risteyên jorê de Arjen Arî, dibêje "tu paxilê veke / derî ez ê li dû darim" Di vê îmajê de bi bangewaziyên seksuel, bi bêjeyeke ji rêzê ango bi "derî" hatiye sazkirin.

"şerm meke
veke deriyê dubask
paxila xasxask li min veke
û piştekê bide pişt derî" [295]

---

[294] Arjen Arî, *Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî*, Avesta, Stenbol, 2000, 26

[295] Arî, h. b., r. 61.

Di vê malika jorê de Arjen Arî dîsa bi arîkariya bangewaziya bêjeya "derî" ya zayendî îmajeke erotîk ava kiriye. Gotina "deriyê dubask" ji bo uzvê tenasulê yê jinê metaforeke balkêş e. Ev îmaj ji bo nîşandayina cureta Arjen Arî ya di derheqê mijara erotîzmê û di helbestê de bikaranîna wê mînakeke resen e. Di vê îmajê de hunera îstîareya vekirî heye.

“hestî bi hestî bikewêjim jî
têrxwarina min nîn e ji goştê te” [296]

Di van risteyan de hestên evînî, veguhestine arezûyên zayendî û helbestvan birçîbûna xwe ya şehewî bi îmajeke nedîtî aniye zimên. Ji bo vegotina arezûya zayendî kojandina hestiyê yarê daxwazeke tund ya cinsî şênber dike. Tiştê balkêş ew e ku maçîkirin, mêjandin, gezandin ne bes e, kojandin jî hatiye bikaranîn. Ev jî pîleya herî dijwar e.

“tenûr e her derên te tenûreke har
li lêvên min digrê rivîn” [297]

Di nêzîkbûna jin û mêr ya cinsî de herikîna xwînê ya di tamara de zêde dibe ev yek jî dibe sedema sincirandina laşê mirov. Ji ber vê yekê Arjen Arî, laşê yara xwe şibandiye tenûrekê û rivînên tenûrê li lêvên wî girtiye. Ev îmaj bi peywenda bêjeyên dûrmane wek laş, tenûr, lêv, rivîn, har hatiye sazkirin. Hêza hunera teşbîhê tevlî hêza hunera mecazê bûye û ji bo agirê şehweta hundirê mirov bîne zimên îmajeke erotîk saz kiriye. Di helbesta kurdî ya nû de erotîzm, piranî li ser bêjeyên peywenda wan germ ava dibe. Ji ber vê yekê agir, bizot rivîn, tenûr, şewat, germ, sincirandin, kelandin, qelandin, biraştin, kizirandin hwd. tên bikaranîn.

“destên min hesin, heste
ku digihin newalên te
li tilmên te ku dipelin

[296] Arî, *Eroûtîka*, r. 58.

[297] Arî, h. b., r. 62.

birûsk dihingiwe xwînê
û ez dilerizim wesle b'wesle" [298]

Di nava erotîzm û pornografiyê de sînorekî tenik heye eger helbestvan li wî sînorî miqate nebe bi hêsanî dikare derkeve derveyî sînorê erotîzmê. Van risteyên jorê jî di navbera erotîzm û pornografiyê de mane. Bêjeya "newal"ê bi mecazî hatiye bikaranîn. Risteya "birûsk dihingive xwînê" îmajeke hişê mirov serûbin dike. Hunera îstiareyê, sihêmiyeke mezin daye vê îmajê.

"kirasê te şev e mertalê te mêyîtî
ez têk diçim bi rimeke şikestî
serê min li ber serê te dikeve
li dû her kirinê" [299]

Bi rêze teşbîhan ev îmaja jorî bi hostetî hatiye hûnandin. Kiras, bi şevê; mêyîtî, bi mertal hatiye şibandin, rimê şikestî jî bi riya îstiareyê li şûna uzvê mêraniyê hatiye bikaranîn. Di risteyên dawî de sînorê erotîzmê derbas bûye û vegotineke pornografik tevlî refê helbestê bûye. Ev yek jî vechê vegotina erotîzma hin kilamên kurdî daye helbesta nû.

"ez nêriyê te me
bi devê te gayê te yî pîr
gayê te yî xişn bi gîsin û nîr
cotkarê zevî û newalên te" [300]

Di hemû risteyên jorê de alegoriyeke erotîk heye. Nêrî, ga, gîsin, cotkar, zevî û newal remzên zayendî temsîl dikin. Bi hevkarî îmajeke tund a erotîk ava kirine. Di navbera şuxlê zayendî û remzên ku hatine bijartin de têkiliyeke karîger heye. Bêjeyên ku ji bo avakirina van risteyên jorî hatine neqandin peywenda wan têkildar e. Her bêjeyek ji bo îfadekirina tiştekî din hatiye bikaranîn. Vegotineke alegorîk bi

[298] Arî, *Eroûtîka,* r. 68.

[299] Arî, h. b., r. 79.

[300] Arî, h. b., r. 87.

saya bêjeyên rûmûzî di seranserê helbestê de ji xwe re qadeke berfireh a îstiareyan ava kiriye. Di zanîna belexatê de ji vê cure îstiareya belevbûyî, îstiareya temsîlî tê gotin. Arjen Arî, bi hostetiyeke folklorîk ji bin vî barê erotîzmê derketiye.

### 1.2.2. Îmajên Erotîzmê di Helbestên Berken Bereh de

Helbesta Berken Bereh ji aliyê mijara erotîzmê ve gelekî qels e. Dibe kû ev yek tercîheke helbestvan ya civakî û exlaqî be jî. Helbestvan di hemû helbestên xwe de di çar pênc risteyan de cih daye îmajên vê mijarê. Piranî erotîzmeke di nav arezûya evînê de veşartî îmaja erotîzma Bereh pêk tîne.

"lêvên te balêsin hinarkên min" [301]

Lêv, dev, ziman, maçkirin, alastin û mêtin di erotîzmê de cihekî giring dilîzin. Helbestvan dixwaze ku lêvên yara wî, hinarkên rûyê wî bialêsin. Dema alastina lêvên yarê helbestvan wek şekirekî tama xwe bide zimanê yarê û li ser dev û dirênê wê belav bibe. Di vê îmaja erotîzmê de evîndar roleke pasif girtiye ser xwe. Ev rewş bi zaneyî hatiye lidarxistin. Armanca helbestvan yara wî, laşê wî ji dil û can arezû bike.

"serê te dixim nava her du destên xwe
Lêva te mêvanê devê min" [302]

Di vê îmaja Berken Bereh de jî mijara erotîzmê dev û lêv in. Di vê îmajê de helbestvan bi maçkirin an jî alastinê nehatiye ser û xwestiye ku lêva yara wî ji dewê wî re bibe mêvan. Bêjeya "mêvan" îmaj hîn jî ber bi asoyê erotîzmeke derûnî rakişandiye. Mêvanê mirov çawa tên mirov wan maç dike û derbasî hundir dike. Helbestvan dixwaze lêvên yara xwe bi temamî têxe hundirê devê xwe.

"ku lêv digihên hev
li wê tenûra dadayî
ez diçim tewafa

---

[301] Berken Bereh, *Ji Dûriyê re*, Lîs, Diyarbakır, 2013, r. 35.

[302] Bereh, h. b., r. 39.

wî deriyê radayî" [303]

Ev îmaja jorê di nav hemû helbestên Berken Bereh de tenê yek nimûneya erotîzmeke di navbera erotîzm û pornografiye de bêqerar maye. Bereh di vê îmajê de dev û lêvên yara xwe dişibîne tenûreke dadayî û dibêje "dema lêv digihên hev ez diçim tewafa wî deriyê radayî." "Deriyê radayî" îmajeke bimecaz e. Ev gotin ji bo remza ûzvê jinê yê zayendî hatiye bikaranîn û gotineke resen e. Bereh di vê îmajê de nêzîkatiyê li fêma erotîzma Arjen Arî dike, lê divê neyê jibîrkirin ku mîrê erotîzma helbesta kurdî ya bakur Arjen Arî ye.

"laşê te çiyayê bi bager û bahoz, bi berf e
li hinavê min waweyla roja mehşerê
bi zendên te digire û ber bi xwe ve dikişîne" [304]

Berken Bereh di van risteyan de îmaja ku dixwaze ava bike bi hunera teşbîhê dirêse. Laşê yara xwe dişibîne çiyayên biberf û bager. Şibandina laşê jinê bi çiya ne teşbîheke ji rêzê ye. Helbestvan pêsîr û kulîmekên yara xwe şibandiye çiyayên bi berf û bager, lê ev teşbîh bi bangewaziyeke veşartî saz kiriye. Arezûya dilê xwe li hember laşê yarê jî şibandiye waweyla roja mehşerê.

Berken Bereh, hem pir kêm îmajên erotîzmê pêktîne û hem jî îmajên ku ava dike ji aliyê sembolîzmê ve mînakên gelek taybet in. Lewra gotinên xwe bi mecaz û îstîareyên arkaîk dixemilîne û cewhera îmajên vegotina erotîzma helbesta xwe bi hostayetî dinixumîne.

### 1.2.3. Îmajên Erotîzmê di Helbestên Gulîzerê de

Gulîzer, unsûrên laşe jinê ji bo terîfkirina hestên zayendî bi kar tîne û bi awayekî nixumandî îmajên erotîzmeke veşartî saz dike.

“serê pêsîrê wê tim bi hine bûn
amade bûn ji her dawetê re” [305]

---

[303] Berken Bereh, *Xewna Dawî,* Lîs, Diyarbakır, 2016, r. 91.

[304] Bereh, h. b., r. 60.

Pêsîr, di laşê jinan de ji aliyê erotîzmê ve wek hêmayekê zehf hatiye bikaranîn. Di nav gel de wek bêje jî bê bikaranîn hestên şehewî hişyar dike. Di vê risteya jorî de sorbûna dora serê pêsîrê bi hineyê hatiye şibandin. Têkiliya vê yekê jî bi dawetê re hatiye danîn. Weke berbûyên ku diçin dawetê, destên xwe hine dikin. Sorbûna dora sere pêsîrê tiştekî siruştî ye, lê helbestvan vêya bi husna talîleke estetîk bi sedema tiştekî din şîrove kiriye û îmaja "pêsîra dora serî bi hine" welidiye.

"roj, êvarekê di nav her du pêsîrên wê de çûbû ava
bi dû kurtêlên tîrêjan diket"
ji bo roj hilê di paxila wê de" [306]

Roj, di nav çiyayan re diçe ava. Di van risteyên jorî de helbestvan bi îmaja "roj di nav her du pêsîrên wê de çûbû ava" dîmeneke siruştî zeft kiriye. Wek roj di nav du çiyayan re biçe ava. Teşbîheke veşartî di navbera çiya û pêsîran de hatiye sazkirin. Dîsa kurtêlên tîrêjan û hilatina rojê di paxila wê de îmajên surrealîst in.

## 1.3. ÎMAJÊN SIRUŞTÊ

Siruşt bi hezaran sal ji mirovan re bûye mijara meraqê. Siruşt sifreyeke ku tirs, xwestek, kul û keser, hezkirin û hestên din bi hev re çarmêrkî li dora wê rûdinin. Siruşt, xeml û xêza dinyayê ye. Ji aliyekî ve mirovan li hember xweşikiya xwe şaş û metel dihêle, ji aliyekî ve bi bûyerên dersiruştî, tirs û xofê bera nava dilê mirovan dide ji aliyekî ve jî derfetê dide jiyana mirovan li rûyê vê dinyayê. Siruşt bi hemû dewlemendiya xwe di berhemên hunerî de derdikeve pêşberî mirov. Lewra huner bi teqlîda siruştê derketiye holê. Ev meraqa teqlîdê, berê wek hunera wênesaziyê derketiye holê. Piştî wênesaziyê hunerên din jî di paxila siruştê de çavên xwe vekirine. Siruştê ji hunerê re dayiktî kiriye.

Hunera wêjeyê, ne tenê wek wêneyekê li ser siruştê disekine bi saya hunera teşxîs û întaqê ruhekî dide unsûrên siruştê. Siruşt ji bo helbestên pastoral û lîrîkî tamara heyatê ye. Siruşt bi çiyayên rengîn û serî bidûxan, bi çemên keskeşîn û bi

[305] Gulîzer, *Keziyên Jinebî*, r. 22.

[306] Gulîzer, h. b., r. 22.

nalenal diherikin, bi dar û berên rengorengo, bi kûlîlkên mîhrîcana bêhn û rengan, bi ezmanên biberf û baran, bi mij û dûman di wêjeyê de yek ji mijarên sereke ye.

Di helbesta kurdî ya nû de siruşt cîhekî girîng digire. Mijar her çi dibe bila bibe helbestvan, hestên xwe bi îmajên li ser siruştê hatine sazkirin tînin ziman. Helbestvan bi hestyariyeke empatîk di navbera xwe û siruştê de têkiliyekê datîne û li gor nêrîna xwe, li gor hestên xwe siruştê li ser tûala helbestê dineqişîne. Em binêrin helbastvanên kurd yên modern ên bakur, siruştê di nava helbestên xwe de bi îmajên çi rengî tînin ziman?

Îmajên siruştê di helbestên Arjen Arî, Berken Bereh, Fatma Savcî û Gulîzerê de zêde hatine bi kar anîn. Her çar helbestvan jî di îfadekirina hest û ramanên xwe de unsûrên siruştê wek amûreke bingehîn dîtine. Berken Bereh di gelek helbestên xwe de siruştê wek armanc daxilî naveroka helbesta xwe dike. Arjen Arî li gor Bereh di çêkirina îmajên siruştê de qels e. Fatma Savcî helbesta xwe bi unsûrên siruştê dixemilîne lê di helbesta wê de jî siruşt ne armanc e. Gulîzer li gor hêr sê helbestvanên navborî îmajên siruştê kêm çêdike. Di helbesta Gulîzerê de jî îmajên siruştê, îmajên hest û ramanan dermale dike.

### 1.3. 1. Îmajên Siruştê di Helbestên Arjen Arî de

Di helbesta Arjen Arî de siruşt bi hemû halên xwe yên demsalî li ber çavên xwendevanan tê raxistin. Dar û pel, çem û kanî, gul û gîha, çol û çiya bi teşbîh û teşxîsên folklorîk hêzeke teswîrê dide helbesta wî. Çiyayên wî di binê berfê de wek kalên rûsipî çarmêrkî rûniştine û kanî bi kanî vedireşin, zivistanên wî diqefilin, nefela wî dîlanê dike û pîvokên wî dilîrînin. Siruşt, ji helbesta Arjen Arî re wek tûalekê ye. Arî vê tûalê li gor peyam û peywenda helbesta xwe bi awayekî rengîn bi kar tîne.

"navek din e navê kulîlkên nûgihayî
di sojan de her bihar ji agir zayî" [307]

"Ji nû ve zayîna ji agir" a kulîlkên nûgihayî îmajeke surrealîst e. Agir her tiştî bi xwe re dişewitîne lê di vê îmajê de agir wek unsûreke zayînê hatiye teswirkirin.

[307] Arjen Arî, *Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî*, Avesta, Stenbol, 2000, r. 18.

"şer dîne şervan dîne
çarmêrkî rûniştî di bin berfê de
ev çiya ruspî ne heyran" [308]

Zivistan û berf rastiyeke siruştê ne. Li gor peywenda helbestê carna bi xeyalên kêfxweşiyê carna jî bi şert û mercên zehmet tên bîkaranîn. Zivistana giran dema konê xwe yê sipî ji berfê li ser dinyayê vedide, siruşt di binê berfê de dimîne. Siruşt, dema zivistanê dimire û kefenekî ji berfê li laşê wê tê pêçandin, siruşt demekê di nava vî kefênê sipî de li bendî biharê dimîne. Wekî miriyê di qebrên xwe de tevlî kefenên xwe yên sipî li bendî roja heşrê bimînin, siruşt jî li hêviya bihara rengîn dimîne. Di van risteyan de "çiyayên di bin berfê de" bi îmaja kalên şer û şervan dîtine û çarmêrkî rûniştine hatiye teswîrkirin. Şibandina çiyayan bi "kalên li civatan çarmêrkî rûniştine" têra xwe balkêş e. Ev dîmena balkêş, dema berf jî li ser hebe û berf di heman demê de nîşaneya rî û porên sipî be, îmaj ji aliyê tenasubê jî vegotinê dermale dike.

"zivistan jî qufilî bi min re
di pêçeka demê de rojan serê şevan xwar" [309]

Qefilandina zivistanê mubalexeyeke mezin e. Teswîra zivistana zemherî bi şêwazeke nejirêzê hatiye kirin. Pêçeka zarokan heye, lê ya demê îmajeke bi saya teşxîs û îstiareyê pêk hatiye. Rojên ku serê şevan dixwin, ji bo îfadekirina herikandina wext îmajeke afirîner e.

"û çiya kanî bi kanî verşiya" [310]

Baranên biharî li ser çiyayan dibin kanî û rûbarên avên biharî. Arjen Arî ev kanî û rûbarên li ser axa çiyayan diherikin wek verişandina çiyayan nîşan daye. verişandina çiyayan, îmajeke balkêş derxistiye holê.

---

[308] Arî, *Ev Çiya Rûspî Ne*, r. 37.

[309] Arî, *Eroûtîka*, r. 76.

[310] Arî, *Şêrgele,* r. 11.

"bi nefelê re ketin dîlanê
pîvokê lîlîn gîhand cîhanê" [311]

Di demsala biharê de siruşt ji nû ve dizê. Gul û gîha sosin û beybûn hemû unsûrên siruştê ji xewa mirinê şiyar dibin, coşek dikeve jiyanê. Di van risteyan de Arjen Arî, xwestiye vê coşa siruştê bîne ziman. Şeklê pîvokan dişibe xatûnên ser bikofî. Dema pîvok di nav nefelê de şîn dibin û bayê biharê li nefelê dixe mirov bi kilbûna pîvokên nav nefelê dibêje qey xatûnên ser bikofî, di nav dîlanê de xwe kil dikin. Îmajeke bi saya hunera teşxîsê derketiye holê.

### 1.3.2. Îmajên Siruştê di Helbestên Berken Bereh de

Berken Bereh, helbestvanê evîn û siruştê ye. Helbesta wî qîmeta xwe ya estetîkê ji îmajên wî yên rengîn digire. Siruşt bi her halê xwe di helbesta wî de ji xwe re cihekî taybet dibîne. Bereh wek wênesazekî empresiyonîst tabloyên siruştê çê dike. Amûrên wî bêjeyên rengîn in. Siruşt bi arîkariya hunerên teşxîs, întaq, îstîare û teşbîhan di helbesta wî de dibe hêz û bedewiya pênûsê.

"du pelên zuha
bê şerm û heya
rûyê avê maç dikin" [312]

Dar li ser golan an jî çeman bin û demsal jî payîz be pelên daran li ser çem dikevin û wek kelekên biçûk li ser avê derin û tên. Berken Bereh vê dîmena ji aliyekî din dîtiye. Dema ketina pelên darê yê zuha li ser rûyê avê, helbestvan wek ku pel, avê maç bikin şîrove kiriye. Zuhabûna pelan û şilbûna avê, dîmena îmajê xurt kiriye. "Maçîkirin, şerm û heya" kesayetek mirovî daye pelan. Ev yek jî bi saya hunera teşxîs û îstiareya girtî pêk hatiye.

"spîndara bêgore
nexweş nebe gelo

[311] Arî, *Destana Kawa û Azhî Dehaq*, r. 72.

[312] Bereh, *Pandomîm*, r. 9.

di bin berfê de” [313]

Ev îmaj wek kokteyleke hunerên belaxatê ye. Însan gorê dixin pê yan jî nexweş dikevin. Ji vî alî unsûra bihêz însan e û nehatiye gotin. Di vir de îstiareyeke girtî heye. Nexweşiya spîndara yan jî têkiliya wê û goreyê bi saya hunera teşxîsê pêk hatiye. Berken Bereh, helbet dizane spîndar gorê naxin pê û di bin berfê de nexweş nakevin, lê xwe li nezaniyê daniye ev jî hunera tecahula arîfê bi xwe re aniye. Îmajeke xwemal e.

“çiyayê porspî
hêdî hêdî digirî
-êêê kalbûn zor e” [314]

Porsipîbûna çiyayan, ji bo teswîra demsala zivistanê îmajeke rengîn e. Dîsa giriyê çiyayan û kalbûna wan bi hunera teşxîsê hatiye saz kirin. Di naveroka xwe de hunera îstîareyê jî dihewîne. Berfa çiyayan, bi porê kalekî ve hatiye şibandin. Ji vê wêdetir di demên helandina berfê de berfa ser çiyayan hêdî hêdî dihele û ji jorê çiyayan rûbarên avê diherikin. Berken Bereh, ev dîmena jî wek “giriyê çavên çiyê” nişan daye. Li gor helbestvan çawa ku hinek yextiyar dema nêzîkî mirinê dibin ji ber tirsa mirinê digirîn; çiya jî ji ber kalbûnê digirîn. Îmajeke ji aliyê çîroksaziyê ve serkeftî ye.

“bi sinfoniya spîndaran
çem
destmala xwe li ba dike” [315]

Di dawetan de sergovend bi meqamên govendê destmalên xwe li ba dikin. Ev nîşaneya kêfxweşiyê ye. Ev îmaj îlhama xwe ji vê dîmenê digire. Barken Bereh, bayê ku pelê darên sipîndara kil dike û dengê xuşînê wek senfoniyê şîrove kiriye. Çemê ku

---

[313] Bereh*, Pandomîm*, r. 10.

[314] Bereh, *Pandomîm*, r. 10.

[315] Bereh, Pandomîm, r. 21.

diherike û ava wî pêl dide wek destmala di govendê de li ba bibe hatiye dîtin. Bi hunera teşxîs û îstiareyê îmajeke aliyê wê yê dîtbarî bihêz derketiye holê.

"ba û bager birazava
berf û pûk berbû
bi çiyayekî re zewicîm" [316]

Tenasuba di navbera "ba û bager, berf û pûk; birazava, berbû, zewac" û vegotina biteşxîs ev îmaj bixwîn û goşt kiriye. Bi unsûrên siruştê, daweteke îmajan a rengîn hatiye lidarxistin.

"darên xweşik in em
çemên porgijlokî
mexel tê bihar li himbêza dengê me"[317]

Vegotina vê îmajê rasterast ji devê daran ve hatiye kirin. "Axaftina darên xweşik" û "çemên porgijlokî" îmajeke balkêş e. Bi taybet îmaja "çemên porgijlokî" ji aliyê estetîka vegotina îmajê ve hêjêyî gotinê ye. Çem dema diherike li rûyê çem pêl çê dibin. Bereh, çemê bipêl şibandiyê însanekî porgijlok, lê behsa însan nekiriye. Ev hunera îstiareya girtî ye. Bi "mexelhatina biharê" di himbêza dengê dar û çeman de ev îmaja siruştê, ji aliyê vegotina îmajê dewlemend bûye.

"baranên çilesrîn negihîştin miraza xwe
tîna xwe neşikand axa sêwî" [318]

Mirov digihêjin an jî nagihêjin mirazên xwe. "Baranên çilesrîn û miraz" tû têkiliya wan ya maneyî bi hev re tuneye. Nêzîkkirina van bêjeyana deriyê îmajê vekiriye. Sêwîbûna axê û tînşikandina wê bi saya hunera teşxîs û îstiareyê pêk hatiye.

"stêrkek bixurice nalîna wê dibihîzim

[316] Bereh, *Pandomîm,* r. 30.

[317] Bereh, *Pandomîm*, r. 52.

[318] Bereh, *Pandomîm*, r. 94.

orîniya dara ku tê birrîn li daristanekê” [319]

Empatiya di navbera mirov û siruştê ji bo afirandina îmajên balkêş derfetên berfireh dide helbestvanan. “Nalîna sitêrkên dixuruce”, “orîniya darên tên birîn” nimûneyên vê empatiyê ne. Sitêrkên dixurucin cih û warên xwe terk dikin. Berken Bereh wek mirovekî cih û warê xwe terk bike û xemgîn be ji ber xemgîniya xwe binale “sitêrka xurucî” nalandiye. Dema dar, bi birrekê an jî bi xîzarê tên birîn, dengek derdikeve. Helbestvan ew deng jî şibandiye orîniya serjêkirina mirovekî, lê ev şibandin ne bi riya teşbîhê bi riya îstiareya girtî pêk hatiye.

“pinpinîka şeyda
ketiye pey şûhla gulê
bê lome” [320]

Ev îmaj, bi zimanê jinên li ser kaniyan an jî li ser tenûran lomê xwe dikin hatiye sazkirin. Wesifkirina pinpinîkê bi şeydabûnê û şûhletiya gulê, hunera teşxîsê ye. Qalibên zimanê axaftinê û estetîka vegotina îmajê, bi hostetî hatiye bênderkirin û vê îmaja siruştê bi xwendevan re hatiye ragihandin.

"ku bager û bahozan dirêsa teşiya emrê me
payizok û heyranokan çîroka me vedigot" [321]

Di van risteyên jorê de sê îmaj hene. Teşiya emir, rêsandina teşiya emir bi destên bager û bahozan û çîrok gotina payizok û heyranokan. Bager û bahoz bayên ku toz û pelan di nav xwe de zîz dike. Teşî jî dema hiriyê dirêse li dora xwe zîz dibe. Berken Bereh dixwaze bibêje ku her sal ev dîmenên ku di jiyana me de derbas dibin wek teşiyê emrê me dirêsin. Ev îmaj bi giştî bi saya teşxîs û mecazê hatiye lidarxistin.

"şev û roj şûrên xwe disûn

[319] Bereh, *Dilê Min Palgeh e Ji Işqê re*, r. 232.

[320] Bereh, h. b., r. 382.

[321] Beken Bereh, Xewna Dawi, Lis, Diyarbakır, 2016, r. 23.

bo biqelêşin zikê min" [322]

Wext, kujerê mirov e. Her mirovê li ser rûyê dinyayê bi borandina demê dê biçe ser dilovaniya xwe. Tav û heyv ango şev û roj bera ser pişta hev didin û hespên wext bi çargavî dibezin. Di vê risteyê de Bereh dibêje ku wext şurê xwe tûj dike dê rojekê bê û zikê min biqelêşe. Hebûna vê îmajê deyndarê hunera teşxîsê ye.

"stêrk li esmên melûl, piştxûz
heyv dilerize ji qêrîna min" [323]

Îmajên melûlbûn û piştxûzbûna stêrkan bi hunera teşxîsê hatine lidarxistin. Helbestvan dibêje "heyv dilerize ji qêrîna min" ev îmaj jî bi hunera mubalexeyê hestên helbestvan bi xwîn û goşt dike. Mirov pîr dibin pişta wan xûz dibe. Di vê îmajê de Berken Bereh stêrk wek pîrên piştxûz nîşan daye, lê behsa pîran nekiriye. Ji ber vê yekê îstîareyeke girtî jî peywenda îmajê ji aliyê vegotinê dermale kiriye.

"bajar dikuxe di xewa şîrîn
heyv xatir dixwaze ji çemî" [324]

Helbestvên di vê îmajê de kesayetek daye bajar û heyvê. Hunera teşxîsê di çêkirina vê îmajê de roleke giring lîstiye. Îmaja "kuxuka bajar ya di xewa şîrîn de" bajar wek mirovekî nişan dide, lê unsûrê ji aliyê kuxukê ve bihêz însan e nehatiye gotin. Lewra di vir de îstîareya girtî heye. "Xatirxwestina heyvê ji çem" çem wek mirovekî teswîr dike. Di vê îmajê de jî îstîareya girtî heye. Ji aliyê xatirxwestinê ve unsura bihêz însan e, ev unsur nehatiye gotin.

Berken Bereh, hin îmajên siruştê ji bo hest û ramanên xwe baştir nişan bide bi kar aniye, lê hin îmajên wî yên siruştê rasterast ji bo îfadekirina xweşikiya siruştê wek armac derdikevin pêşberî me. Bereh helbestvanekî lîrîk û pastorela e. Gelek helbestên wî dişibin tabloyên siruştê. Îmajên siruştê piranî bi teşxîs, mecaz, teşbîh û îstîareyan pêk tîne. Siruşt ji bo Berken Bereh hêlîna helbestê ye.

[322] Bereh, h. b., r. 27.

[323] Bereh, h. b., r. 30.

[324] Bereh, h. b., r. 81.

### 1.3.3. Îmaja Siruştê di Helbestên Fatma Savciyê de

Siruşt, ji bo îmajinasyona Fatma Savciyê hêzeke arîkar e. Savcî, siruştê ji îfadekirina hest û ramanên xwe re wek hêzeke lokomotîf dibîne û gelek unsûrên siruştê bi îmajên karîger di nav konteksa helbesta xwe de bi cih dike. Îmajên siruştê di gelek helbestan de şahîdiyê ji Savciyê re dike û bandora gotinên Savciyê yên di derheqê rastiyê de zêde dike. Çiyayên Savciyê bi zimanê agir dipeyivin, şeveqên wê bizdok in, payizên wê di nav kulîlkên li ser kirasekî dixeniqin, agirên devliken dêmên ezman radimûsin, hespên ji mijê dibezin, pêlên çêmê wê ji çirûskên kederê ne. Di payizên koçber de xunava hestên wê bi ser darên zerî zêrîn de dibare.

"çiyayên ku bi zimanê agir dipeyivin" [325]

Çiya bipeyive jixwe ev îmajek e. Ji ber ku di vê cure vegotinê de hem teşxîs û hem jî îstiareya girtî heye. Ji aliyê gotinê ve yê ku bihêz e însan e, lê însan nehatiye gotin. "Axaftina çiyayan bi zimanê agir" îmajeke têkûzkirî ye. Ligel ku îmajeke siruştê ye; di peywenda şer û pevçûnê jî dikare bê şîrovekirin.

"dengê çivîka vedimire
di şeveqên bizdok de" [326]

Lêkera vemirandinê ji bo agir, qendîl, çira, lempeyan tê bikaranîn, lê bikaranîna wê ji bo dengê çivîkan ji rêderketina axaftina rojane ye. Mirov bizdonek dibe, lê bizdonekiya şevê îmajeke xwemal e. Bi vê îmajê Fatma Savciyê xwestiye ew dema kurt a şeveqê bi awayekî "eceleya wê hebe û bipengize biçe" nişan daye. Dîsa teşxîs û îstiare ji vê îmajê re bûne wesîle.

"hîna sergovend im li dîlanên "cinê çiya"
yê ku bi stranên siruştê bardewam in" [327]

[325] Savcî, *Gulên Qasid*, r. 13.

[326] Savcî, h. b., r. 50.

[327] Savcî, h. b., r. 55.

Çiya, çavkaniya gelek tişta ye. Tirs û xof, bilindî, azadî, bedewiya siruştî, warê mehkûmên firarî û hwd. Di çîrokan de gelek tişt li ser çiyayan diqewimin. Çiyayê Qaf'ê di mîtolojiya gelek gelan de heye. "Dîlana cinên çiya" û sergovendiya helbestvan di vê dîlanê de li ber strananên siruştê îmajeke mîtolojîk e.

"payiz li ser kirasê wê
li nav wan kulîlkên biharê
dixeniqe" [328]

Payîz, yextiyariya siruştê ye. Siruşt, êdî ber bi mirinê ve diçe. Dar, pelên xwe diweşînin. Gul û gîha diçilmisin. Eger li ser kirasê yarê kulîlkên biharê hebin, payîz jî van kulîlkan bibîne payîz, ji hesûdiya xwe di nav wan kulîlkên biharê de li ser kirasê yarê, ji qehra dixeniqe. Bi saya serê teşxîs û îstiareyê îmajeke xwemal derketiye holê. Di navbera kulîlkên biharê û xeniqandina payizê di nav van kulîlkan de dijberiyek jî heye. Ev dijberî, sihêmiya îmajê berfireh dike.

"tiştekî zêde naxwazim
tenê stêreke pêketî têxe destên min" [329]

Sitêrkeke pêketî gelek caran ji dinyayê mestir e. Di şeveke tarî de sitêrkeke pêketî, rewşa siruştê ye. Fatma Savcî, bi gotina "tenê sitêrkekê dixwazim" wekû tiştekî pir biçûk xwestibe xwe nîşan daye. Ev tecahula arîf e. Di nava vê îmajê mubalêxeyeke mezin jî heye.

"li keviya helbesteke xunavî
agirekî devliken dêmên ezman radimûse
li dora wî hespên ji mijê" [330]

"Helbesta xunavî" dîmeneke rengîn e. Eger "agir, devliken be û dêmên ezman ramûse" wek yareke bicoş rûyê hezkiriyê xwe maçî bike, ev îmajeke nedîtî ye. Îmaja

[328] Savcî, *Bîra Birînê*, r. 13.

[329] Savcî, h. b., r. 40.

[330] Savcî, h. b., r. 43.

“hespên ji mijê”vegotineke xwemal e. Di nava îmajên mijê de ji aliyê xwemaliyê ve dikare cihekî taybet bigire.

“ev Dîjleya han
çavê me yên belek in
pêlên xwe yên ji çirûskên kederê
bi ser milên deştê ve dadiweşîne “[331]

Pêlên avê ji çirûskan be ev dijberiyekê derdixe holê. Tezadeke bi mubalexe… Ev çirûsk, yên kederê bin ev bi saya hunera îmajê ye. “Milên deştê” îstiareyekê dihewîne û ev îstiareya girtî li ser hîmê teşxîsê bilind bûye.

“xunava hestên min
Di payizeke koçber de
Bi ser guliyên darên zerî zêrîn de dibarîne” [332]

“Xunava hesta”, “payiza koçber”, “guliyên dara” îmajên bimecaz, biîstiare û biteşxîs in. Carna hestên mirov, zêde tevlihev in û di bin giraniya van hestên curbicur cihekî revê jî tuneye. Evîn, cudahî, hesret, kul û keserên jiyanê, mirin, xemgînî ji her alî ve wek baranekê bi ser mirov de dibarin. “Xunava hestan” ji bo vê dîmena razber, şênber bike hatiye bikaranîn. “Payîza koçber” ji bo anîna ziman ya demdemiya jiyanê hatiye hilbijartin. Di nav bêjeyên baran, payîz, dar û guliyan de hunera tenasubê heye. Ev yek jî peywenda îmajê têkûz kiriye. Fatma Savcî, di sazkirina îmajan de bi hostetiyeke nazenîn ji unsûrên siruştê sûd werdigire.

### 1.3.4. Îmajên Siruştê di Helbestên Gulîzerê de

Helbestvana jin Gulîzer, di çêkirina îmajên siruştê de orîjînalîteyê esas digire. Gulîzer, di navbera psîkolojiya xwe û rewşên siruştê de empatîyekê saz dike, kul û keserên dilê xwe bi siruştê re parve dike. Di tenêtiyeke nava mirovan de siruşt ji wê re dibe hevaleke li her sirên wê guhdarî dike û tu caran sirên wê eşkere nake, siruşt ji

331 Savcî, h. b., r. 63.

332 Savcî, *Xewnên Zîvîn*, r. 21.

bo Gulîzerê her daîm rêhevaleke ketûm e. Di risteyên jêrê de mînakên vê hevaltî û empatiyê baş xuya dibe:

“ezman her danê êvarê
xwe bera nava min dide
ji pêlikên dilê min” [333]

Ezman, di helbestê de bi her awayî gelekî cih digire. Bi şevên xwe yên tarî, bi heyv û stêrkên xwe, bi berf û baranên xwe, bi ewrên xwe yên tewlotewlo bi mij û dûxan bi tav û tofanên xwe di helbesta kurdî ya nû de cihekî girîng digire. Her çiqas helbestvan Gulîzer gotibe ezman jî wer xuya dike mebest ji ezman, tariya şevê ye. “Daketina ezman ya dil” jixwe îmajeke bedew e, lê “daketina ezman ji pêlikên dil” bi vegotina teşxîs û îstiareyê û hinek jî mubalexeyê îmaj dewlemendtir kiriye.

“Ne jî hûn li bin baranên ji agir geriyan” [334]

“Baran” ji bo helbestê wek kadîna îmajan e. Bi hezaran îmaj li ser baranê hatine saz kirin. Di vê risteya de helbestvan baraneke ji agir xeyal kiriye. Tesewûra barana ji agir, bi saya hunera tezadê hîn xurttir bûye. “Av û agir” wek zarokên du dujminên bav û kalan bi hev re zewicîne û di vê îmajê de dîmeneke hêja derxistine holê.

Gulîzer, di çêkirina îmajên siruştê de weke gelek helbestvanan ji hunerên teşxîs, îstîareya girtî, mecaz û teşbîhan sûdewar e, lê divê neyê jibîr kirin ku siruşt di helbesta Gulîzerê de ne tenê armanca teswîrê ye. Siruşt, weke amûrekê ji ragihandina hest û ramanan re arîkariyê dike û dibe parçeyekî çêker yê îmajên resen.

### 1.4. ÎMAJÊN XERÎBÎ / BÊRÎKIRIN Û HESRETÊ

Xerîbî, bêrîkirin û hesret di helbesta kurdî ya nû de temayeke muhîm e. Gelek helbestvan mijara wan çi dibe bila bibe di nav risteyên helbestên xwe de cih didin îmajên xerîbiyê. Li welatên biyanî mirov xwe her dem sêwî hîs dike. Kesên ku li deverên biyanî dimînin wek sêwiyên kabjêçûyî belengaz belengaz digerin. Li

[333] Gulîzer*, Şevname*, r. 12.

[334] Gulîzer, *Bûka Baranê*, r. 24.

dengekî digerin, li rengekî digerin, li kesekî zimanê wan dizanin digerin. Xerîbî nenaskirina kes û der û doran e. Dema yekî xerîb li kuçe û kolanên welatên biyanî digere ji her kesî re xerîb e. Wek şevşevkekê li nav însanan digere. Îhtîmala silavdayîna heval û hogirekî jî tuneye. Kesên ku li gundê xwe li ser axa xwe dijîn, nizanin di jiyana wan de wê rûpelekî xerîbiyê vebe û berê wan têkeve welatên biyanî.

Her çiqasî xerîbî zehmet be jî carna wek deriyê xelasbûnekê ji şert û mercên nebaş tê dîtin. Kelecanekê, hêviyên nû, muphemiya paşerojê bi xwe re tîne Kesên ku ji axa xwe, ji welatê xwe, ji hezkiryên xwe dûr dikevin xerîb dibin. Ev xerîbî, bi xwe re tênêtiyê, rêwîtiyê, xizaniyê, penaberiyê, xemgîniyê tîne. Terkkirina cih û waran wek birîneke xedar bi xerîban re dere her deverê û li kîjan deverê bin dema behsa welatê wan tê kirin, xwîn ji vê birîna wan a xedar dinizile.

Kurd ji ber şert û mercên siyasî li gelek deverên cîhanê belavbûne. Qaçaxî, sirgûnî, penaberî, pirsgirêkên diyasporayê di helbesta kurdî ya nû de cihekî girîng digire. Helbestvanên kurd ên modern ji gelek aliyan ve nêzîkî vê temayê bûne. Xerîbiya kesên ku ji welatên xwe veqetiyane, xerîbiya kesên sirgûnkirî, xerîbiya firarîbûnê an jî mehkûmbûnê, xerîbiya di nava bajarên mezin û hwd. Em binêrin bê di helbesta kurdî ya nû de helbestvanên ku me mijara teza xwe bi berhemên wan yên helbestê sînor kiriye çawa nêzîkî vê mijarê bûne û îmajên bi çi rengî saz kirine?

### 1.4.1. Îmajên Xerîbî / Bêrîkirin û Hesretê di Helbestên Arjen Arî de

Arjen Arî, xerîbiyê di peywenda evînê de dinirxîne, lê carina mijarên helbesta Arî, wî ber bi qada xerîbiya civakî û siyasî dikişînin, teşbîhên belîx û teşxîs îmajên Arî di warê bilêvkirina xerîbiyê de tekûz dike.

"şev diçin û tu tê
Keriyek mozqirtk e dûrî
Zilqitk zilqitk bi dil vedide" [335]

Şibandina duriyê bi keriyek mozqirtk îmajeke gelekî xwemal e. Êş û keserên dûriyê dramatîze dike. Bêçaretiyê jî baş tîne ziman. Ev îmaj, xerîbî bi xwîn û goşt kiriye.

[335] Arî, *Eroûtîka*, r. 81.

“min daye dû her du lingên xwe
bêhna nefiyekê tê ji vî bajarî” [336]

Lingên mirov derin ku laşê mirov jî di heman demê de diçi wê deverê. Ne pêkan e mirov bide dû lingên xwe. Di vê gotinê de maneyeke veşartî heye. Ew jî bêdiliya mirov ji bo çûyînê ye. Ji ber şert û mercên xedar revek heye, ling, ji bo xelaskirina laş direvin. Rev ber bi xerîbiyê ye. Ji ber vê yekê laş naxwaze biçe. Dayîna pey her du lingan kûrahiya xwe ya îmajê ji vir digire. Ji bajar bêhna sirgûniyê bê, ne elameta xêrê ye. Ew bêhn, bêhna kuştinê ye.

Arî di çêkirina îmajên xerîbiyê de ne zêde çalak e. Temaya xerîbî / dûrî û hesretê di helbestên wî de kêm xuya dibe, lê îmajên ku hene ji aliyê estetîka helbestê ve îmajên gelek xwemal in.

### 1.4. 2. Îmajên Xerîbî / Berîkirin û Hesretê di Helbestên Berken Bereh de

Berken Bereh di helbestên xwe de temaya xerîbiyê bi îmajên sihêm li ber çavên me radixe. Teşbîhên rengîn û teşxîsên resen îmajên Bereh ên li ser xerîbiyê dermale dikin. Bereh di navbera unsûrên siruştê û derûniya xwe de têkiliyên empatîk saz dike û îmaja xerîbiyê hîn bêtir dramatize dike. Wek mînak: stêrkên wî penaber in, kesên xerîb wek şervanekî bêrext û fîşek dibîne, kesên xerîb li gor wî dişibin masiyên ji behra xwe dûrketî û heta deriyê wî ji bayên xerîb re girtî ye.

“ez stêrkekî penaber im li vê pesarê
şervanekî bêrext û fîşek
masiyê ji behra xwe dûrketî” [337]

Sitêrk pir dûrî dinyaya me ne. Berken Bereh ev dûrbûnî, bi îmaja “stêrka penaber” aniye ziman. Dîsa teşxîs û îstiareyê destê xwe dane hev û bûne hosteyê îmajeke rengîn. Di risteya diduyan de xerîbî bi awayekî zelal û sihêm li ber çavan hatiye raxistin. Xerîb bi masiyên ku ji behra xwe dûrketî hatiye şibandin. Halê kesên xerîb, wek halê masiyekî ji ava xwe dûrketî ye.

[336] Arî, *Ev Çiya Rûspî Ne,* r. 43.
[337] Bereh, *Pandomîm,* r. 96.

“deriyên min girtî ye ji bayên xerîb re
min tirsa mirinê jî avêt ji ser xwe” [338]

Helbestvan ew qasî ji xerîbiyê aciz e ku tehemûla wî êdî ji bayên xerîb jî re nemaye. Tirseke mirinê jî tirsa tenêbûn û tariyê ye, lê Berken Bereh ew tirs jî ji ser xwe avêtiye. Ji ber vê yekê tirsa wî ji tenêbûn û tariyê nemaye. Helbestvan dixwaze bi vê îmaja jor vê peyamê bide xwendevanan ku mirin (mezel) ji xerîbiyê çêtir e. heya ku dê bayê xerîb bê hundur bila derî girtîbe çêtir e. Kesên ku demeke dirêj li xerîbiyê dimînin û ji jiyana biyanî firar dikin, li welatên xwe vedigerin; ji xerîbiyê pir ditirsin. Tirsa ku berê wan dîsa têkeve rêyên xeribiyê di dilên wan de zîl dide.

"gund kerr, bajar kerr, şev rawestyayî
hiş penaber û dil di taya işqê de dîl mayî" [339]

Di van risteyên jorê de rêze teşxîsek heye û gund, bajar, şev, hiş û dil hatine teşxîs kirin. Di heman teşxîsan de îstîareya girtî jî heye lewra ji aliyê van teşxîsên mezkûr hemûyan ve unsura bihêz însan e, lê însan nehatiye gotin. Penaberbûna hiş, îmajê ji aliyê mijara xerîbiyê dermale dike. Mirov penaber dibe, lê hişê mirov penaber be ev tê wê maneyê ku penaberî ji vî kesî re bûye pirsgirêkeke derûnî. Êdî penaberî tu elaqeya wê bi sînoran û bi erdnîgariyê re nemaye.

"ji roja ji qewmê xwe hatim bidûrxistin
min dilê xwe avête nava arê cehenemeyê" [340]

Dûrbûna ji xaka bav û kalan û qewm û eşîran însan şerpeze dike. Mirov heyirmayî dimîne û carina jî hêviya xwe jiyanê winda dike. Xerîbî dibe birîneke xedar û êşa vê birînê her dem dilê mirov disojîne, diperitîne. Di van risteyên Berken Bereh de ev dilsojandin bi îmaja "avêtina dil ya nav arê cehenemeyê" şênber bûye. Mecaz û mubalexe ji vê îmaja xerîbiyê re hostetî kirine.

---

[338] Bereh, *Dilê Min Palgeh e Ji Işqê re*, r. 295.

[339] Berken Bereh, *Ji Dûriyê re*, Lîs, Diyarbakır, 2013, r. 16.

[340] Bereh, h. b., r. 17.

"niha hemû dengên ku ji dûr tên wekû tu bi vedixim
lingên min li devî û dirriyên payîzekê dilikumin." [341]

Li bajarên xerîbiyê mirov, bêriya welatê xwe, çanda xwe, qewmê xwê dost û hevalên xwe dike. Bi ser de jî mirov evîndar be û ji evîna xwe dûrbikeve agirê xerîbiyê hîn bêtir hundirê mirov diperitîne. Mirovên xerîb, bêriya deng û rengê jiyana xwe ya berê dikin. Di van risteyan de jî Berken Bereh bi îmaja "vexwarina dengan bi qesta yarê" xerîbiyê baş dramatize dike. Bêjeya payizê peywenda îmajê tekûz kiriye. Ji aliyê vexwarinê ve av bihêz e û nehatiye gotin ji ber vê yekê hunera îstîareya girtî ji mecazê re hevaltiyê dike.

"yê ku li dû xwe bêrîkirinê geş neke
keskesor venabe li asoyê wî
piştî baranên agirîn" [342]

Bêrîkirin maneya xerîbiyê kûr dike. Helbestvan di risteyên jorê de balê dikêşe ser maneya bêrîkirinê û dibêje: "Bêrîkirin geş bibe keskesor dê vebe li asoyê wî, piştî baranên agirîn." Di van risteyan de îmaja "baranên ji agirîn" xerîbiyê baş tîne ber çavan. Dema mirov li bajarekî an jî li deverekê xerîb be, sirgûn be baranê wê derê jî ji mirov re xerîb tên. Baran li şûna ku dilê mirov aram bike mirov dibêje qey ji ezmanan agir bi ser serê mirov de dibare. Mecaz çêkerê vê îmajê ye.

"perçema te daristaneke di çavên min de
di guhên min de bahozek min bêriya te kiriye" [343]

Dûrketin, di hişê însan de rastiya jiyanê mezintir dike. Tiştên ku mirov dûrî wan dikeve ji mirovan re hîn xweşiktir, hîn baştir, hîn biqîmettir tê. Di van risteyan de perçema yarê ji helbestvan re wek daristanekê xuya dibe. Hunera mubalexeyê hêza îmajê pirtir kiriye. Bahoza ku dengê wê li ber guhê helbestvan tê gotineke bimecaz e, xirecira hest û ramanên xerîbiyê şênber kiriye.

---

[341] Bereh, h. b., r. 27.

[342] Bereh, h. b., r. 46.

[343] Bereh, h. b., r. 67.

Berken Bereh Di helbestên xwe de temaya xerîbî / dûrî û hesretê wek temayeke bingehîn bi kar aniye û gelek îmaj li ser esasa vê temayê çê kirine. Ji aliyê vê temayê ve helbesta Berken Bereh li gor helbesta Arjen Arî hîn dewlemendtir e.

### 1.4.3. Îmajên Xerîbî / Bêrîkirin û Hesretê di Helbestên Fatma Savciyê de

Fatma Savciyê di helbestên xwe de psîkolojiya mirovên xerîb, bi îmajên sergirtî tîne ziman. Her çi qasî di gelek helbestên wê de şopên xerîbiyê û bêrîkirinê hebin jî di kêm risteyên xwe de rasterast cih daye îmaja xerîbiyê. Çûyîn, dûrî, hesret, bendemayîn, nehatin, derd û kulên dil ji îmajên xerîbiya Fatma Savciyê re jêrzemînekê ava dikin.

"çûyîn
di destê min de
xeydek ji kulîlka sedefê ye" [344]

Xerîbî carina ji mecbûrî ye carna jî ji nazdarî ye. Ku mirov ji hezkiryên xwe bixeyide ji bo qîmetê xwe pê bide zanîn dixeyide, bi ber deverên dûrdest diçe. Fatma Savciyê di van risteyên jorî de bi teşbîheke xwemal çûyîn şibandiye kulîlka sedefê. Di nav îmajên xerîbiyê de wek îmajeke estetîk derdikeve pêşberî mirov. Hunera mecazê derî ji îmajê re vekiriye.

"ew ez bûm
ya ku dibû kulistan
ji jana gulên bêwar re" [345]

Bêwarbûn, di van risteyana de wek êşeke dijwar tê nîşandayîn. Hetta gulên bêwar jî belengaz in. Her çiqasî ji derve cihê gulên bêwar wek gulîstanekê xuya bibin jî helbestvan ji ber jana gulên bêwar xwe wek kulistanekê dibîne. Di nezera helbestvan de tu ferqa gulên xerîb ji xweliyê tuneye. "Gulîstan û kulistan" lîstikeke bêjeyan e ku îmaja di van risteyan de ji aliyê maneyê ve dewlemend kiriye.

---

[344] Savcî, *Bîra Birînê,* r. 23.

[345] Savcî, Xewnên Zîvîn, r. 47.

Fatma Savciyê mijara xerîbiyê carna wek xerîbiyeke takekesî carna jî wek xerîbiyeke civakî dinirxîne. Di helbesta Savciyê de gelek remz hene ku li gor peywenda helbestê dikare bi maneya şexsî jî bi maneya civakî jî bê şîrovekirin. Ev yek helbesta Savciyê ji aliyê alegorîk ve dike helbesteke pir tebaqeyî.

### 1.4. 4. Îmajên Xerîbî / Bêrîkirin û Hesretê di Helbestên Gulîzerê de

Xerîbî di helbesta Gulîzerê de temayeke bingehîn e. Îmajên Gulîzerê ên xerîbiyê bi agirê hesretê geş dibin. Hesreta yan jî dûrketina ji şexsekî, ji evîndarekî bêtir derdikeve pêşberî me. Xerîbî ne tenê çûyîna devereke dûr an jî dûrketina ji cih û warên bav û kalan e. Di jiyana mirovan de kêmasiya kesekî taybet jî mirov xerîb dike. Gulîzerê piranî îmajên xerîbiyê di peywenda evînê de dinirxîne û bi hestyariyeke romantîk, bi teşbîh, teşxîs, mubalexe, tecahula arîf û husna talîl îmajên xerîbiyê saz dike.

"nizanim kîjan biharê veşartiye hatina te
bi tenê agirê hesretê di dil de vêketiye" [346]

Hezkirî li bendî roja gîhaştinê ne. Dûrketina hezkiriyan ji hev, di nava wan de agirê hesretê pêdixe û dilê wan disoje. Di van risteyana de helbestvan Gulîzerê hatina bi tecahula arîfaneyekê xwe nezan hesibandiye û gotiye "kîjan biharê te veşartiye." Bihar tên û diçin. Bi hesreta kesekî re tu eleqeya wan tuneye, lê helbestvan ji bo nehatina hezkiriyê xwe kirasek fesilandiye.

"min termê porê xwe yê ji ber çûyîna te maye
bi ava çil bajarên dûr şûşt" [347]

Hezkiryê bixezeb ji hev hez dikin, dema ji hev diqetin êşek mezin dikişînin. Hezkiryên jin, ji ber jana evîna dilê xwe û birîna dûrketinê porê xwe dirûçikînin. Xwe kur û kem dikin. Ev porê ku bi destê xwe dikişînin û ji serê xwe dikin, helbestvan bi ava çil bajarê dûr şuştiye. Hêvî kiriye ku di nav ava wan çil bajaran de avekê ji ava bajarê hezkiryê wê hebe. Îmajeke bi mubalexe ye. Di vegotina termê por

[346] Gulîzer, *Keziyên Jinebî*, r. 29.

[347] Gulîzer, *Bûka Baranê*, r. 17.

de jî teşxîs û îstiare heye. Helbestvan kesayetek daye por û ev yek jî dramatîzasyona helbestê bilindkiriye. Îmajeke çîroksaziya wê li ser hîmê hezkirin û hîskirina demên kevnare hatiye avakirin.

“çavên guliyên min
ji bendemayinan sor bûne
ma nebû tu werî” [348]

Dîsa Gulîzerê di vê risteyê de kevirê bingeha îmajê li ser por û çûyinê amade kiriye. Ev îmaj ji aliyê manenasiyê ve îmajeke pirtebaqeyî ye. Çavên guliyan vegotineke bi hunera teşxîs û îstiareyê pêkhatiye. Porên hinekirî, dema wext di ser de derbas dibe û ji binî ve dirêj dibe rengê esas yê por derdikeve holê. Ew rengê hineya sor jî li serê guliyan dimîne. Helbestvan ev sorbûn weke sorbûna çavan nişan daye. Sedema hinenekirina por jî dûrbûna evîndar e. Dema hezkirî dûr be yara wî di şunê de ye û di matemê de por hine nabe. Ji ber vê yekê hinna berê, hatiye heta serê por. Îmajeke bi husna talîl e jî.

“digot ez im ba, ez im baran
li wî bajarê biyanî
bi dû ewran dikevim
têm
hûr hûr dibim
li ser te dibarim
ji hesreta bêhna porê te” [349]

Di van risteyana de jî Gulîzerê li ser hesreta por sekiniye. Bi peyketina ewran û talî wek baranê li ser evîndaran barîn, îmajeke balkêş e. Di agirê hesreta xerîbî û dûrdestiyê de dema evîndar nikare bigihêje hezkiriya xwe, çareyeke çîrokî ji xwe re peyda dike. Hey nagihêje yarê qet nebe bila bibe baran û li ser yarê bibare. Ev jî cureyeke wûslatê ye. Îmajeke fiktîf e.

[348] Gulîzer, h. b., r. 20.

[349] Gulîzer, h. b., r. 30.

"kenê zarokekê ji bexçeyên dilê min kêm dibe
her cara ku tu ji min dûr dikevî" [350]

Ji ber çûyîna yarê "kêmbûna kenê zorakon li bexçeyê dil" îmajeke li ser hunera mecazê ava bûye. Dil û bexçe dû bêjeyên ku tu peywenda wan ya maneyî bi hev re tuneye. Nêzîkkirina van her dû bêjeyan û lêzêdekirin an jî kêmkirina kenê zarokan îmajê dermale dike.

## 1. 5. ÎMAJÊN TENÊTIYÊ

Di helbesta kurdî ya nû de mijara tenêtiyê, mijareke sereke ye ku helbestvanan di helbestên xwe de gelek caran behsa wê kirine. Tenêtiya fîzîkî, tenêtiya ruhî, tenêtiya xerîbiyê, tenêtiya sirgûniyê, tenêtiya di nava însanan de çend cureyên tenêtiyê ne. Kîjan cure tenêtî dibe bila bibe helbestvanan, mijara tenêtiyê bi metaforên kul û keser, xemgînî, acizî, diltengî û bêhntengiyê anîne ziman.

Însan, di malzaroka dayika xwe de tenê ye û di qebra tarî de jî tenê ye. Ev cure tenêbûn, ji mecbûrî ne, lê dema di nav jiyana rojane de û di nav qerebalixa însanan de mirov tenêbûna qebrê bikişîne ev rewşa, mirov aciz û xemgîn dike. Tenêtî jî bi îmajên sar, tarî, tengî, girî, di nav çîroksaziya helbestê de ji xwe re cih dibîne û helbestê ji aliyê maneyê ve dermale dike. Xwendevan bi saya vê dermalekirinê hîn hêsantir dikeve atmosfera mijara sereke ya helbest pê hatiye sazkirin.

Tenêtî, cewhera îlhama helbestvan e. Gelek helbest di bin barana îlhama tenêtiyê de hatine nivîsîn. Tenêtî carna serbixwe di helbestê de wek mijareke bingehîn jî derdikeve pêşberî mirov. Di helbesta klasîk, a gelerî û a modern tev de helbestvanan ji vê mijarê zehf sûd wergirtine. Di helbesta kurdî ya nû de jî helbestvanan ev mijara sereke gelekî bi kar anîne. Em binêrin di risteyên jêrî de helbestvanên ku me mijara teza xwe bi wan re sînor kiribû vê mijara kaniya îlhamê, bi çi awayî bi kar anîne?

Di helbesta kurdî ya nû de temaya tenêtiyê ji aliyê gelek helbestvanan ve hatiye bi kar anîn. Di çarçoveya mijara vê xebatê de temaya tenêtiyê herî zêde ji aliyê Berken Bereh ji bo îmajan hatiye bi kar anîn. Fatma Savcî û Gulîzerê di vê temayê de kêm îmaj çê kirine. Arjen Arî di temaya tenêtiyê de qels e, di helbestên

[350] Gulîzer, h. b., r. 69.

Arî de temaya tênêtiyê bi gotinên bê îmaj di çend risteyan de derkevin pêşberî me jî Arjen Arî wek îmaj li ser tenêtiyê nesekiniye.

### 1.5.1. Îmajên Tenêtiyê di Helbestên Berken Bereh de

Berken Bereh, di helbestên xwe de bi awayekî berbiçav li ser mijara tenêtiyê disekine. Tenêbûneke fîzîkî û hest û ramanên bi vê tenêbûnê re tên, îmajên wî yên li ser vê mijarê dermale dikin. Bereh, ûnsûrên siruştê ji bo îfadekirina tenêbûna xwe bi armanca ku derûniyeke empatîk bide helbestê bi kar tîne. Di helbesta Bereh de hunerên teşxîs û întaqê di çêkirina îmajên tenêtiyê de zêde derdikevin pêş. Helbestvan ew qas tenê ye ku marek jî tuneye sebra xwe pê bîne, sîsirkên wî ji guhanên şevê tenêtiyê dimêjin, ji çiyayan dipirse "Gelo hûn ji tenêbûnê aciz nabin?" Tenêtî, keziyên birîna wî dihûnin, dema kes nere mala wî, deriyê dilê wî ji kêfxweşiyê re girtî dimîne, li deşta tenêtiya wî ya devzirav xunavsitêrk dibarin.

"li vir qijakek
marek jî nema
ku sebra xwe pê bînim" [351]

Mirov di tenêtiyê de ew qasî aciz dibe, dixwaze tiştek hebe ku pê sebra xwe bîne. Ev tenêtiya fîzîkî bandoreke mezin li ser mirov dike. Mirov li dengekî, li bêhnekê, li lebatekê digere. Di risteya jorî de Berken Bereh ji tenêtiyê gazinan dike. Di nav peywenda van gazinan de mar û qijakek jî tuneye ku mirov sebra xwe pê bîne. Mar, dujminê însan e, lê di van risteyan de helbestvan dibêje: "Xwezî marek heba û vê tenêtiya min tuneba." Mirovê ku ji bo tenêtiya xwe ji bîr bike sebra xwe bi mar bîne îmajeke balkêş e.

"sîsirk
tenêtiyê vêsdar dimêjin
Ji guhanên şevê"[352]

---

[351] Bereh, *Pandomîm*, r. 14.

[352] Bereh, h.b.,r. 16.

Şev, konê xwe yê reş li ser hemû jiyanê bi berfirehî radixe hemû rastiyan di bin tariya xwe de vedişêre, tiştên li ber roniya tavê heyîneke wan heye, di şevê de hêdî hêdî winda dibin. Ji ber vê rewşê şev, tenêtiyê hîn tîrtir û kûrtir dike. Di roniya rojê de mirov çiqasî tenê be jî hebûneke mirov heye, lê dema tariya şevê dadikeve ser mirov ev hebûna mirov jî ji mirov ve xuya nabe. Şev di van risteyan de bi guhanên xwe sîsirkan dimêjîn. Ev îmaj, ji îstiareyê diwelide.

"ho Qerejdaxo
xwedêkî aciz nabî
tena serê xwe"[353]

Tenêbûn ne tenê para însanan e. Dar jî çem û kanî jî deşt û newal û hetta çol û çiya jî li gor muxayîleya Berken Bereh dikarin tenê bin. Di van risteyan de helbestvan, bangî Çiyayê Qerejdaxê dike û dibêje:"Ma qey tu ji tenêbûnê aciz nabî?" Helbestvan ew qasî ji tenêbûnê aciz e ku dibêje qey çiya jî ji tenêbûna bi salan aciz dibin. Ev îmaj, afirîneriyeke eqlê empatîk e. Bi saya hunera teşxîs û îstiareyê di çîroksaziya helbestê de cih girtiye.

"ev mehek e wisa ye
tenêtî keziyên birîna min dihûne"[354]

Di vê îmaja bedew de keda hunera teşxîsê gelek e. Ligel vê hunerê îstiareya girtî jî bandorê li ser texeyula xwendevanan dike. Dayik, dema zarokatiyê keziyên keçikên xwe dihûnin. Di van risteyan de tenêbûnî ji hesreta dayikê îlham girtiye û keziyên birînan dihûne. Hûnandina keziyan lêkereke jirêzê ye, lê dema "keziyên birînan" bên hûnandin, îmajeke helbestkî diwelide.

"ne kes tê mêvaniya dilê te ne diçe
girtî dimîne deriyê te ji kêfxweşiyê re" [355]

---

[353] Bereh, h.b.,r. 16.

[354] Bereh, *Pandomîm*, r. 71.

[355] Bereh, *Dilê Min Palgeh e Ji Işqê re*, r. 55.

Mêvanî di çanda mirovahiyê de xwedî kevneşopiyeke kevnare ye. Rêzdariya li hember mêvana û dilsoziya di navbera mêvan û mazûban de dijberê tenêbûnê ne. “Mêvantiya dil” bi hunera mecaza mursel têkûztir bûye. Dîsa bêjeyeke wek “kêfxweşiyê” ku razber e, bi riya bêjeyeke wek “derî” şênber bûye û îmajake rengîn derketiye holê.

“her keziyeke te qevdek gula Mihemedî
her ku li ba dibin
xunavstêrkek dibare li deşta tenêtiya min a devzirav” [356]

Ev îmaja jorê wek xunava hunerên ciwankariyê bi ser xeyalên mirov de gotin gotin dibare. “Şibandina keziyên yarê bi qevdeke gulên Mihemmedî” perdeya îmajan vekiriye. “Deşta tenêtiyê” hem mezinbûna hesta tenêtiyê derdixe holê hem jî bêçarebûna mirov li hember vê deşta bêbext dramatîze dike. “Tenêtiya devzirav” di kûrahiya xwe de bi arîkariya hunera îstiareyê îmaja “kêreke dev zirav” jî saz dike. Bi libakirina keziyên ku dişibin qevdê gulên Mihemmedî “barana xunavsitêrkan” bi xwe re husna talîleke nazenîn jî tîne.

"xwe li min rapêçe li dilê min
guhdariya dengê min bike tenêtiya min vemale
ya ku di tenêtiya te de wek çemekî keserê diherike" [357]

Mirovên tenê dimînin hesreta dîtin û axaftina kesan û bihîztina dengan dikişînin. Tênêtî ji bo kesên tenê dimînin, navekî bêdengiyê ye. Carina mirov daxwaz dike ku bi hinekan re biaxive carina jî daxwaza guhdarîkirina hinekan bi mirov re çê dibe. Di van risteyan de deng, ji bo dûrketina ji tenêtiyê wek reçeteyekê hatiye pêşniyazkirin. Di risteya dawî de îmaja "çemê kesere" hem mecaz hem jî mubalaxeyê di naveroka xwe de dihewîne.

"de ka piyaleke din êş ey jiyan
ji mêj ve ye berkenê te serxweş nebûye

[356] Bereh, h. b., r. 271.

[357] Berken Bereh, Ji Dûriyê re, Lîs, Diyarbakır, 2013, r. 25.

kêzikek jî nîne sebra xwe pê bînim
çivîkan barkiriye ji esmanî" [358]

Piyale, qedeha şerabê ye. Di vê malika jorê de Berken Bereh di piyaleya şerabê de ji destê jiyanê qedeheke "êş" dixwaze da ku bi vê "piyaleya êşê" serxweş bibe. Jixwe êşên jiyanê mirovan nexweş, gêj û serxweş dike. Helbestvan xwe ew qas tenê dibîne ku kêzikek jî nîne da ku sebra xwe pê bîne. Li ezman yek çivîk tuneye ku bi dîtina wê tenêtiya xwe ji bîr bike. "Barkirina çivîkan a ji ezman" ji bo teswîra tenêtiyê îmajeke resen û sihêm e.

"min berê robarên ku bi şehwet diherikin da aliyê te
tirs û xofa tenêtiyê di bîra jibîrkirinê de veşart" [359]

"Robarên bi şehwet diherikin" îmajeke bi teşxîs û îstîare ye. Lewra şehweta însan transferî siruştê bûye. "Bîra jibîrkirinê" Îmajeke bimecaz e. Berken Bereh ew qas derdê xerîbiyê dijwar dibîne ku berê tirs û xofa xerîbiyê dide bîra jibîrkirinê. Balkêş e ku helbestvan gazinan ji tenêtiyê dike û tirsa xerîbiyê di tenêtiya bîra jibîrkirinê de vedişêre. Dibe ku Bereh armanc dike tenêtiyê di nava tenêtiyê de bifetisîne û bi vî awayî ji tenêtiya malkambax laş û giyanê xwe xelas bike.

### 1.5.2. Îmajên Tenêtiyê di Helbestên Fatma Savciyê de

Fatma Savciyê, di helbestên xwe de hejmara wan kêm be jî cih daye îmajên tenêtiyê. Îmajên tenêtiyê, bi hunerên teşxîs, îstîare û mecazan saz kiriye. Tenêtiya mirovan bi sombolan aniye ziman. Ev sembol helbesta Savciyê ji aliyê îmajan ve bihêz dike.

"ma ne keça çiyayekî
cêwiya çemekî bû
niha bi sahrayekê tî
bi her bahozê re belav

[358] Bereh, h. b., r. 29.

[359] Bereh, h. b., r. 34.

qonaxa wê ya dawî qesra tenêbûnê bû" [360]

"Keça çiya", "cêwiya çem" du îmajên bi hunera teşxîsê hatine sazkrin. Çiya û çem du unsûrên siruştê ne û di van risteyan de xusûsiyetên mirovan hilgirtine. Çiya sembola serhildanê ye, çem jî ji ber ku her daîm diherike nîşaneya çalakiyê ye. Kesa ku helbestvan behsa wê dike tevlî vî ruhê xwe yê çalak û serhildêr di qonaxa dawî de ji "qesra tenêbûnê" re dibe mêvan. "Qesra tenêbûnê" îmajeke bimecaz e, aliyê tenêbûnê yê biewle û mureffeh û dîmena tenêtiyeke fîzîkî û derûnî baş dramatîze dike. Dibe ku Fatma Savciyê, bi berdevkiya vê îmajê kurteya jiyana xwe peşkeş kiribe.

"tenê dilê wê yê yaqûdî li bajarekî tenha
neqşik bi neqşik
xwe bi darve vedike" [361]

"Dilê yaqûdî" îmajeke bimecaz e. Qîmeta dil nîşan dide. Ku dilekî yaqûdî xwe li bajarekî nexşik nexşik bi dar veke, tê maneya ku qîmeta vî dilî nehatiye fêmkirin. Darvekirin di vê îmajê de bi du maneyan hatiye bikaranîn. Maneya yekemîn xwe daliqandin ango întîhar e. Maneya duyemîn bidarvekirina morîkan e. Lewra kevirê yaqûd ji bo zînetê jinan jî pir biqîmet e. Gotina "bajarekî tenha" tûala vê îmajê bi derûniya tenêtiyê neqişandiye.

"xencera ku birin bi sorahiyê neqişandî
di kalanê bêdengiyê de riziya ye niha" [362]

Xencer amûreke kuştin û birîndarkirinê ye. Ev karê qirêj bi bêjeya neqişandinê hatiye bilêvkirin û tezadek derketiye holê. Esas di van risteyên jorê de îmaja "xencer di kalanê bêdengiyê de riziya" vegotineke sihêm e. "kalanê bêdengiyê" ji bo terîfkirina tenêtiyê îmajeke afirêner e.

[360] Fatma Savci, *Dotmara Lal*, Avesta, Stembol, 2014, r. 25.

[361] Savcî, h. b., r. 45.

[362] Savcî, h. b., r. 55.

Fatma Savcî, îmajên tenêtiyê kêm bi kar tîne. Savcî, tenêtiyê wek rewşeke şerm şîrove dike. Îmajên Savciyê yên tenêtiyê bi giştî bi gotinên mecazî saz bûne. Vegotina sembolik aliyekî din yê îmajên tenêtiya Fatma Savciyê ne.

### 1.5.3. Îmajên Tenêtiyê di Helbestên Gulîzerê de

Tenêtiya Gulîzerê wek îmajeke derûnî di risteyên helbestên wê de xuya dibe. Belê di nav civakekê de, di nav malbatekê de ye, lê xwe tenê hîs dike. Tenêbûna herî xedar tenêbûna derûnî ye. Hebûna kesan ji bo kesê ku xwe tenê hîs dike tiştekî îfade nake. Gulên helbesta wê li ber çeman tî ne. Li gor Gulîzerê ji laşê jinekê eşîrek ji qîz û lawan rast bibe jî dikare tenêtiya ruhê wê bakîre be.

“gul wek sêwiya li ber çeman hîna jî tî ye
kî bêçilmisandin ji bendemayinê filitiye”[363]

Mirov tî dibe, lê tîbûna gulê dîmeneke xeyalî ye. Ji aliyê tîbûnê, ê ku bihêz e nehatiye gotin, lewra di vê gotinê de îstiareya girtî heye. Dîsa hunera teşxîsê hevaltî bi îstiareyê re kiriye. Gula tî, bi sêwiyên ber çeman hatiye şibandin. Ev şibandin, ne şibandineke jirêzê ye. Sêwî, di berhemên devkî yên kelepora kurdî de her tim çavbirçî tên nîşandan. Di van risteyan de jî gul, li ber çem e, lê dîsa jî ti ye û çilmisiye. Helbestvan Gulîzerê, çilmisandina gulê bi ezabê tenêtiyê ve girê daye.

“ji qîz û lawan eşîrekê rast kirin ji laşê min
lê tu car dest nedan keçbûna tenêtiya ruhê min “ [364]

Ev îmaj, ji aliyê dramatîzekirina tenêbûniya ruhî ve îmajeke kûrmane ye. Ji laşê mirov eşîrek jî zêde bibe, eger evîn di navbera mêr û jinê de tunebe ew ruhê jina ku eşîrek ji laşê wê sadir bûye tevlî keçikbûna ruhê xwe tenê ye. Jinek bi vî rengî di nava tenêtiya keçkaniya ruhê xwe de digevize. Hunera îstiareyê, rê li îmajeke nûwaze vekiriye.

---

[363] Gulîzer, *Keziyên Jinebî*, r. 43.

[364] Gulîzer, *Bûka Baranê*, r. 31.

Gulîzer, îmaja tenêtiyê bi mecaz, teşbîh, îstîare, teşxîs û întaqan saz dike û bi îmaja bendemayînê di xeyalxaneya xwendevanan de tenêtiyê bi awayekî melankolîk dramatîze dike. Tenêbûn di helbesta Gulîzerê de ji yek îmajên karîger e. Di gelek helbestên wê de kul û keserên jinan bi awayekî zelal xwe nîşan didin. Tenêtî ji van kul û keseran re rêhavaltiyeke dilsoz dike.

## 1.6. ÎMAJÊN MIRINÊ

Mirin ji çêbûna dinyayê û vir ve rastiya jiyanê ye. Rastiyeke ku rehê wê bi ta'liya giyanê mirovahiyê girêdayî ye. Her zayînek, amadekariya mirinekê ye. Hebûna mirovan, bi hebûna mirinê manîdar e. Mirin gelek caran wek xelasiyekê tê dîtin. Ji ber êş û elêmên dinyaya derewîn mirov dixwaze koçî alema metafîzîk bike û bi vî awayî ji kul û keserên xwe xelas bibe. Ruhê ku ji laşe merezî xelas bibe, rihet dibe. Mirin tunebûya dê kesî xatirê jiyanê nizanîba.

Di helbesta cîhanê de mirin, temayeke bingehîn e. Her helbestvan di çarçoveya helbesta xwe de bi qasî ku mirinê tesîr li ser giyanê wan kiriye cih dane vê temaya bingehîn. Di helbesta kurdî ya nû de mirin, temayeke ku pir zêde hatiye bi kar anîn. Ji ber şert û mercên kurdan mirin, her demê di helbesta kurdî de ji xwe re cih vekiriye û bûye temayeke esas ji bo helbestvanan. Helbsetvanên kurd, temaya mirinê ne wek temayeke metafîzîkî, wek rastiyeke fîzîkî dîtine û bi vî rengî daxilî naveroka helbesta xwe kirine. Helbestvanên kurd yên modern, dema mirinê dramatîze dikin, teswîrên gelekî balkêş dikin Di risteyên jêrê de em ê hewl bidin nêrîna helbastvanên kurd di derheqê temaya mirinê de û îmajên wan ên mirinê nîşan bidin.

Arjen Arî li ser temaya mirinê di warê îmajan de zêde nesekiniye. Mirin tenê bi îfadeyên bê îmaj di hin risteyên wî de derbas dibe. Berken Bereh di mijara mirinê de gelek riste nivîsandibe jî ji aliyê îmajên mirinê qels e. Gulîzerê jî îmajên mirinê kêm bi kar anîne. Fatma Savciyê di warê îmajên mirinê de ji helbestvanên navborî bêtir xebitiye û gelek îmajên mirinê tevlî risteyên helbesta xwe kiriye. Sedemên vê rewşê, bi rabirdûya wê ya şoreşgerî re têkildar e.

### 1.6.1. Îmajên Mirinê di Helbestên Berken Bereh de

Di helbestên Berken Bereh de wek gelek îmajan îmaja mirinê jî di paxila siruştê de dikemile. Bereh, mirinê wek rastiyeke jiyanê dibîne. Ji mirinê wêdetir êşa mirinê ji îmaja mirinê re wek havên dibine. Mirin sînga wî dike qada cinawiran.

"te dîsa keysa xwe li min anî mirinê
cardin sînga min bû qada cinawiran"[365]

Vegotina xemgîniya ku mirov li hember mirinê dijî, gelekî dijwar e. Ji ber vê yekê helbestvan bi gotinên mecazî û teşbîhî van hestên tîr tînin ziman. Di van risteyan de jî bi îmaja "sînga min bû qada cinawiran" dijwariya hesta mirinê bi awayekî teşbîhî li ber çavan hatiye raxistin.

"ger hûn bixwazin
mirinê binasin
li baskên qulingên koçber binihêrin
bêhna şewatê tê ji wan"[366]

Mirin bi xwe koçek e. Mirov ji dinyaya fîzîkî, koçî alema metafîzîkî dike. Koçerî, her dem belengazî ye. Tenê bêjeya koç û koçberiyê bangewaziyên nerênî bi xwe re tînin. Xaniyên xerakirî, bexçeyên wêrankirî, malên talankirî û şewitandî hin bangewaziyên koç û koçberiyê ne. "Bêhna şewatê ji baskên qulingên koçber bê" îmajeke kûrmane diwelide.

### 1.6.2. Îmajên Mirinê di Helbestên Fatma Savciyê de

Fatma Savcî, ji aliyê xeyalên nîvco û tesîra wan a li ser kesan nêzîkî mijara mirinê dibe. Ew carina mirinê teswîr dike carina jî êşên mirinê li ser tûala helbestê belav dike. Stranên wê keziyên xwe kur dikin di awazên xwe yên nîvkuştî de, di fala fîncanên qehweyê de gustîlkên şervanên kuştî dibîne, çav jî xwe ji kenan dikujin.

---

[365] Bereh, *Pandomîm,* r. 85.

[366] Bereh, *Dilê Min Palgeh e Ji Işqê re*, r. 105.

“dê keziyên xwe kur bikin
stranên min
di awazên xwe yên nîvkûştî de”[367]

Girtina şînê ya piştî mirinê, wek kevneşopiyekê ye. Di her çandê de taybetiyên şînan hene. Di çanda kurdî de reşgirêdan, kezîkurkirin, lixwexistin, kirasçirandin, qêrîn, hewar û nihurandin hin taybetiyên şînê ne. Di risteyên jorî de “kezîkurkirina strana di awazên nîvkuştî de” îmajeke bi hunera îstiareyê û teşxîsê ava bûye.

“dema temê xwe li evîndariyê xira dikim
gustîlkên şervanên kuştî dibînim
di falên fîncanên qehwê de “ [368]

Dîtina mirinê, dilê mirovan li dinyayê sar dike. Rastiya mirinê, xeyalên dinyaya xapînok pûç dike. Di risteyên jorê de “dîtina gustîlkên şervanên kuştî di falên fîncanên qehwê de” dilê helbestvan ji dinyayê û ji evîndariyê sar dike. Ev îmajeke mecazî ye.

“ma îcar wê kîjan çav
xwe ji kena bikûjin” [369]

"Kuştina çavan ya ji ber ken" îmajeke sihêmiya xwe ji dijberiya maneyê digire. Hunera tezadê dendika vê îmajê ye. Kuştin û mirinê, ew qasî di binehişê kurdan de cihekî girîng girtiye ku kenê çavên wan jî bi hêsir û kuştin e. Di van risteyan de mecaza mûrsel, îstiare, teşxîs û hunera tezadê barê dîmena vê îmajê hilgirtiye, Ev îmaj, hesreta helbestvan ya ken, şadî û bextewariyê jî derdixe holê. Helbestvan dixwaze bi van risteyan bibêje ku: “Bila kenekî domdirêj hebe û dawiya wî kenî mirin be jî ne xem e.” Bes bila kenekî dûvdirêj hebe û hew.

---

[367] Savcî, *Gulên Qasid*, r. 57.

[368] Savcî, *Bîra Birînê,* r. 74.

[369] Savcî, *Xewnên Zîvîn*, r. 68.

"laşê vê kuştiyê çima ew qas tije çîrok bû?" [370]

Her laşek çîrokek e. Çîrokek temendirêj an jî emirqut. Li gor bêjeya kuştinê li şûna mirinê hatiye bikaranîn tê maneya ku ev çîrok, çîrokeke emirqut e, lê helbestvan gelek çîrokan di vî laşê kuştî de dibîne. Dibe ku ew çîrok, xewn, xeyal û bîranînên di bîra qederê de têk çûbin. "Laşê tije çîrok" bi hunera mecazê û îstîareyê dîmeneke surrealîst li ber çavan radixe.

"mêşên hingiv li welatê wê qeliyane
û pîrejinek dawçikandî nema ye
ku wê di nav şimayê dake
û heya kuştineke din wê ji xezebê dûr bihêle" [371]

Di vê malika jorê de Fatma Savciyê, dîsa bi reşbîniyeke tîr îmajeke kuştinê saz kiriye. Xelasî ji ber mirinê tuneye. Savciyê di van risteyan de dibêje: "Pîrejinek dawçikandî bikare wê di nav şimayê dake jî dîsa filitandina wê ji deste kuştinê tuneye. Dibe ku tevlî veşartina hundirê şimayê jî encax heta xezebeke din bikare bijî. "ji bo reva ji destê kuştinê veşartina di nav şimayê de" îmajeke sihêm e.

Di peywenda îmajê de rola hunera mubalexeyê gelek e. Ev îmaj jî wek gelek îmajên Savciyê şopa hizrên hurgilî di helbesta Savciyê de derdixe holê û helbesta Savciyê ji aliyê zayendî ve diyar dike. Ev hurgiliya hizrên zayendî di warê çîroksaziyê de di helbesta Gulîzerê de jî xwe nîşan dide.

"jineke heft serî li ser tabloya nîgarkêşekê di xwînê de xeniqî" [372]

Di vê risteya jorê de Savciyê dîsa tabloyeke bi xwînê pêşkêşî xwendevanên xwe kiriye. "Jina heft serî" îmajeke mitolojîk, fantastîk e. "Li ser tabloya nîgarkêşekî xeniqandina jineke hesf serî" dîmeneke surrealîst di mejiyên xwendevanan de ava dike. Ya balkêş ew e ku tevlî heft serên xwe jin dîsa di nava xwînê de fetisiye. Xwîn wek qedera jinê hatiye nişan dayîn. Xwîna halê regile, xwîna bekaretê, xwîna

---

370 Fatma Savci, *Dotmara Lal*, Avesta, Stembol, 2014, r. 16.

371 Savcî, h. b., r. 39.

372 Savcî, h. b., r. 47.

welidandinê, xwîna lêdana mêran, xwîna birîndarkirin an jî kuştina dijminan. Her daîm dîroka jinê dîroka xwînê ye. Fatma Savciyê bi vê îmajê dixwaze vê rewşa jinê ya di civakê de destnîşan bike.

Fatma Savciyê, di gelek helbestên xwe de kêfxweşî û zewqê bi îmajên xemginiyê, birîndarî, mirin û kuştinê bênder dike. Aliyekî helbesta Savciyê her daîm reş e. Sedemên vê yekê jî di jînenîgariya Savciyê ya şoreşgeriyê de di bîranînên wê yên bixwîn de veşartiye.

### 1.6.3. Îmajên Mirinê di Helbestên Gulîzerê de

Gulîzerê, bi nêrîneke felsefî-metafîzîk li mijara mirinê dinêre û îmajên surrealîst ji bo mirinê saz dike: Çavên bêhnçikiyayî digihîjine ser meytên wan, li ser pêsîran, mirinê diherikîne, xweliya meytên peyvan li ser çem li ba dike.

"hêsirên min qefle bi qefle
çavên min bêhn çikiyayî digihîştin ser meytên xwe " [373]

Dema agahiya mirinê ji hinekan re tê, bi awayekî şerpeze, hewl didin ku bigihîjin ser kesê ku miriye. Di nav wê kelecana şerpezebûnê de mirov bêhnçikiyayî dibe. Ev tiştekî tê zanîn, lê "çav bigihêjin ser meytên xwe" ev vegotin ne vegotineke jirêzê ye. Mecaz û îstiareyê derî li vê îmajê jî vekirine.

"li ser pêsîreke te mirin diherike
û tu di her şêvên tarî de min bi wê pêsîrê şîr didî" [374]

Di şevên tarî de "şîrdana pêsîra ku mirin li ser diherike" îmajeke bi riya îstiareyê saz bûye.

"me xweliya meytên peyvan
li ser çem li ba kir"[375]

---

[373] Gulîzer, *Keziyên Jinebî*, r. 24.

[374] Gulîzer, *Bûka Baranê*, r. 56.

[375] Gulîzer, *Bûka Baranê*, r. 79.

Peyv, dengên navê tiştan e. Her bêjeyek wek wêneyekê nîşaneya hebûna tiştekî ye. Bêjeyên xwelî, meyt û peyv di axaftina rojane de nayên cem hev. Lewra peywenda wan ne yek e, lê di zimanê helbestê de dema bi peywenda mecazî "xweliya peyvên meytan" bê gotin îmaj derdikeve ser dika hunerê. "Li ser çem libakirina xweliya meytên peyvan" îmaj dermale kiriye.

## 2. ÎMAJÊN SIYASÎ

### 2. 1. ÎMAJÊN ZORDESTIYÊ

Zordestî, di dîroka mirovahiyê de têgeheke herî kevnare ye. Ji meseleya Habîl û Kabîl heta meseleyên roja me zordestî di her merhaleya dîrokê de bi awayên curbicur derketiye ser dika dîrokê û bi senaryoyên ku ji destê desthilatdarên bêmerhamet derketiye rola xwe ya qirêj lîstiye. Eger zordestî tunebûya dê merxasî û azadî jî tunebûya. Têgêha zordestiyê ne tenê di edebiyata kurdan di edebiyatên gelên cîhanê de jî xwedî cihekî taybet e. Destanê miletan piranî binyada xwe ji vê têgehê digrin. Şerên azadiyê, îlhama xwe ji vê têgehê digirin.

Zordestiya ku hin dewlet li dewletên din dikin, zilma ku dewlet li gelan dikin, zilma ku mirov li mirovan dikin cureyên zilmê yên herî berbelav in. Di dîroka kurd û Kurdistanê de zordestî, her dem roleke sereke lîstiye û hîn jî dilîze. Bêdewletbûnê, mafên kurdan yên herî siruştî ji wan sitendiye û kurd bi sedan salan di bin zilma dewletên deshilatdar de zordestiyeke nedîtî dîtine. Zimanê wan qedexe bûye, nasnameya wan qedexe bûye, mafê perwedeya wan a bi zimanê zikmakî qedexe bûye. Xulase hebûna kurdan û Kurdistanê tune hatiye hesibandin.

Helbestvanên miletekî ku di bin zilmê de bi sedan salan hatine perçiqandin, helbet di helbestên wan de dê şopên zordestiyê hebin. Di helbesta kurdî ya nû de ev şopên zordestiyê, wek xençerên dev bijehr di gelek risteyan de dilê mirov diêşîne. Helbestvanên kurd, bûyerên zilmê ku mora xwe li dîroka kurdan xistine, ji bîr nekirine û di helbestên xwe de carna bi awayekî eşkere carna jî bi awayekî veşartî anîne ziman. Ji ber sedemên qedexebûna ramanê gelek caran helbestvanên kurd ên modern ev şopên zordestiyê ku dîrok pê ziwal zîwalî bûye, bi telmîhên alegorîk, bi bangewaziyên sembolîk û bi derfetên hunerên mecaz û îstiareyê anîne ziman.

Mijara helbestê her çi dibe bila bibe, îmajên zordestiyê peyarêkekê dibînin û xwe bera nav konteksa helbesta kurdî ya nû didin. Helbesteke evînî ku bi romantîzmeke şehwetê hatiye sazkirin, mirov hew dinêre îmajeke zilmê ku dev tije

xwîn tevlî naveroka wê bûye. Yan jî helbesteke mijara wê şadî û bextewariya jiyanê ye tu hew dinêrî îmajeke zordestiyê, serê xwe ji nava wê şadî û bextewriyê de derxistiye û dibêje min ji bîr neke.

Em ê binêrin di helbesta kurdî ya nû de û helbestvanên ku me mijara teza xwe bi wan sînordar kiriye îmajên zordestiyê bi çi rengî hatine sazkirin, kîjan hunerên belaxatê zordestî dramatîze kiriye û êşa malkambax bêtir bera nav risteyên helbestê daye?

### 2.1.1. Îmajên Zordestiyê di Helbestên Arjen Arî de

Arjen Arî, îmajên zordestiyê, di nav pergala jiyana kevneşopiyê û carina jî di nav şert û mercên siyasî nirxandiye. Di helbestên Arjen Arî de mijara zordestiyê di gelek risteyan de derdikeve pêşberî me, lê Arjen Arî mijara zordestiyê bi şêwazeke vekirî piranî jî bêyî bikaranîna metaforan tîne ziman. ji ber vê yekê di helbestên wî de îmajên zordestiyê kêm in. Bindestiya siyasî, parçebûna welat, "axa nav lê qedexe", "lingên zilmê" , "şerên di geliyan de distirê" îmajên Arjen Arî dermale dikin.

"şer de ye mîna min niha helbest jî
kengî parzinîn bivêj ji xwînê
ji êşê rêz ji şînê çarîn" [376]

Arjen Arî di vê îmaja jorê de bi şêwazeke mecazî behsa poetîkaya xwe dike û têkiliya şer û helbestê datîne. Li gor Arî şer û zordestiya ku tê meşandin ew qas zêde ye ku kelîme di nav xwînê de mane. Rêzik û çarîn divê ji êş û şînê biparzinin. Hunera mubalexeyê, bi mecaz û îstîareya girtî îmajeke zordestiyê derxistiye holê.

“çengek ax didime te nav lê qedexe
bi lingên zilmê stirayî Dêrsim e ew bi xwe
bilûr betal in li çiyayên wê
roj radizên şev şiyar in şer distirê di geliyan de” [377]

---

[376] Arjen Arî, *Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî*, Avesta, Stenbol, 2000, r. 49.

[377] Arî, *Ev Çiya Rûspî Ne*, r. 34.

Di van risteyên Arî de tabloyeke şer hatiye çêkirin. Rengê vê tabloyê bi bêjeyên peywenda wan zilm e saz bûye. “lingê zilmê” , “Dersim’a ku distirê” , “rojên razayî” , “şevên şiyar” û “şerê ku di geliyan de distirê” zincîreke îmajan ava kiriye. Teşxîs û îstiare rola sereke lîstine di van gotinên paxila wan tije zilm de.

### 2.1.2. Îmajên Zordestiyê di Helbestên Berken Bereh de

Berken Bereh, helbestvanekî pastoral e. Siruşt di helbesta wî de roleke karîger dilîze. Ji ber vê yekê îmajên wî yên zordestiyê jî bi konteksa siruştê saz bûne.

“de ka himbêza xwe veke ey dîrok
qey te bêriya sêwiyên xwe nekiriye ” [378]

Himbêza dîrokê, îmajeke bi riya îstiare û teşxîsê hatiye sazkirin. Gotina “sêwiyên dîrokê” vegotineke mecazî ye û ji bo êş û elemên hatine kişandin bîne ziman têra xwe sihêm e. Berken Bereh di vê metafora jorî de kesên ku zilm li wan hatiye kirin (kurdan) wek sêwiyên dîrokê dibîne. Sêwî ji bo çi sêwî ye? Ji ber ku bavê wî/wê tuneye. Kurd çima sêwî ne? Ji ber ku bêdewlet in. Miletekî bêdewlet encax dikare bibe sêwiyên dîrokê.

“duh bi şev
bi benê tariyê xeniqand
şewitand piştre bi destên xwe yên qilêr
xaniyê me tevî berxa du mehî
leşkerê gurrî” [379]

Leşkerên ku digirtin ser gundan zilmeke nedîtî li gundiyan dikirin. Wek tê zanîn ku di dîroka Kurdistanê de bi hezaran gund hatine şewitandin. Ew zilma ku li gundiyan hatiye kirin di binehişê helbestvanên kurd de gelekî cihekî taybet digire. Her helbestvan, bi şêwazekê ew zilm û zordarî aniye ziman. Di risteyên jorê de

[378] Bereh, *Pandomîm,* r. 57.

[379] Bereh, *Dilê Min Palgeh e Ji Işqê re*, r. 89.

xeniqandina bi benê tariyê û şewitandina xanî tevlî berxa du mehî, zordestî şênber kiriye.

"bibihîze dengê xwîna min a ku diqerise" [380]

Cihên ku zordestî lê hebe mirov azad nikare bijî û azad nikare bimire jî. Zilma li ser zindiyan jixwe heye û ya li ser laşê birîndar û miriyan jî bi ser de tê, heta ku mirov dimire jî mezelên mirov carina ji neyaran re dibe qada zordestiyê. Di vê îmaja Savciyê de "dengê xwînê" îmajeke bi teşxîs û îstîare ye. "dengê xwîna diqerise" mecazê jî li maneya îmajê zêde dike. Ji birînên kesên ku hatine kuştin xwîn niziliye û ew xwîn ji ber seqemê qerisiye. Xwîna ku li ser laşê mirov biqerise, dikare bibe tabloya zordestiyeke hovane.

"dilê we wek boçikeke cixareyê hatibe perçiqandin
li berêvareke soreve ava serê we tê kelendin" [381]

Cixare tê vexwarin û pê ve boçika wê tê avêtin û perçiqandin. Di vê risteya Savciyê de dil, bi boçika cixareyê hatiye şibandin. Ji bo îfadekirina bêqîmetiya tiştekî "boçika cixareyê" îmajeke resen e. Dil, ji bo laşê mirov ûzvê herî nazik e. Tiştekî nazik wek dilê mirov, ji aliyê zordaran ve mîna boçika cixareyê bê perçiqandin, sînorên zordestiya tê meşandin jî baştir tê fêmkirin. "Berêvareke soreve" demeke bextevarî û aramiya jiyanê ye, lê di vê îmajê de ev wext, ji bo kelandina ava serê mirîyê kuşti hatiye bijartin. Zordestî û jiyan di vê îmajê de kelijiye.

### 2.1.3. Îmajên Zordestiyê di Helbestên Fatma Savciyê de

Fatma Savciyê, di helbestên xwe de îmajên li ser zordestiyê bi awayekî realist saz kiriye û wek wênesazekî li ber çavan raxistiye. Di mînakên jêrî de ev îmajên ku xwîn ji wan dinizilin, hişê mirov serobino dikin.

“li Dadgeha Şoreşê ya Sînê cezayê îdamê mohr bike

[380] Berken Bereh, *Ji Dûriyê re*, Lîs, Diyarbakır, 2013, r. 25.

[381] Bereh, h. b., r. 63.

babayî dozger ku bi xwînê fitara xwe vedike” [382]

Zilma li çar parçeyê Kurdistanê de li ser kurdan dibe di helbestên helbestvanên kurd de gelek caran bi riya telmîhan û bangewaziyan tê bibîranîn Di van risteyan de jî zilma dadgehên ku qaşo dadê belav dikin bi îmajeke bêhempa hatiye bilêvkirin. “Vekirina fitarê bi xwînê” îmajeke hiş û binehişê mirov serobino dike. Rojî ji bo xatirê Xwedê tê girtin. Kuştin, di hemû dînên semavî de qedexe ye. Girtina rojiyê ji bo Xwedê û vekirina fitara bi xwînê dijberiyeke tund e. Ev dijberî û dîmena derketiye holê îmajeke resen e.

“eger bibihîzin cendirme ji hestiyên me qelûnan çêdikin
wê serboriyên xwe ji bîr bikin” [383]

Qelûn, nîşaneya kişandina tûtinê ya bi zewq e. Di naveroka maneya vê bêjeyê de bextewarî heye. Mirov, ji aliyê cendirmeyan ve bên kuştin û ji hestiyên wan qelûn çê bibin, tê maneya ku mirin jî kîn û xereza hundirê dijmin teskîn nake û dijmin ji hestiyên miriyên ku bi zilmê hatine kuştin qelûnan çêdikin û wan qelûnan dixin nav diranên xwe û pê zewqa tûtinê dikişînin giyanê xwe.

“bo çi gewdê me qulqulî dibin
ji şûna mîxa
li vî warê ku sêdar
bûne ezmanê me heval” [384]

Cezayê darvekirinê, di dîroka kurd û Kurdistanê de gelek caran wek qedereke malkambax derketiye pêşberî me. Bêjeya sêdarê, tena serê xwe bûye metaforeke tirs û xofê ketiye dilê mirovahiyê. Şêx Seîd û hevalên wî, Seyîd Riza û hevalên wî, Qazî Mihemmed û hevrêyên wî û bi hezaran kes mîna wan bi sêdaran hatin daliqandin. “Ezmanê ji sêdaran” îmajeke resen e.

---

[382] Savcî, *Şewq û Payîz*, r. 13.

[383] Savcî, h. b., r. 38.

[384] Savcî, *Gulên Qasid*, r. 58.

“Barana ji çavên çîrokên vê xakê dibare” [385]

Çavên çîrokên xakê ku baran jê bê, îmajeke li gor naveroka çîrokan surrealîst e. Zilmê baş teswîr dike.

“şûrê Moxolan di laşên me yên narîn de hîna dilive
pişta pêşeroja me
ji hilgirtina kuştiyan diêşe” [386]

Şûrê ku bi sedan sal berê di pişta mirovan de rabûbe û hîn jî bilive tê maneya ku zilmê di laşê mirovahiyê de zîl daye. “Ji hilgirtina kuştiyan êşandina pişta pêşerojê” îmajeke bi hunera teşxîs û îstiareyê saz bûye.

“gula li rûyê kevir neqîşandî şewitandin” [387]

Zordestî, ne tenê li ser mirovan dibe, li ser siruştê, li ser ajalan, li ser bermahiyên dîrokê, li ser berhemên hunerî jî zilm pêk tê. Di vê risteya jorî de îmaja “Şewitandina gula li rûyê kevir hatiye neqişandin” zordestiyeke bi vî rengî bi metaforeke balkêş tîne ziman.

“û ava reş bi ser çavên xewnên kihêlan de rijandin” [388]

“Xewnên kihêlan” îmajeke peywenda wê çîrokî ye. Eger ava reş bi ser çavên xewnan de bê rijandin, tê maneya ku zilimdar hîleta wan li xewnên kihêlan jî tuneye. Wek me li jorî jî bi lêv kiribû zilm, ne tenê li ser mirovan li ser ajalan jî dibe û ev riste nimûneyeke vê zilmê ye. Dibe ku helbestvan bi bêjeya “kihêlê” zordestiya li ser jinên kurd jî bi riya îstiareya vekirî anîbe ziman.

“em di bin barana xwîna straneke kîndar de ne

---

[385] Savcî, *Bîra Birînê*, r. 32.

[386] Savcî, h. b., r. 32.

[387] Savcî, h. b., r. 35.

[388] Savcî, h. b., r. 35.

li ser rihê zeman
ji qedera me re
ayetên hezar Enfal'an xwendine" [389]

"Xwîna straneke kîndar" îmajeke bi saya teşxîs û întaqê derketiye holê. Stran, şahiyê tînin bîra mirov, lê di van risteyên jorî de xwîn ji stranan dibare û stran wek mirovan bi kîn hatiye nîşandan. "Barana xwîna straneke kîndar ku bi ser ruhê zemên de bibare" îmajê ji aliyê dîmenî ve bêtir têkûz dike.

"kolanan bi laşên xwişk û birayan dineqişînin
û ala xezebeke reş li ezmanê wê didaleqînin" [390]

Neqişandin ji bo tiştên xweşik tê bikaranîn, lê di vê risteya Fatma Savciyê de ji bo rewşeke zordestiyê hatiye bikaranîn. Laşê xwişk û birayan li ser kolanan bin û bi qasî ku neqş pê çêbibin zêde bin, tê maneya ku zordestiyeke mezin li ser miletekî tê meşandin. "Ala xezebeke reş" îmajeke nûwaze ye. Sê bêjeyên dûr peywend îmajeke zordestiyê derxistiye holê. Rola hunera mecazê di çêkirina vê îmajê gelek e.

"niha mar û mirêk
ji lênûska xwînê
kîjan rûpelî dixwînin" [391]

"Lênûska xwînê" ji bo dîrokeke di bin siya zordestiya neyaran de hatiye nivîsandin îmajeke bihêz e. Xwendina rûpelên vê lênûska xwînê ji aliyê mar û mirêkê îmaj ji aliyê maneyê ve dewlemend kiriye. Mecaz, îstîareya girtî û teşxîs barê vê îmajê yê vegotinê girtiye ser milên xwe. Mar û mirêk (eyne) du bêjeyên ku bi zaneyî hatine neqandin. Mar bi temen dirêjiya xwe navdar e, eyne jî rastiya tiştan li ber çavan radixe. Ji ber vê yekê her dû bêje jî domandina zordestiyê ya bi salan nişan dide.

389 Savcî, h. b., r. 71.
390 Savcî, h. b., r. 34.
391 Savcî, h. b., r. 38.

### 2.1.4. Îmajên Zordestiyê di Helbestên Gulîzerê de

Gulîzerê, îmaja zordestiyê piranî wek problemeke civakî, malbatî û takekesî şîrove kiriye. Zordestiya mêrên li ser jinan, zordestiya kevneşopiyê li ser jiyana jinan, zewaca bêdil, dijwariya qaîdeyên exlaqî yên civakê li ser helbesta Gulîzerê bandorek mezin çê kiriye, lê wek mijar behsa zordestiya civakê bike jî di vê mijarê de gotinên wê yên bi îmaj kêm in. Nêrîna Gulîzerê ya vê mijara nêrîneke civakî ye. Nêrîna Fatma Savciyê siyasî ye.

"di nav destarekî dilkevir de
dihêrînin dilê min" [392]

Destar motîfeke folklorîk e. Di otantîzma gelerî de xwedî bangewaziyên erênî ye, lê di van risteyên jorî de ji bo îmajeke zordestiyê bi xwîn û goşt bike hatiye bikaranîn. Dil; nermik e, nazenîn e, hessas e. Hêrandina dil, di nav destarê ji kevir de îmajeke ecêb e. Ji bo dramatîzekirina zilmê û şikencê metaforeke surrealîst ava kiriye. Bi gotina "destarê dil kevir" jî îmaj xurttir bûye. Di vê gotinê de hunera kînayeyê heye Lewra dilê kevir jixwe kevir e. Dil kevirbûnî di heman deme de tê maneya bêmerhametbûnê jî.

## 2. 2. ÎMAJÊN AZADIYÊ

Di bin vî sernavî de em ê di helbesta kurdî ya nû de li ser fikra azadiyê bisekinin. Di xwendinên me yên helbesta kurdî de bala me kişand ku gelek helbestvanên kurd piranî li ser fikra azadiyê sekinîne. Azadî ji wan re bûye wek xewneke şêrîn û ketiye nava xeyalên wan. Em ê lêbikolin ku helbestvanên kurd di helbestên xwe yên nû de ev mijar bi çi rengî nirxandine.

Bindestî, bi sedan salan wek fîstanekî ji agir li laşê miletê kurd xwe pêçaye û nehiştiye kurd, bêhna azadiyê bikişînin giyanê xwe. Helbestvanên kurd ên modern di helbestên xwe de çawa nêzîkî fikra azadiyê bûne, azadî ji bo wan tê çi maneyê, îmajên azadiyê çawa saz kirine? Azadiyeke alegorîk an sloganîk ava kirine, ji bo azadiyê kîjan enstruman pêşniyar kirine? Mebesta me ew e ku em fikra azadiyê ji aliyê îmajan ve binirxînin.

[392] Gulîzer, *Keziyên Jinebî*, r. 23.

Miletên bindest helbestvanên wan li ser mijarên curbicur bisekinin jî her tim berê xeyalên wan dikeve riya azadiyê. Ji ber ku di binehişê wan de giraniya bindestiyê heye ev hest, bandorê li ser nêrina wan ya siruştê, civakê, siyasetê, evinê, tenêtiyê, mirinê, xerîbiyê, xizaniyê dike.

Helbesta kurdî ya nû ji aliyê temaya azadiyê zehf dewlemend e. Mijar her çi dibe bila bibe temaya azadiyê ji xwe re rêyekê dibîne û tevlî çîroksaziya helbestê dibe. Azadî wek pizika ser zimanê helbestvanên kurd e. Îmajên azadiyê di helbestên Arjen Arî, Berken Bereh û Fatma Savcî de berbiçav in, lê helbesta Gulîzerê ji aliyê îmajên azadiyê ve gelekî qels e. Arî, Bereh û Savcî ji aliyê azadiya niştimanî nêzîkî mijarê bûne û li ser azadiya kurd û Kurdistanê carina bi awayekî nixumandî carina jî bi awayekî zelal hest û ramanên xwe bi îmajên nûwaze anîne ziman.

### 2.2.1. Îmajên Azadiyê di Helbestên Arjen Arî de

Azadî di helbesta Arjen Arî de îmajeke sereke ye. Arî, wek xewnekê, an jî xeyalekê behsa azadiyê dike. Arjen Arî, bi şêwazeke sade û bi îmajên ji aliyê maneyê geleke kur azadiyê dinirxîne. Îmajên wî yên azadiyê, bi rastiya civak, dîrok û sîyaseta Kurdistanê girêdayî ne. Azadiya xakê, li gor Arjen Arî azadiya gel e. Ev azadî, dibe xewneke kevnare, dibe axîneke ji kezebê, dibe serhildaneke dîrokî û di risteyên helbestê de bi hunera mecaz, îstîare, mubalexe û teşxîsê dikemile.

"bîhn bik
hilmek azadî ye tê ji wan
kulîlkên bihara derengmayî" [393]

"Kulîlkên biharê" di vê îmajê de wek metaforekê hatiye bikaranîn. Mebasta kulîlkên biharê şervanên azadiyê ne. "Bihara derengmayî" hêviya kesên ku bi salan ve li bendî demsala azadiyê mane bi şêwazeke mecazî bi lêv dike.

“her xwîn vedigere axê
axa bêxwîn xwelîser e
azadî her kê xwestibe

[393] Arjen Arî, *Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî*, Avesta, Stenbol, 2000, r. 20.

xwîn rakiriye di ber re” [394]

Li gor dînên semawî mirovê ewil Adem Pêxember ji axê çêbûye. Dema mirov jiyana xwe ji dest didin, di bin axê de tên defînkirin. Ev yek jî vegera mirov ya eslê xwe ye. Ev veger bi mantalîteya helbestên tesewwifê yanî dewriyeyan hatiye sazkirin. Di van risteyan de rola xwînê di berxwedana azadiyê de hatiye dramatîze kirin.

“xwîn rawest dem verşiya
şûr şikest mertal tewiya
ji qada şer şerbaz reviya
xewneke me bû rizgarî” [395]

Arjen Arî di vê çarînê de sehneyeke destanî bi bêjeyên lehengî anîne cem hev û tabloyeke mêrxasiyê saz kiriye. “Verşandina demê” bi riya hunera îstiareyê hêz daye îmajê dîsa hunera teşxîsê divê neyê jibîrkirin.

“her çiya bi evînekê bi nav dibû
û te di çavên xwe de azadî xwedî dikir” [396]

Di risteya diduyan de di navbera çav û qefesa kewan de têkiliyeke veşartî heye. Bi arîkariya îstiareyê xwedîkirina kewê bûye xwedîkirina azadiyê.

“çiyayekî bibîne heyran çiyayekî
ku serî hilnedabe li wext û zeman” [397]

Ji bo azadiyê çiya jî li hember wext serî hildidin. Îstiare û teşxîsê çiya jî kirine serhildêr. Çiya, li hember zeman serî hildabe, tê maneya ku zordestî gîhaştiye asteke bilind. Di peywenda van risteyan de maneyeke kûr veşartiye. Dema mirov, li hember

[394] Arî, *Ev Çiya Rûspî Ne*, r. 25.

[395] Arî, h. b., r. 45.

[396] Arî, h. b., r. 58.

[397] Arî, *Şêrgele,* r. 21.

zordestiyê serî radikin berê xwe didin çiyayan. Gelo çiya serî rakin dê berê xwe bidin ku?

"şêrgele hene şevçirax û heyve-ron
şêrgele hene ji azadiya bi gon
di bin axa sar de bi axîn razayî" [398]

Di van risteyan de jî pênûsa Arjen Arî, wek firçeya wênesazekî ji bo xeyala azadiyê çê bike bi bêjeyên epîkî îmajeke bihêz saz kiriye. Şibandina şervanên azadiyê bi şêrgeleyan, fitîla îmajê di don de dakiriye û bi bêjeya şevçiraxê jî agir bi vê fitîla xistiye. Razandina bin axa sar bi axîn, îmajeke dersiruştî ye ku têkiliya wê bi welat, azadî û mirinê ve heye.

### 2.2.2. Îmajên Azadiyê di Helbestên Berken Bereh de

Berken Bereh, di gelek helbestên xwe de azadiyê şîrove dike, lê carina azadiya civakî û siyasî carina jî azadiya takekesî dibe mijara îmajên wî. Îmajên Berken Bereh hêviya azadiyê xurt dikin.

"bi serê te kim
min şilfîtazî kiriye giyan li ber azadiyê
hefsarê hêviyan serberadayî ye" [399]

Laşê mirov şilfîtazî dibe, lê şilfîtazîbûna giyan xeyaleke dersiruştî ye ku armanca vê tazîbûnê azadiyê ye. Giyan warê daxwazan e. Berken Bereh, di wan risteyan de giyan ji hemû xwestekan tazî dike û hew azadiyê dixwaze. Îmaja "hefsarê hêviyan" bi saya îstiareyê saz bûye, lê ne xeyaleke jirêzê ye lewra dema hefsarê hespan tê berdan hesp bi çargavî baz didin. Hespa ku hefsarê wê hatiye berdan ber bi azadiyê ve dibeze.

"wê demê

---

[398] Arî, *Şêrgele*, r. 28.

[399] Bereh, *Pandomîm,* r. 95.

dê stêrka ku venamire tu bî
li welatê azadiyê” [400]

Stêrk, remza hêviyên dûr in. Stêrka ku venemire, xeyaleke şevên welatê azadiyê dixemilîne.

“di xortaniya min de
kevokên min hebûn
bi baskên xwe
azadî ji ber dikirin” [401]

Kevok, remza azadiyê ne. Rengê wan ê sipî, bedewbûna wan û fira wan a bi şadî û bextewarî li ezmanên bêdawî, wan ji bo remza azadiyê bêhempa dike. Kevokên ku bi baskên xwe azadiyê ji ber bikin, xeyala azadiyê li ezmanan dineqişînin.

"min gelek demsal şopandin
bêtirên wan
baskên xwe diyarî azadiyê kiribûn" [402]

"Baskên demsalan" vegotineke bimecaz e. Ji bo zûçûyîna demsalan îfade bike karîger e. "Demsalên ku baskên xwe diyarî bikin ji bo azadiyê" peywenda îmajê dermale dike. Demsal, bask û azadî sê bêjeyên ku tu têkiliya wan bi hev re tuneye, lê helbestvan ev her sê bêje ji bo azadiyê bi hev ve kelijandiye û dîmeneke dersiruştî avakiriye.

### 2.2.3. Îmajên Azadiyê di Helbestên Fatma Savciyê de

Azadî dibe ku ji hin helbestvanan re xewnek be, lê ji bo Fatma Savciyê rasterast maneya jiyanê ye. Di helbestên Fatma Savciyê de îmaja sereke îmaja

[400] Bereh, *Dilê Min Palgeh e Ji Işqê re*, r. 55.

[401] Bereh, h. b., r. 106.

[402] Berken Bereh, *Xewna Dawî,* Lîs, Diyarbakır, 2016, r. 69.

azadiyê ye. Sawcî, gelek caran bîranînên xwe dike îmaj carna jî bîranînên hevrêyên xwe ji îmaja azadiyê re dike bask û helbestên xwe bi wan baskan difirîne asoyên hunerê.

“niha kirasên nû
yên ku her hûçkekî wan baskekî azad e
difesilînim ji wan re” [403]

Helbestvan dixwaze ji kirasên bihûçik baskê azadiyê çê bike ji şervanên jin ku xweşikiya xwe ji bo azadiyê kirine berdêlî. Ji bo ku her baskekî hûçikê kirasên wan, ber bi bê kevin û bifirin ber bi asîmanên azad, dê xewna wan a azadiyê bixwîn û goşt bibe. Hunera îstiareyê ev bûkên azadiyê bi kirasên nû yên îmajê xemilandine.

“şervaneke azadiyê
dengê xwe yê tije pirpirîk
ber bi çengê bayê sor dixe” [404]

“Dengê şervanên azadiyê tije pirpirîk” îmajeke ji aliyê dîmenî ve gelek kûr e. Deng, bi riya hewayê diçe û digihêje menzîla xwe. Ev dengê firfirinek, bi bangewaziyên pirpirîkan hatiye neqişandin û îmaj bi gotina çengê bayê sor dewlemend bûye.

“Ji tirsa digrîm carna
dibe ku bo mirinê jî
welatek min î bask cebirî û azad çênebe tu car” [405]

“min kulîlk dan ber tivinga xwe
gul reşandin ser kûlan
ramûsan barandin ser dilan
azadî werivandin ser xeyalan” [406]

---

[403] Savcî, *Gulên Qasid*, r. 105.

[404] Savcî, *Bîra Birînê*, r. 67.

[405] Savcî, *Xewnên Zîvîn*, r. 53.

Di van risteyan de jî “welatekî bask cebirî” , “gul reşandina ser kulan”, “barana ramûsana” , “werivandina azadiyê bi ser xeyalan ve” îmajên bi îstiareyê hatine sazkirin.

"vêca niha difikire xwe li kîja laşê azadiyê bigire
ku ji nifiran dûr
û bi evînê her kêlî gul bide" [407]

Fatma Savciyê di îmaja jorê de bi îfadeya "laşê azadiyê" azadî teşxîs kiriye. Azadî wek însanekî xwedî laş hatiye terîfkirin. "Bi evînê re gulvedana laşê azadiyê" îmajeke çîroksazî ye. Savciyê dibêje kesên ku ji bo azadiyê bimirin û têkevin bin erdê bi hatina biharê re dê li ser mezelên wan gul ji laşen wan bibişkuvin wê demê ew kes azad dibin.

"wê hay jê heye
ku hinekan ne tenê welatek
azadiya wê ya ji şîr û şekir jî
ji rih û canê wê yê delalî terîşk bi terîşk biriye" [408]

Di van risteyan de Fatma Savciyê azadiyê wek perçeyekî rih û canê mirov dibîne û dibêje: "Hinekan azadiya ku bi rih û canê wê re yek e terîşk terîşk ji laşê wê veqetandiye." Îstîareya girtî barê vê îmajê hilgirtiye ser xwe. Terîşkê daran jêdibe, lê azadî terîşk terîşk ji canê mirov jêbibe tê maneya ku canê mirov lîme lîme dibe. Jixwe armanca Savciyê jî şênberkirina vê perçebûnê ye.

---

[406] Savcî, h. b., r. 477.

[407] Fatma Savci, *Dotmara Lal,* Avesta, Stembol, 2014, r. 33.

[408] Savcî, h. b., r. 36.

## ENCAM

Di vê xebatê de me xwest ku bi awayekî giştî em pênaseya îmajê bikin û rola îmajê di helbesta kurdî ya nû de diyar bikin. Di dawiya vê xebatê de em gîhaştin van encamên jêrîn:

Bêjeyek, ji bilî maneya wê mirov maneyekê lê bar bike ew tişt îmaj e. Îmaj, vejandina tiştan ya di hişê mirov de ye. Îmaj ne ji danberhevekê, lê kêm zêde ji nêzîkkirina du tiştên dûrî hev diwelide. Têkiliyên tiştên ku nêzîkî hev dibin çiqas dûr û bêkêmasî be îmaj, hîn xurttir û xwedî hêza coşdar dibe.

Helbesta hevçerx ya cîhanê, hunerên ciwankariyê wek gencîneyekê dîtiye û helbestvanan ji wan sihrên gotinê heta raddeyekê sûd wergirtine. Xeml û xêza helbestê, rewşa hunerên ciwankariyê ne. Gotinên bimecaz, îstiare, kînaye, tenasub û teşxîs paxila helbestê ji îmajên resen re vedike. Helbestvanên modern, her çend van hunerên ciwankariyê bi kar anîbin jî ev hunerana bi derfetên îmajê bi mora xwemaliyê saz kirine.

Di helbesta kurdî ya nû de ji hunerên ciwankariyê herî zêde mecaz, îstîare, teşxîs û teşbîh hatine bi kar anîn. Di çêkirina îmajan de herî zêde ji îstîare û teşxîsê sûd hatiye wergirtin. Îstîareya girtî li gor îstîareya vekirî bêtir hatiye bi kar anîn, ango helbestvanan di navbera mirov û siruştê de bi awayên pir alî têkilî danîne û gelek caran jî taybetmendiyên mirovan, li unsûrên siruştê bar kirine û bî vî rengî îmaj afirandine.

Helbestvanên kurd ên modern ku me çarçoveya xebata xwe bi wan û berhemên wan sînor kiribû, di çêkirina îmajan de orîjînalîte esas girtine. Heta ku ji wan hatiye xwestine ku îmajên saz kirine berê bi tu awayî nehatibin gotin. Di îmajên ku hatine afirandin de mane û dîmen hevdu temam dikin.

Arjen Arî, di helbesta kurdî ya nû ya bakur de helbestvanekî ji aliyê şêwazê ve gelek lîrîk e. Di helbesta Arî de dîrok, civak, kevneşopî û êşên jiyana modern, bi îmajên resen tên hûnandin. Arî ji bo îfadekirina ramanên modern bêjeyên folklorîk di peywendeke nû de bênder dike û îmajên nedîtî saz dike. Tenasub, teşbîh, mecaz, îstîare, tezad, mubalexe, teşxîs hunerên herî zêde di îmajên Arî de derdikevin pêşberî me.

Arjen Arî, bi bêjeyên kevnare dîmenên folklorîk diafirîne. Her çiqas sûdwergirtina ji keresteyên folklorê ji bo edebiyatê xetereyekê bi xwe re bîne jî Arjen Arî, bi çêkirina îmajên nûwaze xwe ji vê xetereya bi hostayetî xelas dike. Azadî, mêrxasî, siruşt, folklor, evîn û erotîzm di helbestên Arjen Arî de mijarên îmajan ên sereke ne.

Berken Bereh, yek ji helbestvanên helbesta kurdî ya nû ya bakur e. Helbestvanekî ji xwe re rêyeke nû vekiriye û pê de dimeşe. Helbestên wî hêz û bedewiya xwe ji mijarên mîtolojîk û psîkolojîk û her wiha ji şêwaza wî ya resen digirin. Îmajên Bereh îmajên ku bi hurgilî saz bûne. Çîroksazî di îmajên wî de balê dikişînin. Îmajên Bereh, gelek caran li gor mantalîteya surrealîzmê pêk tên. Derûniya mirov, evîn, azadî, xerîbî, tenêtî mijarên îmajên Bereh ên sereke ne.

Di helbestên Berken Bereh de hestên mirov bi îmajên derûnî derdikevin pêşberî me. Bereh, bi bêjeyên şênber ên ji paxila siruştê neqandine, îmajên razber ava dike. Mecaz, mecaza mursel, teşbîh, îstîare, teşxîs, tecahula arîf, husna talîl binyada îmajên Bereh pêk tînin. Siruşt mijara sereke ya îmajên Berken Bereh e. Dema îmajên siruştê saz dike hunera teşxîsê helbestên wî dike qada fabilên modern.

Fatma Savciyê, di helbesta kurdî ya nû de dengê jina kurd ku bi sedan salan zelûl mabû, bi wêrekî bilind kiriye û hest û ramanên jina kurd di forma helbestê de bi awayekî nivîskî bi me daye zanîn. Deng û rengê îmajên Fatma Savciyê li hember dîrokê û tradîsyona sosyolojîk ku li ser jiyana kurdan konê xwe yê reş vegirtiye qêrîneke jidil e. Îmajên Savciyê, çavkaniya mijarên xwe ji têkoşîna gelê kurd digire. Şer, azadî, zordestî, serhildan, siruşt, hesret, jin, mijarên îmajên Fatma Savciyê ne. Di îmajên xwe de Savciyê, piranî cih dide hunerên teşbîh, mecaz, îstîare û teşxîsê.

Gulîzerê, di helbesta kurdî ya nû ya bakur de bi şêwaza xwe ya orîjînal tarzeke nûwaze afirandiye. Îmajên Gulîzerê binyada xwe ji kûrahiya dil digirin û bi mantiqa hiş û mejî dixemilin, ango her risteya Gulîzerê xwedî çîroksaziyeke helbestkî ye. Îmajên Gulîzerê ne îmajên kin in. Heta ku ji destê wê tê îmajên xwe li seranserê laşê helbesta xwe belav dike. Carina helbesta xwe li ser binyada îmajeke resen saz dike.

Gulîzer, mijarên ku helbestvanên mêr curet nakin qal bikin bi wêrekî behsa wan mijaran dike. Mahremiyeta zayendî ku di navbera jinan de jî aşkere nayê axaftin, di helbestên Gulîzerê de ji bo çêkirina îmajan wek hêzeke lokomotîf roleke

giring dilîze. Hunerên ku di îmajên Gulîzerê de zêde tên bikaranîn ev in: Teşbîh, Mecaz, îstîare, mubalexe, Husna talîl, teşxîs.

Ji aliyê îmajên takekesî ve di temaya evînê de Arjen Arî û Berken Bereh îmajên pênaseya yarê û pênaseya evînê zêde bi kar anîne. Fatma Savcî û Gulîzerê hesreta evînê û bendemayîn derxistine pêş. Gulîzerê di warê evîna beşerî de li gor Savciyê wêrektir behsa hezkiryê xwe kiriye. Nasnameya xwe ya jin û hestên jinan bêtir derxistiye pêş.

Di temaya erotîzmê de Arjen Arî pîrê helbesta kurdî ya nû ya bakur e. Bi wêrekî behsa têkiliya cinsî ya di navbera jin û mêran de kiriye. Qeyd û bendên exlaqî bi cureteke mezin şikandiye, carinan ji sînorên erotîzmê derketiye û derbasî sînorên pornografiyê bûye. Berken Bereh ji aliyê erotîzmê li gor Arî qels e. Erotîzmeke maqûl bi awayekî nixumandî nîşan daye. Gulîzerê di warê erotîzmê bi nasnameya xwe ya jin wêrek e, di hin risteyan de veşartî di hin risteyan de jî aşkere îmajên erotîzmê saz kiriye. Fatma Savcî îmajên erotîzmê nexistiye nav helbesta xwe.

Îmajên siruştê, di helbesta kurdî ya nû ya bakur de gelek zêde hatiye bi kar anîn. Berken Bereh di vê mijarê de pîrê îmajan e. Di gelek helbestên xwe de Bereh, siruşt rasterast wek aramanca helbesta xwe dîtiye û siruşt bi rewşên cuda daxilî naveroka helbestê kiriye. Di hin risteyan de jî siruşt, ji bo anîna ziman ya hest û ramamên cur bi cur wek amûrekê bi kar aniye. Arjen Arî di helbesta xwe de zehf cih daye siruştê, lê gelek caran bi gotinên rojane behsa siruştê kiriye. Ji ber vê yekê bi qasî Berken Bereh îmajên siruştê saz nekiriye. Fatma Savcî û Gulîzerê li gor her du helbestvanên nabvorî di çêkirina îmajên siruştê de hîn bi hestyarî hizirîne. Îmajên wan yên siruştê li gor îmajên helbestvanên mêr naîf in û encamên hizrên empatîk in.

Di mijara xerîbî / berîkirin û hesretê de helbestvanên jin li gor helbestvanên mêr bêtir îmajên resen derxistine holê. Fatma Savcî û Gulîzerê bi hizrên jinan ji aliyê çîroksaziyê ve îmajên pir orîjînal ava kirine. Nêrîna Arjen Arî û Berken Bereh di vê temayê de li gor nêrîna helbestvanên jin lirû ye.

Di çêkirina îmajên tenêtiyê de Berken Bereh û Gulîzerê li gor Arjen Arî û Fatma Savciyê bêtir îmajên tenêtiyê saz krine. Berken Bereh tenêtî bi unsûrên siruştê bênder kiriye, Gulîzerê jî tenêtî piranî bi unsûrên şevê xemilandiye.

Îmajên mirinê di helbesta kurdî ya nû de di mînakên çar helbestvanên mijara xebata me ne kêm derbas dibe. Berken Bereh bi nêrîneke felsefî, lê ne bi awayekî kûr nêzîkî meseleyê dibe. Fatma Savcî dema îmajên mirinê çêdike ne mirineke xwezayî

piranî kuştinê li ber çavan radixe. Gulîzerê û Arjen Arî mirinê bi gotinên rojane daxilî helbesta xwe dikin ji ber vê yekê jî îmajên mirinê zêde bi kar nayînin.

Ji aliyê îmajên civakî û siyasî ve di temaya zordestiyê de Arjen Arî û Fatma Savcî li gor Berken Bereh û Gulîzerê hîn çalaktir in. Arjen Arî zordestiya desthilatdaran bi bêjeyên folklorîk û bi teşbîh, mecaz û teşxîsan li ber çavan radixe. Fatma Savcî jî zordestiya neyaran û desthilatdaran bi îmajên resen nîşan dide. Gulîzerê di civakê de ji aliyê sosyolojîk, dînî, exlaqî û kevneşopiyê ve zordestiya mêran li ser jinan û jiyana jinan bi îmajên çîroksaziya wan resen tîne ziman.

Di temaya azadiyê de Arjen Arî ji aliyê îmajan ve serî dikişine. Azadî, îskeletê helbesta Arî ye. Berken Bereh jî di temaya azadiyê de di helbesta kurdî ya nû de xwedî roleke giring e. Têgihiştina azadiya Berken Bereh li gor têgihiştina azadiya Arjen Arî berfirehtir e. Arî, ji aliyê niştimanî (kurd û Kurdistan) ve nêzîkî meseleya azadiyê dibe. Bereh hem ji aliyê niştimanî hem jî ji aliyê însanî ve (takeksê azad) li ser meseleya azadiyê disekine. Ji bo Fatma Savcîyê jî mesele niştimanî û takekesî ye. Ji ber jiyana Fatma Savcî ya şoreşgerî û zindanî, azadî di gelek helbestên wê de bi îmajên resen derdikeve pêşberî me. Azadî ji bo Savciyê di çêkirina îmajan de temayeke bingehîn e. Helbesta Gulîzerê di warê azadiya civakî de qels e.

Helbestvanên navborî di çêkirina îmajên takekesî de herî zêde ji hunerên mecaz, îstîare û teşbîhê sûd wergirtine. Îmajên civakî û siyasî di helbesta kurdî ya nû de xwedî cihekî taybet e. Jiyana kurdan, şert û mercên civakî û sîyasî her dem tevlî naveroka helbestê bûye. Helbestvanan, bi riya îmajên civakî û sîyasî ji êş û keserên kurdan re berdevkî kirine. Zordestî û azadî mijarên ku herî zêde di îmajên helbestvanên navborî de derbas dibin.

Xulase helbestvanên kurd ên modern, ji îmajê gelek sûd wergitine. Di qada vegotinê de bi bêjeyên konteksa wan cuda peywendên nû yên maneyê afirandine û di xeyalxaneya mirovan de dîmenên rengîn welidandine. Her dîmen, asoyên nû li hember xwendevanan vekirine û derfetên helbestê ji aliyê vegotinê ve dermale kirine. Helbest bûye dika şanoyê ji bo îmajan, îmaj jî bûye dilê helbestê yê çar gopal ku her dem lê dide.

# ÇAVKANÎ

## A) Kitêbên Teorîk


Ada, Ahmet, Modern Şiir Üzerine Yazılar, Digraf Yayınları, İstanbul, 2000.

Aksan, Doğan, Şiir Dili ve Türk Şiir Dili, Engin Yayınları, Ankara, 1987.

Altıok, Metin, Şiirin İlk Atlası, YKY, İstanbul, 2003.

Ayhan, Ece, Dipyazılar, YKY, İstanbul, 1996.

Bezirci, Asım, İkinci Yeni Olayı, Su Yayınları, 2. Basım, İstanbul, 1986.

Boynukara, Hasan, Modern Eleştiri Terimleri, Yüzüncü Yıl Üniv. Fen-Edb. Fak. Yay., Van, 1993.

Burnett, Ron İmgeler Nasıl Düşünür, Metis Yay., Wergera Tirkî: Güçsal Pusar, İst., 2012.

Cömert, Bedrettin, Croce'nin Estetiği, Kültür Bakanlığı yayınları, Ankara, 1979.

Çetin, Nurullah, Şiir Çözümleme Yöntemi, Öncü Basımevi, Ankara, 1981.

Çolak, Veysel, Şiir Nedir ve Nasıl Yazılır, İkaros Yayınları, İstanbul, 2011.

Dilçin, Cem, Örneklerle Türk Şiir Bilgisi, TDK Yayınları, 10. Baskı, Ankara, 2013.

Eagleton, Terry Şiir Nasıl Okunur, Wer. Kaya Genç, agora Kitaplığı, İstanbul, 2011.

Erdost, Muzaffer İlhan İkinci Yeni Yazıları, Onur Yayınları, Ankara, 1997.

Ergüven, Abdullah Rıza, Şiirin Gerçeği Toplumdaki Yeri, Berfin Yayınları, İstanbul, 2003.

Haşim, Ahmed, Bize Göre, Gurabahane-i Laklakan, Frankfurt Seyahatnamesi, MEB, İstanbul, 1986.

İnce, Özdemir, Şiir ve Gerçeklik, Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, İstanbul, 2001.

İnce, Özdemir, Yazınsal Söylem Üzerine, Can Yayınları, İstanbul, 1993.

Karaca, Alâattin İkinci Yeni Poetikası, Hece Yayınları, Ankara, 2005.

Kula, Nedim, XIX. Yüzyıl Fransız Şiiri Üzerine İncelemeler, T.C. Kültür Bakanlığı Yay., Ankara, 2002.

Lenoir, Beatrice, Sanat Yapıtı, Wer. Aykut Derman, YKY, İstanbul, 2004.

Önal, Mehmet, Yeni Türk edebiyatı, Akçağ Yayınları, Ankara, 2009.

Özdenören, Rasim, Yazı İmge ve Gerçeklik, İz Yayıncılık, İstanbul, 2011.

Pala, İskender, Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü, Leyla ile Mecnun Yay., 9. Baskı, İstanbul, 2002.

Rifat, Oktay, Şiir Konuşması, Adam Yayınları, İstanbul, 1992.

Salihoğlu, Hüseyin, 20. Yüzyıl Edebiyat Sanatı, İmge Kitabevi, Ankara, 1995.

Sartre, Jean Poul, İmgelem, Werger: Alp Tümertekin, İthaki Yay., 2. Baskı, İstanbul, 2009.

Süreya, Cemal, Güvercin Curnatası, YKY, İstanbul, 2002.

Süreya, Cemal, Toplu Yazılar, YKY, İstanbul, 2000.
Süreya, Cemal, Uzat Saçlarını Frigya, Yön Yayınları, İstanbul, 1992.
Şklovsky, (1971) Sanat Yordamı, Wer. Tahsin Yücel, Türk Dili, XXIII. 473.
Taftalı, Oktay, Şiirin Mikroestetik Eleştirisi, Ahlak, Estetik ve Şiir, Gendaş Yayınları, İstanbul, 1998.
Tarancı, Cahit Sıtkı, Bütün şiirleri, Berhevkar: Asım Bezirci, Can Yayınları, İstanbul, 1983.
Telli, Ahmet, Sulara mı Yazıldı, Telos Yayıncılık, İstanbul, 2001.
Tinyanev, Yuri, Yazınsal Evrim Üstüne, Amd. T. Todorov, Wer. M. Sema Rıfat, YKY, İstanbul, 2005.
Tunalı, İsmail, Grek Estetiki, İstanbul, 1963.
Ünal, Hayriye, Eşikteki özgürlük Çok sesli Şiir, Hece yayınları Ankara, 2011.
Yağcı, Öner, Cumhuriyet Dönemi Edebiyat Çevirileri Seçkisi, Kültür Bakanlığı Yay., Ankara, 1999.
Yalçın, Mehmet, Şiirin Ortak Paydası, C. 2., İkaros Yayınları, İstanbul, 2010.
Yavuz, Hilmi, Kara Güneş, Edebiyat ve Sanat Yazıları, Can Yay., 2. Basım, İstanbul, 2003.
Yavuz, Hilmi, Yazın Dil ve Sanat, Boyut Yayınları, 2. Baskı, İstanbul, 1999.
Yücel, Halime, İmgeden Yoruma, Ayrıntı Yayınları, 2013.

**B) Kitêbên Wêjeyî**

Arî, Arjen, Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, Avesta, 2000.
Arî, Arjen, Ev Çiya Rûspî Ne, Avesta, Stenbol, 2002.
Arî, Arjen, Eroûtîka, Lîs, Stenbol, 2006.
Arî, Arjen, Şêrgele, Avesta, Stenbol, 2008.
Arî, Arjen, Destana Kawa û Azhî Dehaq, Evrensel Basın Yayın, İstanbul, 2011.
Bereh, Berken, Pandomîm, Belkî, Stenbol, 2006.
Bereh, Berken, Dilê Min Palgeh e Ji Işqê re, Lîs, Diyarbakir, 2011.
Bereh, Berken, Ji Dûriyê re, Lîs, Diyarbakır, 2013.
Bereh, Berken, Xewna Dawi, Lis, Diyarbakır, 2016.
Gulîzer, Keziyên Jinebî, Avesta, Stenbol, 2006.
Gulîzer, Bûka Baranê, Avesta, Stenbol, 2009.
Gulîzer, Şevname, Avesta, Stenbol, 2011.
Savcî, Fatma, Gulên Qasid, Avesta, Stenbol, 2006.
Savcî, Fatma, Xewnên Zîvîn, Avesta, Stenbol, 2007.
Savcî, Fatma, Bîra Birînê, Avesta, Stenbol, 2010.

Savcî, Fatma, Şewq û Payîz, Avesta, Stenbol, 2011.
Savcî, Fatma, Dotmara Lal, Avesta, Stenbol, 2014.